

NAVEROK

NÜDEM

Kovara hunerî, edebî û çandî



Xwedî û berpirsiyarê giştî

Chief Editor

Firat Cewerî



Hejmar 27, sal 7

Payiz 1998



Şerdên abonetiye (salek)

Swêd: 240 Sek

Skandinaviya: 280 Sek

Ewrûpa: 80 DM

Amerîka, Australia,

Kanada: 50 \$

Institution: 290 Sek



Postgiro: 636 36 25-2

ISSN: 1103-1964



Wêneya bergê: Remzî

Çapa bergê:

Jakobsbergs Tryckeri



Pergala bergê û rûpelan:

Nüdem



Adres: NÜDEM

Box: 177

177 23 Järfälla-Sweden

Tel û Fax: 08-580 131 62

583 564 68

- 4 Hawara neteweyî ◆ **FIRAT CEWERÎ**
- 6 Li gomistanek Amedê ◆ **OSMAN SEBÎ**
- 12 Bîranînên min ◆ **REFÎQ HILMÎ** Werger: **ZIYA AVCI**
- 24 Şê şîr ji ◆ **JAQUES PRÉVERT** Werger: **CAN GULŞENOGLU**
- 28 Seyra Gulisor (2) ◆ **ŞEREFXAN CIZÎRÎ**
- 32 Navnişana Piçûk ◆ **H. BAQÎ KOVAN**
- 35 Pirsên Yezdan ◆ **F. CEWERÎ**
- 36 Hevpeyvîn bi Rohat Alakom re ◆ **NÜDEM**
- 52 Serlêdaneke Çînê ◆ **ŞAHÎNÊ BEKIRÊ SOREKLÎ**
- 61 Notên yekî dinyayî ◆ **ÖZKAN MERT** Werger: **S. DEMİR**
- 67 Serpêhatiyên Hayqar ◆ Werger: **HEMÎD KILIÇASLAN**
- 79 Xewn ji qedexa ne ◆ **SIDQÎ HIRORÎ**
- 85 Hevpeyvîn bi Ebdilmecit Şexo re ◆ **HEYDERÊ OMER**
- 94 Şê şîr ji ◆ **HUSEYÎN ELÇÎ**
- 96 Du şîr ji ◆ **HÎCRÎ ÎZGÖREN**
- 99 Du şîr ji ◆ **ÎHSAN FİKRET BİÇÎCÎ**
- 103 Şê şîr ji ◆ **YILMAZ ODABAŞI** Werger: **MEHMET UZUN**
- 106 Şiroveya Diwana Melayê Cizîrî ◆ **MELE EHMEDÊ ZIVINGÎ**
Werger: **EMÎN NAROZÎ**
- 119 Olof Palme (2) ◆ **MHAMED DEHSIWAR**
- 129 Ji bexçeyê talankirî ◆ **İBRAHÎM SEYDO AYDOGAN**
- 131 Çend gotin li ser "Mêrê Avis" ◆ **N. ZAXURANÎ**
- 135 Pênc pirtûkên Sabah Kara ◆ **NÜDEM**

HAWARA NETEWYÎ



FIRAT CEWERÎ

Ezbenî!

Îro ji postê pênc heb Hawar li ser navê min hatine. Ez hêvî dikim ji nêho û pê de ji min bi tenê re hejmarekê bişîne. Ji ber ko kes Hawarê naxwîne.

Hebeş Smaîn, Mektele, 24/7/1941

Di sala 1941ê de xwendevanekî Hawarê ji xwediyê Hawarê re van çend rêzên li jor dinivîstine û jê tika dike ku êdî bi tenê Hawarêkê jê re bişîne. Ji nameya xwendevên xuya dibe ku jê re berdeyam pênc lib Hawar dihatin şandin û wî jî ew pênc libên Hawarê di nava kurdan de belav dikirin. Belavkirina Hawara ku bi hezar zehmetiyan derdiket, ji bo wî serbilindiyek bû. Lê kesî guh nedida Hawarê, wan Hawar nedixwend û loma çamêr ji xwedî û berpirsiyarê kovarê re dişîne û dibêje: "Kes Hawarê naxwîne!" Xwediyê Hawarê jî nameya xwendevanê xwe diweşîne. Diweşîne û rastiya kurdan bi wan dide zanîn. Gazinan ji kurdan dike. Dixwaze kurd jî mîna endamên gel û neteweyên din li hêjayiyên xwe xwedî derkevin. Hawara ku diviyabû li ser destan bihata gerandin, xelkê berê xwe jê diguherûn, jê direviyan, bi qasî ku pêwîst bû hezmêzên xwe jê re venedikirin. Lê dîsan jî, xwediyê wê Celadet Alî Bedir-Xan, bi hêviyekê xurt ketibû ser riya bi nivîs û kitêbkirina kurdan. Di şertên herî dijwar de, wî ji me re bingehê zimanê me danî, digel tunebûna xwendevan û nivîskaran wî di hundurê deh-donzdeh salan de ji me re 57 hejmarên Hawarê yê mîst zanist û kurdayetî li dû xwe hiştin. Îro, digel ku em dikarin bê dudilî îmzeyê xwe biavêjin binê nameya Mîrza Hebeş Smaîn jî, dîsan me her 57 hejmarên Hawarê mîna du cildan derxistin û me xwest ku em nivîsê îro bi xebat û berxwedana rewşenbîrên do bihesînin. Berî ku em dest bi çapkirina Hawarê bikin, em bi gelek nas û dostan şewirtin. Gelekan ji wan pîroziya vê xebatê anîn zimên û moralekî xurt da me. Me jî

piştî xebata salan Hawar ji nû ve derxist. Hawar bi hêsanî demeketiye. Ez bawer dikim, heval û hogirên nêzîkî me bi vê yekê dizanin. Lê divê Hawar bi hêsanî were belavkirin. Heta niha ji hin der û doran, hin şexsan xwe dane ber firotin û belavkirina Hawarê. Lê ev kêr e, çavên me li riya dezgehên kurdan in. Hêviya min ew e ku wê dezgehên kurdan bi çavê xezîneyeke kultur û edebiyata kurdî li vê berhemê binerin û li ser wê bingehe destê alîkariyê dirêjî me bikin. Qet nebe, divê em nîşan bidin ku rewşa ziman û edebiyata kurdî ya îro ji ya dema xwendevanê Hawarê Mîrza Hebeş başûr bûye, kurd hişyartir bûne, hîsên milî li ba kurdan xurtir bûne. Loma em li benda nameyên welê ne; "Ezbenî! Ew Hawarên ku te ji min re şandibûn tavilê xelas bûn, xelkê ji destên hev revandin. Berî ku ya min jî ji destên min here, ji kerema xwe re ji min re deh Hawarên din jî bişîne."

*

Gava çapxanê bi kamyoneke mezin Hawar şand Nûdemê, me ji bo alîkariyê bang çend nivîskarên Nûdemê kir. Ji bo ku cild xerab nebin çapxanê ew nexistibûn kartonan, lê bi awayekî hostane ew li ser textan bi cih kiribûn û naylonê li wan gerandibû. Gava şofêr û alîkarê xwe bi alavên xwe Hawar danîn ber deriyê Nûdemê, yek ji hevalên ku hatibû alîkariya me weha li wan nerî û got: "Heta ku Kurdistan xelas bibe jî ev Hawar ma". Sê hezar (3 000) cild Hawarên li ber deriyê Nûdemê bala swêdiyên ku di wir re derbas dibûn jî dikîşand. Ew li ber Hawaran radiwestiyân û meraq dikirin bê ew çi kitêb e. Me jî carinan bi henekan digot, ew încî e, lê paşê me bi wan dida zanîn ku ew yek ji kitêbên kurdan yên pîroz e.

Jinekê xwe negirt û pirsî:

- Çima, ma çend kitêbên kurdan yên pîroz hene?
- Du kitêbên wan hene...
- Ev kîjan ji wan e?
- Ev Hawar e. Du cild in. Ev kitêba me ya neteweyî ye.


Jinikê weha bi bawerî got:

- Divê hûn miletekî biesil û medenî bin. Çi kitêbeke spehî...

*

Me pênc-şexş kesan di hundurê çend saetan de ew kitêbên spehî kişandin hundur. Her der bûbû Hawar. Em jî ji hal de ketibûn, xwêdanê di me de dabû der, bêhna me diçikiya. Gava me kişandina Hawarê qedand û xwe da ser kursî û qolixan, tu cihê bêhêvtiyê di dil û mêjiyê min de nemabû, min xwe di hundurê dilşahiyeke bêpîvan de hîs dikir û ez bawer dikim, her kurdê ku HAWARêkê têxe mala xwe, wê xwe mîna min dilşa û bi hêvî hîs bike.

Bi hêviya dilşahiya hemû kurdan...✍️



LI GORNISTANEK AMEDÊ

OSMAN SEBRÎ

Îşev ji şeva pirtir bihna min teng bûbû. Dîsan derdê min serî bi derxistibû. Şaxên mor li kolana dev bernexûn diyar bûn. Tajan û tivancan ji dil xwe dirêjî kilox dikir. Tezîne sar di binê lîngan heya qotê serî diçûn. Qefseng li min teng bûbû û têra dilê min nedikir. Wekî nexweşê ko ta li serî dide min dixwest cilên xwe biçirînim. Xwêdaneke sar û zelqok bi eniya min ketibû. Min li derdê xwe kiribû der, lê mikuna wê tinebû. Kela gîhana welêt... kela gîhan welêt...

Min da xwe û rabûm – navbera mala me û behrê dused gav hebûn – ber ve behrê çûm (Hercar ko ev kela li min radibûn ez diçûm ber behrê. Ji ber ko derdê min û wê bi hev diman ko timî bi pêl e, hewîniya min pê dihat) hêdî

hêdî diçûm go mîna pêlên behrê, dengên wîrewîr û kan û zarîna teyrekê şevê di zik hev de wek lorika diyan li ber dergûşê bi canê min şadibûn. Dilê min fire û xweş bû, lê kela min pirtir radibûn, li min wilo qewimî ko piyên min pirê car nedigihan erdê. Çengên min radibûn. Wê gavê min fira teyran dixwazandin. Bi şêna Yezdanê gewre ba ket bin çengên min û firiyam. Difiriyam lê zûka ji teyran û balafiran û kamilkan difirîm. Bi wê çûyinê di saetekê de min dikaribû di ser hemû dinê re derbas bibim. Ciyê ez biçûyamayê nêzîng bû di bihnekê de Filistîn, Şerq el-Urdun, Sûriye derbas kir û li tala serê kaniyê li sînorê welêt raperîm. Di navbera Mêrdîn û Wêranşehrê re min xwe gihande ser Diyarbekirê. Lê gava gihîştîme Diyar-

bekirê li hêla Derê Çiyan tîrêjek nûrê weka keskesorê lê sitûr bi ber çavên min ket. Çavên min deliyan hinekî ez wer mat mam paşî min xwe lê girt û çûm. Gava gihîştîme tîrêja nûrê weka perperokê ko per dişewitin ez di jor da hatime xwar û ketim. Hîn êvar û zû bû. Cihê ez ketî li pêşberî rawesteka balafirên Roman bû. Kilos (eskerê tirkî) di ser hêl û bin hêla min re derbas dibûn. Ez di cihê xwe de mam piştî demekê dinê qerîya [reş] û ker bû herkes nivist. Tenê dengêkî bi şên ji Dîde dihat. Serekî min doralên xwe çav kir li neyaran nîşan nemabû. Hîn tîrêja nûrê bi hem-dê xwe şewl didan. Ji ber ko du mamên min jî di wê erdê de veşartîne min zani-bû ko kî şêr li wir radizê... Şêx Seîdê Kal. Min hêdî hêdî xwe gihande tîrêjê. Vêca zimanê min hatibû girtin nizanî-bûm çî bêjim. Serekî min û dil li ber hev da kar bi min nedibû, min nikaribû du pirsan bi cih bikim. Wilo dest best berê min li tîrêjê û rawestîya bûm. Bîstekê bi şûn de zeman hebekî bi ger ket û min got:

– Ey ke'ba qewmiyeta min Şêx Seîdê Kal! Te... te... te zîncîra dîliya qewmê min bi zexmiya dil, piraniya zanîn û rastiya xwe qetand. Weka şêr ko di qefesê de bi derkeve. Ev qewmê ko çarsed hinde sal in xwe ji bîr kiribû, xwe winda kiribû, bênav û bêzanîn mabû, ketibû xewa mirinê, di wê xewê de ew şêr te hişyar kir. Neyarê ko dixwest me û navê me û zimanê me jî dinê hilîne te

di destê wî da lê da û şikand. Ji roja ko te serî daniye û vir de kîjan kurd çî bike û li Kurdistanê çî bibe hemû kurê te ne çiku bingehê wî xanî te veda û hîmê wê te danî.

Heya ko dinê hebe ew kesên ko dibin navê kurdî û kurdîtiyê de bijîn minnetdarên kir û qenciya te ne. Çiku ji wê rojê û vir de bavê kurdîtiyê yê paşîn tu yî û dê her tu bî. Bende ji minnetdarê te kurdekî piçûk, bê kêr e. Ji ber ko Yezdan dilê min wek dilên birayên min ê kurd zexim çenekiriyê ji tiştên piçûk û mezin zû diêşe. Diêşe lê ne êşeke nexweşî, êşek evînî... giş dibe agir. Agirekî wilo ko cenabê Zerdest li bê teşebûna wî vediciniqe... Can û cendek li min peritandîye, bihnekê nikarim bê xem rawestim, giş şewat... sotin... jan... tajan... tîr... tivanc in.

– Ey qencê Xwedê! Qesda min dîtina welêt û vî erdê ko ji şêr û lehengan tijî ziyaret kirin; û ji vê jana di dilê xwe re jî dermanek ji cenabê we xwastin bû. Lê evê tîrêjê perên min sotin û ketime xwar va me ka tu ji min re çî dibêjî?

Tu deng çênebû. Hat bîra min ko hê nizanin dinê qerî ye û giş nivistine ji lewre tu cihab nedan. Dîsan min kire zarî.

– Ey gewretirê qewmê min! Tu . . . tu bi kesera dilên van şehîdên li nik xwe û bi kula dilê şehîdên kela xwê dikî ko ci-habek wekî dilxwaza min bidî. . .

Dîsan weka berê dinê kir. . . tu deng çênebû. Car din bi dengêkî zîz layjim.

– Ey şehîdê gewre! Piştî mîrê ola Muhammed! Hîmê heyîna kurdanî ye! Tu bi evîna xebata şehîdên ker û Seydxan û Elîcan dikî ko hinde min bê fer nekî, ya ez nehêjayî vê daxwaziyê me?

Dîsan tu tişt bi dermeket. Êdî mecala min û xweragirtinê nemabû. Fîrqa girî ketibû qirika min bi hêl dengê xwe min kire gazî û zarî.

– Ey hişyarkirê qewmê min! Tu bi mêraniya di dilê Ferzende û Îhsan û bi gorna Birho dikî ko min evqas şerpeze nekî. Cihabek... du pîrs... dibweşiyek... çi dibe? Ma ez jî ne Kurd im.

Bi sehkirina hersê navên dawiyê jî rojhilatê tîrêjê de deriyekî mezin ji erdê vebû û yekî mezin serê xwe bi derxist. Çi bibûnim ko Ezîz axayê Silopî ye. Min ew nasî lê wî ez nenasîm û ev xeber ji min re gotin.

– Bira jî bo Xwedê hinde meke qêrîn û zarîn. Îşev civîna mezin heye ko kes nikare bête nik me, ma tu jî rîya Xwedê ketiye ko welê dikiye gazî. Hîn pîr dirêjkî em ê xeberê bidin melean. Doje nêzingî me ye dê çend zebaniyan biştînin û bi agir bera te din û li nav çava te bidin heya dimirî lê te gunch e raneweste here mala xwe.

– Hey lo pepûko! Tu jî agir ditirsî ma agir bi min çi dike? Agirê ko Xwedê êxistî dilê min heke berdim bila Dojeh jê bitirse ko ew dê bê zebanî bimîne li wê bi şûn de ez dixwazim bêm civîna mezin bibûnim û şuxlê min heye.

Li ser van pîrsan axê berê xwe da jêr û

çend pîrs gotin:

– Ma kesî te yê civakê li hir heye? Ko bikaribî werî diyarê civînê.

– Erê Axa heke ew jî ne weka min sê ser bin du mamên min li hire hene. Xeberê bide Şukrî û Nûriyê Mirdêsî bila destûra min bigirin da ko werim nik we. Ma tu min nas nakî? Malava hinde em tev di hepsê de man. Niho ez leqayî te bûm tu li min radibî.

– Gava min tu dîtî hê sîpe bûyî ji ber wê min tu nenasî. Li qisûrê menihêre tu ne biyanî yî dikarî werî. Bira! Ez dergevanê civîna mezin im di êvarê de wîlo emir dabûn ji ber wê min hinde tu kez kirî de kerem ke were.

Ez çûm, Ezîz Axa ez himbêz kirim û daxistime jêr. Dîsan derî dada. Gava em daketin jêr çi binihêrim wira jî alemek lê alemeka ava. Rê, avahî, tevger tişteki jî eqil der bû. Hele kareba ji stêrkên ezmên pirtir bûn. Berî hertiştî min pîrsa şuncivînê kir. Gote min: Divê li ser rîzika me tu mamê xwe bibûnî ko qartekî bide te da ko bikarî biçî diyarê civînê. Min pîrsa mamê xwe yê Şukrî kir got: "Ne di nav civînê de ye niho li mal e, hat pîrsa Hesên Xeyrî kir û daket ber Dîcle". Gazî xortekî kir û qewîtî lê kirin. Ezîz Axa ma li ber derî ez bi xort re daketim ber Dîcle. Mamê min destmêj digirt gava çav li min ket hat ez himbêz kirim û dilê xwe li min xweş kir û destûra xort dayê, xort çû. Min pîrsa mamê xwe yê din kir got.

– Ew li bihuştê dimîne herwekî li di-

nê ji siyasêrê kanig diman li vir jî xwe welê kanig digiriye.

– Mamo ma vira ne bihişt e?

– No! Hire qada xebata welêt e. Dixwazî te bişînim nik mamê te here li bihuşta şehîdan hêreke.

– Mamo te zimanê xwe yekcar guhartiye. Ez ditirsim ko tu hîn li ser zaravayê welêt bî. Lê dinihêrim peyva te tekûz e.

– Erê kurê min! Heya du salan berê em herkesê li ser zaravayê welatê xwe diaxivîn. Lê pêrar ko tirkî Şêx Esedê Hevlêrî bi dar da kirin, hat cînarîya me û bi tipetipa camêr civatek ya zanîne hate pê niho li ser ziman dixebitin.

– Serekê civata zanîne kî ye?

– Serek Şêx Es'ed Efendî ye, nivîsevan Salih Begê Hênî û diwanzêdeh jî libatên wê hene. Ev salek e bi pêkanîna ferhenga mezin mijûl dibin.

– Tu zanî mamo! Turko zimanê me rakiriye?

– E, berî çardeh rojan min di hişyariyê de xwandibû.

Ma tu rojnameyên we hene?

– Bi navê "Hişyari"yê rojnameke me ya siyasî heye. Ew jî bû salek bi mêranîya Fuad Begê bi hev ket. Fuad Beg gerînedeyê berpirsiyar e, Kemal Fewzî gerînedeyê çapxanê ye, Hesên Xeyrî sernivîsevan e û Hacî Extî xebêrgihan e.

– Ma ji bo çî hûn Ehmedê Xanî nakîne seroka civata zanîne?

– Ehmedê Xanî çavdarê tevayîya xebatên zanîne ye.

– Piraniya we dîmokrat in an arîstokrat?

– Ji rojnamevanan pê ve hemû arîstokrat in. Heryekê hicetek di bin çengan de ye hinde navmalekê.

– Mamo Ezîz Axa gote min civîna mezin heye dixwazim tu min bibî û ez bibûnim.

– Kurê min ez bi xwe naçim civîne heke dixwazî qartekî bidime te here.

– Ma ji bo çî naçî civîne?

– Lawê min vê derê melivîne. Pirsên rast ên tehl in. Dema tişteke bê fesal dibê ko kê kiriye raste rast didime ruyan û giliyên wan jî bi sernîvekê dikim. Vêca çavên xwe li kirên hev digirin. Tu bi xwe dizanî bihna min jî teng e û xwe ranagirim. Dawî dilê hemû hevalan li min dimîne ji ber wê yekê heft sal in ko careke tenê çûme civîna mezin. Kurê min qene tu wer nekî. Hergav li ser axaftina welatê xwe were dîtin.

– Wey sed carî xwazî bi dilê te mamo! Qene heft sal in tu car ketiye civîne. Bi serê te ko di van heft salan de hê carekê jî neketime civîne. Min weka peçemekê perê xwe rûçikand hemûyan pirsên min tehl dîtin. Bi çav hej li min dîkin. Lê min hîn diyarê civînan nedîtîye. Çiku hemû dizanin devê min nasekine. Ji ber ko li nik me jî çavgirtin heye ji lewre. De bila ew derd bimînin di cihê xwe de. He min bibe diyarê civîna mezin carekê li tevgera we binihêrim.

Mamê min da pêşiyê. Em bi rê ketin. Qesreke bê awa mezin hate pêşiya me.

Min pirs kir, got: "ev qesra civata zanî-nê ye?" Û me xwe gihandê, nuh ava kiribûn qesreke wilo mezin bû ko "Yildêz" nayênin bîra mirov ez ecêbmayî bûbûm. Gelo tûbê qesra civîna mezin çilo bû? Em gihane derê qesra zanîne mamê min got.

– Kurê min dizanî? "Hişyarî" li hire bi derdikeve.

– Ez benî ma niho vekiriye?

– E, vekiriye dixwazî em biçin Fuad Beg, hevalan, serekî bibînin?

Min dilkirina xwe nîşan da. Bi asansorê em hilkişîn tebeqeya nozdehan. Çapxane li wir bû. Xortekî du mil li ber derê çapxanê rawestîbû. Mamê min pirs a began kir wî got:

– Hesen Xeyrî Beg bi navê rojnamê çûye li civîna mezin guhdariyê dike, begên mayî li hire ne.

Mamê min li pêş û ez li dû em ketin nava çapxanê. Diktor Fuad bendek dinivîsand. Di dema destguvaştinê de çavê min lê ketin sernama wê "Cendekê Bê Serî, Destên Çûne" bû. Kemal Fewzî jî hejmara Hawarê ya hivdehan bi dest de bû "Tola Karwên" dixwand. Min pirs a Hacî Extî kir gotin; çûye welêt ji me re xeberan bîne piştî dil û xatiran Diktor got.

– Malava qe hûn bi ser me de nayên. Divê hûn yekcaran li halê me bipirsîn û hinek jî bi mal werin.

– Ev e bi ser we de hatim û bi mal jî Birho bi malbata xwe ve, Şêx Evdirêhman, birek xortên ker, Seydxan, Elîcan

û Tewfîq Axa bi hinde hevalên xwe ve nehatin?

– Erê tu hatî û ew hatin lê ne wekî daxwaza me. Tu bêcih û bêwar mayî hinga em ketin bîra te. Ev mêrxasên hanê jî neku ha biharana . . . diviyabû serê wan di hîmê bingehê welêt ketana û cendekê wan bihatana vir. Gava hatin serê wan pê re bû. Diyar e ko li dest bêkêriya we ev şêrana mirin û xêra wan jî negiha welêt. Hele Tewfîq Axa hinde giliyê we bi sernîvekê kiriye heke te bibînin ditirsim pirsên gelekî sar li ruyê te xînin.

– Ji xwe min jî dil heye ko biçim diyarê civîna mezin. Ko çî bidine rûyê min ez jî dê welê bidime rûyê hevalan. Ma ji derbiderbûnê wê da jî heye? Xwedê dihebînî Hewaran kî ji we re tîne?

– Hacî Extî tîne. Ma dixwazî tu jî "Hişyarî" kê bire [bibe] ji hevalan re?

Zor spasand dikim. Gelekî minêkar im ko yekê bibînim û bibim. Li ser îşareta Diktor, Kemal Fewzî rabû bi nav çapxanê de çû. Min jî li çapxanê dinihêrî çî çapxaneke delal çî rêzikeke pak. Tu nema Kemal Fewzî vegeriya hat "Hişyarî" bi dest de bû. Xwerû bi herfên nuh bi derxistibûn heşt rûpel bûn. Ko çî giha destê min serekê min çav lê gerand. Çavê min bi şî'reke delal ket, lê min wezna wê nedianî der. Şî'ra Diktor Fuad bi navê "Bijîşkê Welêt" bû. Lewma ji kurdên dinê dikir. Ne gewre, ne şêx ne munewwer dihiştin. Di paşiyê de spasand li camêrên serkur û derbend dikirin

ko tê de şêrên wek Biro, Îhsan û Ferzende rabûbûn.

Hîn min dixwest bendek didoyên din jî bixwînim min nihêrî destek li milê min ket. Berê xwe dayê ko melekek e got:

– De rabe xorto! Şefeqê gewr kiriye divê tu ji goristanan bi derkevî.

– Malava çî zû hê niho hatim şuxlê min heye ez ê îro jî li vir bimînim û şevê tê dê herim.

– Nabe piştî şeweqê yekî li hir bête dîtî divê ew li dinê venegere û em jê berpîrsiyar dibin.

Ji bona rastiya xebera melik min li çavên hevalan nihêrî. Kemal Fewzî serê xwe hejand got: "Rast dibêje". Min got.

– Ma cezayê mayîna min ew ko tim li vir bimînim? Ji xwe ez jî minêkarê wê yekê me.

Xwedê zane melek zahf xeyidî bû ko li min sor kiribû.

– De zû rabe an ne ez ê gazî ruhstên bikim.

– De here lo!... Ma tu min bi ruhstên ditirsînî? (Û vegeştîme ser Fuad) Bira! Bi yekîtiya Yezdan û bi keser û dilê we bit ko ez ne minêkarê çûyinê me. Min divê li nik we bimînim. Ne min civîna mezin dît û ne jî Şêx. Ma holê çûyin dibit.

– No... mayîna te ne rast e. Ma li vir çî heye heke welat e li dinê ye û xebat jî li wir e. Ji bona dîtina Şêx û civîna mezin şeveke din were.

Hîn pîrs di devê me de bû min nihêrî

melekê me hevalekî xwe daye pê xwe û hat.

– Heke tu naçî ev e ruhstîn?

Ji ber ko carê di navbera Barzan û Birek pîr de min ruhstîn dîtibû ji min re nas bû.

– Here babo here! Ruhstîn dînasim. Û ez ne kesê ko bi virdîqan bitirsim.


Herdu melean li hev nihêrîn û gotin: "Bi rastî serê vî hişk e pîrs pê de naçin divê ruhstîn bi xwe were" û çûn. Kemal Fewzî gote min:

– Te ne qenc kir tu yê çûbûna gava ev gîltî bikin ruhsitîn dê were. Divê em li wir bûna û hatina bêfêde çî lê tê. Li ser bêmadîya hevalan êdî min nexwest li wir bimînim. "Hişyari"ya ko di destê min de min pêça ko têxim berîka xwe. Min dît destekî mezin dirêjî ber devê min bû. Min nas kir destê ruhstîn bi xwe bû. Destê min ê ko hişyarî têde bê hemdê min li destê ruhstîn da û ketim rê.

Bi hilweşandîna destê min re êşekê li dilê min xuya kir. Min çavên xwe vekirin ko li nêzîka behrê li ser mêrgekê razayî me û min piştî destê xwe yê rastê di rex xwe de li kuçekî daye û xwîna germ lê tê. "Hişyarî jî di destê min de tinebû. Şeveqê hîn nuh gewr kiribû. □

Mesû' hevîya Deryaya Sor: 15 gulanê 1933
(Hawar, hejmar 21)

BÎRANÎNÊN MIN



REFÎQ HILMÎ

Şerê Cihanê yê Yekem xelas bûbû, lê di navbera pênc salan de nêzikî ji sisiyan yekê beşdarên vî şerî têk çûn. Belê di riya nexweşiya wekî ta'un (weba) û rîşan de, di vî şerê ne pîroz de bi hezaran lawên ciwan û nûgihîştî telef bûn û gelek lawên şêrîn li ser vê zemîna han bi top, firoke, tang, yanî bi berên şaristaniyetê yan bi berên zanistî û fenê hatin kuştin û çînî-çînî kirin, ku hejmara wan nayê kirin. Hinek ji wan bûn nîşanên gulebaran an hatin îdamkirin, ji firokan ketin xwarê, di nav agir de şewitîn an di avên deryan de xeniqîn. Hinek ji wan jî ji ber sebebê qewimîna vî şerî bêmeymenet qirr ket nav wan, ji birçîna, ji bêdermanî û bêçaretîyê mirin. Dema ku em van hemû têkin ser hev, hejmara kesên têkçûyî û fewitî digihîje 34 milyonan.

Vêca bi vî awayî, piştî vî şerê han ê mezin, mal neman şîn neketê, bajar wêran bûn û di dawiyê de dinya bû cehennemek bi mij û muran û di muddetê van pênc salên han de agirê vê cehennema han hestiyê însanan keland û li ser ruyê erdê qebrîstaneke bêşînor anî holê. Bi vî awayî belgeyek mezin da destê wan kesan, ku ji rastî, xêrî û bêrî û şaristaniyeta çerxa bîstan biguman bûn. Belê di dawiya van he-

mû bûyeran de, pişt re dewletên sondxwarî di îtê çirya paşiya sala 1918an de li Wersaillesê berhev bûn, şertên aştîyê îmza kirin û dinyayê nefesek rehet sitand...

Piştî sekinandina şer rewşa Dewleta Osmani

Ji ber ku beşek zêde kurd û Kurdistan û bi taybetî axa kurdên Iraqê, heta Şerê Cihanê yê Yekem di bin hakîmiyeta Dewleta Osmanî de bû, ez pêwîst dizanim ku hinekî li ser rewşa vê dewletê ya piştî sekinandina şer bisekinim.

Piştî sekinandina şer û di sala 1918an de li Mondrosê îmzakirina şertên aştîyê bi tirkên re, dewletên sondxwarî eskerên xwe şandin Stenbolê û îşgal kirin. Vêca di rewşek wiha de hûn bi xwe halê rûniştî û bajarê Stenbolê bînin ber çavê xwe. Qasek serleşker, zabî û mezinên tirkên ên ku li Stenbol bûn, meb'usên xwîngerm û lawên tirkên ên welatparêz, şairên mezin û nivîskarên bi navûdeng ên wê rojê bînin ber çavê xwe ku pêûs di destê wan de şikestibû. Wan tirkên bînin bîra xwe ku bi zelifî ketibûn bin çengê leşkerên dewletên sondxwarî û di paytext û nivê cergê welatê xwe de bûbûn dil (esîr).

Ew tirkên dewleta wan ew tama kiribûn ku bi Almanan re bikevin şer û biserkevin, bi girtina Sancaqa Şerîfê de ji ingilîzan bibin û berê hemû musulmanên dinyayê bidine xwe. Lê paytextê wan ê hêja û şêrî ji aliyê dijminên wan ve haribû îşgal kirin, bi sernizmî û pozîkestî ketibûn bin hukmê yê leşkerên sondxwarî û bi taybetî leşkerê ingilîzan. Ew kesên esker, bi zabî û berpirsiyarên xwe veji tîrsa rûswabûnê kincên xwe guheribûn yan xwe veşartibûn...

Dewletên sondxwarî li hemberî tirkên, bi "hikmetek" din hereket nekirin. Gurur û hewayê wan a serkevtina di şer de perdeke reş kêşabû ser çavê wan. Ji heddê zêdetir tirk dixistin tengiyê û têgihîştîyên wan bi carekê sivik û bêqedir dihatin ber çavê wan. Destdirêjiya eskerê dewletên sondxwarî û derketina wan ji perdeyê şerm û edebê, hêdî hêdî tirkên bihêz dikir, divejenand. Tu rê û çareya zabitan, xwendevanên bilind û meb'usên welatparêz nema û ji ber vê jî xwe nêzikê hev kirin. Pê hesiyar ku mirin ji vê jiyana xweştir e. Ji ber vê gelek bi ser de derbas nebû, xwîngerm û welatparêzên biryar dan ku serî hildin. Wan dizanî ku netîceya vê serîhildanê ne sehl e, lê tu tam jî di wî awayê jiyana wê rojê de nema bû. Gelek tirk ji mirinê re amade bûn. Madem wiha bû ji bo çî ji mirinê bitirsiyana? Bi taybetî mirinek ku di riya şeref û rizgariya welat de be. Eger hat nekarîn welat û şerefê xwe rizgar bikin, riya bimirin a rizgariya ji dîlîtî û bindestiyê nehatibû xitimandin. Milletê tirk ewqas tenê xwîn tê de mabû ku hîs bi vê bêşerefiyê bike û ji dîrokên derbazbû-

yî îlham bistîne. Ji bo jiyaneke bi şeref û di riya azadiya qewmê xwe de ji xwe fedakirinê paş de nehêle, bi wê xwîna ku di demarê lawên wan ên esker de maye, ew leka qirêj a ser eniya wan hatiye nivîsandin paqij bike. Êdî ew di wê rewşê de nebûn ku mûlaheza netîceya vê tevgera han bikin. Ez nizanim çî tevger di pêşî de netîceya serhildana xwe zaniye? Kê bi hemû awayî bi "tedbîr" û bi aqil hemû karê xwe biriyê serî? Ji kîjan zanayê mezin re hemû carê dahatû ronî bûye, yan bi aqil û hiş bi ser her bûyerê de serketiye? Kê kariye bibe durûstkerê dahatûya xwe? Gelo ji ber sebebên şer nebûya, kê û an zêde kê dikarî bûyerên rojên dahatû bizaniya? Ger wiha bûya, ji roja dinê avabûye heta îro tu kesekî şaşîti, çewti û xirabiyek dikir? Madem wiha ye ew "illet" û sebebên em tînin, ew hemû hesabên dîrûdirêj ên ku em dikin, her tenê ji bo wê ye ku gunchên kirinên xwe em têxin situyê xwe. Her wekî ku em netîceya başiya hinek kirinên xwe dibin digihînin bi aqilî û tedbîrên xwe û pê îftîxar dikin, ev jî wîsan. Ji xwe em dizanin aqil û tedbîr çiqas ji bo rêxistîniya çavkaniyên fikir û kirinên me bi feyde ne û ew nikarin bîn înkarkirin. Cardin em nikarin bêjin ku hemû kirinên di dawîya fikir, melheze û bikaranîna aqil û tedbîran, netîceyên baş jê peyda dibin. Her wekî di eksê van em nikarin bêjin ku her kirinên di cî de yên bi lezûbez û bêyî fikirkirinek dîr û dirêj, encama wan xerab e û hemû kirinên eksê van jî bi ser dikevin û netîceyên wan baş in. Vêca ji ber vê bû ku piştî van bûyeran li Stenbol tu çareyek tirkî nema û kirinên nelirê û nerewa yên eskerê dewletên sondxwarî çare li wan birî û xedîr û neheqîya karbidestên wan tesîr li mejî û dilê wan kir. Tirk gihîştibûn derecek zelîlî û perîşaniyek wîsan ku ji bo rizgariya ji vê rewşê penayê mirinê dikirin. Dema melheze û fikirkirina dîr û dirêj nebû. Hevsarê tedbîrê ji dest derketibû. Xwe ber bi pêlên hedîsan ve berdabûn. Tu şik tê de nîn e ku ew kesên bi vî awayî hereket dikin, bêyî li ser fikirkirina mantiqa tevgerê, gav diavêjin, ger har: serkevtin bi dest xistin û riya rizgariyê li ber wan vebû, di qonaxa azadî û serxwebûnê de ji bo hemû kirinên xwe tefsîrekê dibînin û netîceyên pala baş ên hemû kirinên xwe didin ber felsefe yan mantiqekê. Vêca nivîskar, şair û dîroknivîsên durû, ku heta do ew bi bêaqilî û serberedayî binav dikirin û gelek caran jî bêperwa ew dijminê millet, bi xiyaretî û nepakiyê îtham dikirin, dikevin metûh û senaya serkevtinê û behsa welatparêziya wan.

Piştî sekinandina Şerê Cîhanê yê Yekem û di neserkerîna hêzên tirkî û îşgalkirina beşên din ên welatê Osmanî ji aliyê leşkerên sondxwarî ve û danesekinandina şer (mutareke), tevgera tirkî ji nû ve dest bi xwe amadekirina ji bo şerekî din bi hemû dewletên sondxwarî re kir. Bi tenê serê xwe û bêyî alîkariya dostekî taybetî û cîyê baweriyê, ev cure tevgerên han jî, ku me li jorê behs kir, bi aqil û mantiqî bi rê

nakeve, dest avêt domandina vî şerî. Lê zelîlî û derdê millet, sivikî û jariya leşkerê neserkerî yê dewleta Osmanî gihîştibû noqta dawiyê. Ji ber vê wan ber bi mirinê ve gav avêtin. Vêca melekê talihê hêviya hêvîdaran bicî anî. Bi vî awayî tevgera wan di cîhanê de bû destan...

Mustefa Kemal (Atatürk)

Wekî me got, piştî şersekînanandinê (mutareke) xelkê Stenbolê di nav tengiyek giran de bû. Ji ber vê dema ku wan biryara tevgerê dan, ji vê pê ve tu çareke wan nema-bû. Vêca xwendewarên rewşenbîr û welatparêz biryar dan ku Anadolu ê ji tevgera xwe re bikin bingeh û agirê şoreşê ji wir hil bikin. Çunkî Stenbol ji aliyê leşkerê dewletên sondxwarî ve hatibû îşgalkirin, mecala vexistina agirê şoreşê tê de nema-bû. Ji ber li Stenbolê hebûna eskerê çend dewletên dijmin, sefirên hukûmetên biyanîyan û gelên eqaliyat ên ne tirk, zelîlî û bêhêviya wan tirkên bêçek û bêdesthilat ku li Stenbol diman, her yek ji van astengên girîng bûn li ser riya serkevtina vê tevgerê. Di vê dema bêhêvîti û fikirkirina bêfeyde de, çirîskêkê ji nişka ve dilê welatparêzan ronî kir. Hukûmeta Stenbolê, yek ji wan zabitên xwîngerm derxist pêş ku di bin de hevpeymanê wan bû û fikra rizgarkirina qewmê xwe ji bin çengê dewletên sondxwarî yê dijminê tirkan dikir. Ev zabitê han ê xwîngerm û welatparêz, Mustefa Kemal bû. Hukûmeta Stenbolê şaştî kir ku Mustefa Kemal kir Mufettişê Giştî yê Leşkerê Tirkan li Anadoluyê.

Li gor vê "wezîfê" berhevkerin û rêxistinîya hemû leşkerên Osmanî yê li Anadoluyê ketibû situyê Mustefa Kemal. Ji ber vê jî dema ku ev wezîfeya han jê re hat dan, gelek bi dil û can biryar da ku biçe Anadoluyê. Bi vî awayî di 15ê gulana sala 1919an de ji Stenbol derket û çû ser karê xwe. Dema ku gihîşt Anadoluyê zabit û mezinên leşkerî di bin çav re derbas kirin. Bi dizî bi fermanderên wan re ket nav axaftin û sohbetan û ew bi armanca di dilê xwe de têgîhandin. Tevan bi xwînegerm û bi giyanek pak û paqij welatparêziya xwe jê re dan diyar kirin. Wîsan dixuya ku gelek ji wan daxwaza tevgerêkê dikirin û alîkarvanê ber bi fikra çûna mirinê ve bûn û bi wî awayî Mustefa Kemal jî bi dil bawerîya xwe bi wan anî.

Ji ber vê berê hemû tiştê ji bo pêşîlgirtin û rawestandina leşkerên Yunaniyan, bi Nureddîn Paşa re lihev kir. Pişt re çû Erzurum ê. Zabitên li wir bûn dîtî û wan guftûgoyên rêxistinî û ji nû ve vejîna eskerên xwe pê re kirin û biryar dan ku careke din perwerdekirina eskerî bi leşkerên xwe bidin kirin. Lê hukûmeta Stenbolê ku di bin çavdêrî û kontrola dewletên sondxwarî de bû, ji van kirinên han ket

tirsê û di cî de daxwaza veqer Mustefa Kemal ya Stenbolê kir. Vêca Mustefa Kemal piştî guftûgo û girêdana peymanê bi fermander û mezinên leşkerî re, biryar da ku neçe Stenbolê û li hemberî hukûmeta xelîfe bisekine.

Piştî dijderketina Mustefa Kemal, li pê hev li Erzurum û Sîwas ê du caran civîn harin çêkirin. Di van civînan de gelek ji endamên "Meclîsa Mebûsan" ên Stenbolê jî hazir bûn. Wan biryar dan ku hukûmeta Stenbolê hukûmetek meşru qebûl nakin û ji ber ku ev hukûmeta han di bin nîfûza dewletên sondxwarî yê dijmin û biyaniyan de ye û bila kesek jî guhê xwe nede fermanên wê. Ji bo vê jî pêwîst zanîn ku li Anadoluyê ji nû ve dest bavêjin berhevkirina meclîseke nû û ji bo vê meclîsê helbijartina nûnerên xelkê Anadoluyê (Hezîran 1919).

Di milekî din de, di eynî wextî de, tevgerê gelek bi tirs û sawm li Stenbol peyda bû û hukûmeta Stenbolê bi tevayî ket nav endîşeyê. Ew endamên Meclîsa Mebûsan ku li Stenbol bûn rewş gelek xerab dihat ber çavê wan. Ji vê rewşê gelek bi şik û bi tirs bûn. Ji ber vê wan jî pêwîstî zanîn ku fikra dahatûyê bikin û netîceya wela-tê xwe bigrin ber çavê xwe. Li ser vê di 20ê kanûna paşî ya sala 1920 an de berhev bûn û piştî muzakereke dûr û dirêj, bin navê "Mîsaqê Millî ya Tirk" biryar dan û meclîs belav kirin. Li gor benda yekem a vê mîsaqê dîrokî, dewleta Osmanî dev ji hemû wan ciyan berde ku beşê piraniya rûniştîyên li wir ereb bûn, awayê îdare û rêvebirîya kar û barên wan welatan ji ereban bi xwe re hiştin.

Di benda sîsiyan a vê mîsaqê de jî behsa qaîde û usûla îdareya eqaliyatên di wela-tê tirkan de diman, dihat kirin. Lê di vir de şertek hatibû danîn û hewce bû ku ew musulmanên eqaliyat ên di wan welatên biyanî yê xeyrîmuslim de jî ji aliyê wan dewletan ve li gor vê qaîde û usûlê bînan îdarekirin.

Lê di nav vê mîsaqê de kurd û Kurdistan tunebûn û ew binberk kiribûn. Wîsan diyar bû tirkan ji aliyê dîn, zîman, orf û adet ve kurd û tirk yek dihesibandin û ferqiyetek di navbera wan herdu qewman de nedidîtin. Hebûna ermeniyên jî tenê li wilayeta Qersê, Batumê û Erdehanê qebûl kirin, bi ser vê de jî wekî ku bawerîya wan bi wê tunebe, ku ermeniyên li van her sê wilayetên nexwazin ji tirkan cihê bin, di benda pêncê mîsaqê xwe de şertek danibûn ku ji bo vê di rojên dahatû de ji ermeniyên bi xwe bipirsîn, ka gelo meyla wan a cihêbûnê ji tirkan heye an ne?

Ev karê han ê Meclîsa Mebûsan a Stenbolê, di milekî de navê xebata Mustefa Kemal li Anadoluyê roj bi roj germ û desthilata wê qewî kir û di milekî din de jî, bi tevayî hukûmeta xelîfe ya li Stenbolê bêqîmet, sivik û bêhêz kir. Ji ber vê, xelkê hêdî hêdî piştî xwe dan vê hukûmetê, ku li Stenbol di bin destê rêveberîya hêza dewletên sondxwarî de bû. Hemû bûyeran didan xuyakirin ku tevgera Mustefa

Kemal dê bibe sebebê jiyana milletê tirk û ji hemû milî wê tevger dest pê bike û bibe sebebê serbilindî û aligiriya tevgera Mustefa Kemal.

Vê hal û rewşa han hukûmeta Stenbolê xistibû tengiyê û ew di nav destpêka bêhêzî û ji holêrabûnê de bû. Hêzên dewletên sondxwarî jî ji ketina tengiyasiya hukûmeta xelîfe û handana wê li ser Mustefa Kemal paşde nediman. Wan dixwest ku Stenbol, dicî de leşker bişîne ser Mustefa Kemal û hê ku xurt nebûye û belavî hemû milekî nebûye. Bi çî mercê dibe bila bibe yan Mustefa Kemal bêtesîr bike yan jî holê rake.

Bi xwe jî, yanî hukûmetên sondxwarî di bin fermanderiya general Millîn de hêzeke din şandin Stenbol û bi tevayî kirin bin hukmê eskerî û nifûza xwe (16yê adara 1920an).

Piştî vê, hukûmeta "sîvil" jî kirin bin destê xwe û li ber çavê xelîfe ji mezinên eskerî û sîvil 66 kes girtin û ew bi zor, bi dîl şandin Maltayê. Yê ku endamên Komelêya İttihad û Teraqqî ya hukûmeta pêşî bûn û piştî mutarekê jî li Stenbol mabûn, di îşgala yekem de ew girtibûn û şandibûn Maltayê. Vêca dema ku karwanê tirkên esîr ên duyem gihîşt Maltayê, bi guruba pêşî re bûn yek û xem û kulên esîrtiyê danîn milekî û hinekî geştir bûn.

Wezaretê Damat Ferîd Paşa û Mustefa Kemal

Piştî ku general Mîln bi leşkerên xwe ve hat Stenbolê, Meclîsa Mebûsan a Osmanî di 19yê adara sala 1920an de bi resmî civiya û biryar da ku îmkana wan a karkirinê nemaye û meclîsê bi temamî belav bikin. Endamên vê meclîsê yê neketin bin çengê hêzên dewletên sondxwarî, derbas bûn û berê xwe dan Anadoluyê û xwe gîhandin Mustefa Kemal.

Bi vî awayî welatparêzên tirk ên xwîngerm hêviyek mezin peyda kirin û ketin nav rewşek din. Mustefa Kemal jî bi vê hêzê piştstor bû û xwînek nû sitand. Tam vê navê re di nav hukûmeta Stenbolê de jî bûyere welatparêzî qewimî. 'Elî Rîza Paşa yê Sedrezem nekarî xwe li hemberî bûyerên serbixwe û kirinên nedîcî de yê hêzên dewletên sondxwarî rabigire û bi awakî azad û mêrane derket pêş û daxwaz ji xelîfe kir ku wî ji riyaseta hukûmetê azad bike. Sultan Wehdettîn ê xelîfê wê demê, ku bi tevayî riyê xwe dabû destê hêzên dewletên sondxwarî, di cî de rîcaya 'Elî Rîza Paşa qebûl kir û ew ji riyasetê azad kir (30ê nîsan 1920). Dî ciyê wî de ji bo damezirandina hukûmeta nû daxwaz ji Damad Ferîd Paşa kir.

Bi vî awayî di bin serokwezîrtiya Ferîd de hukûmeteke bêxwîn û jar li dijî welat-

parêzan hat danîn, ku ji bo her fermaneke Wehdettîn amade be û tu carî nekare li hemberî gotinên hêzên dewletên sondxwarî dengê xwe bike.

Yekem îcraata Ferîd Paşa ew bû ku, leşker bişîne ser Mustefa Kemal. Lê Ferîd dixwest ku vê kirina han bi awakî wisan bike "neheq" neyê nîşandan. Egerekê jê re bibîne û nebe sebebê propaganda li dijî hukûmetê. Ji ber ku alîgirên Mustefa Kemal jî û yên rikê (toreyî) wan ji sondxwaran û hukûmeta Stenbolê dihat, dikarîn vê yekê "destrija" xwe bihesibînin. Ji ber vê, ferwa Şeyxulîslam ji wezareta xwe re derxist û da belav kirin ku li gor vê fetwaya han ceza kirin û ji holê rakirina Mustefa Kemal wacib e (11yê nîsan 1920) û pişt re leşkerên xwe ber bi Anadolu u yê ve şand.

Di milekî din de jî hukûmeta Stenbolê di bin serokatiya Mustefa Paşayê Kurd de (Mustefa Yamulkî) meclîsek eskerî danî û pişt re vê meclîsa han dest bi muhakema Mustefa Kemal û welatparêzan kir. Ji du milan ve, yanî bi hêz û qanûn, ku di bin tesîra siyasetê de bû, dest avêtin şikandina manewiyata welatparêzan û çavtirsandina wan. Hêzên eskerî yên xelîfe li Anadoluyê û qanûna Dîwana Orfî li Stenbolê, ketin hewlê tefandina vî agirê han. Herdu hêz jî ku bi perê hêzên sondxwaran hatibûn danîn, ketin giyanê ew kesên ku serî li ber neheqî û xedriya dijminên welat û hêzên dagîrker ên biyanî netewandibûn. Bi taybetî yên ketin ber destê Dîwana Orfî xwediyê serê xwe nebûn. Hinek ji wan hatin îmha kirin. Di 20ê gulana sala 1920an de vê dîwana han hukmê îdama Mustefa Kemal û gelek kesên bi nav û deng ên tirk jî da.

Wê demê li Stenbolê ji ruyê vê siyasetê û van kirinan sawmek gelek bi tirs hebû, xelk di nav şînê de bû. Vê navê re Peymana Sewrê jî ji aliyê sondxwaran ve, bi dewletên di şer de neserkevtî û bi hukûmeta Osmanî re hat înzakirin (10ê tebax 1920). Di vê peymana han de ku îskeleta piştî Tirkîyê pê şikest, di warê serxwebûna welatê kurdan û azadiya qewmê kurd de sê bend tê de bicî kiribûn. Ew jî bi netîceya hewildanên Şerîf Paşa yê siyasetvanê kurd pêk hatibû. Her çend ji ber sebebê asteng derxistina ingilîzan, nûnerên Şêx Mehmûd li Helebê ji aliyê hêzên Fransê yê yên di Sûriyê de bûn, hatin rawestandî û rê nedan ku ew biçin Parîsê û mezbeta Şêx Mehmûd ya li ser navê kurdên Iraqê şandibû, bigihîje destê Şerîf Paşa. Lê cardin kurdên Tirkîyê û gurubek siyasetmedarê kurd ên li Stenbol, karîna ser navê xwe û yên hemû kurdan wekaletnameyekê ji Şerîf Paşa re bişînin û wî di nezde Kongreya Aştiyê de ji xwe re nûner hilbijêrin. Vêca Şerîf Paşa di derheqê doz û huquqê netewê kurd de, di tarîxa 22yê adara sala 1919an de di bin navê: *Memorandum Sur Les Revendications du Peuple Kurde*, bi fransîzî pêşkêşî kongreyê kir. Ji bilî

vê di vê riyê de hewil û xebatek baş jî kir, ku van hersê madên han ên di derheqê serxwebûna kurd û Kurdistanê de têke nav Peymana Sewrê.

Ev gawek mezin bû ku ber bi îstîklal û serxwebûna Kurdistanê ve hatibû avêtin. Lê gelek mixabin kurdan jî vê fîretê qet îstîfade nekirin. Çunkî gējîtî û serêşiyên siyaseta wan rojan gelek dewlet jî bin axê derxist ser rûyê erdê û di ciyê wan dewletên hilweşayî de jî hinek dewletên nû ajardan. Lê di nav gējîtiyek bi vî awayî jî nişka ve û giran de, xweragirtin û li ser dar û kewaçên avahiyên hilweşiyayî, bi azane û bi tundî damezirandina bingehê hukûmeteke nû, karekî sivik nebû. Ji ber ku ev karê han ê girîng û zehmet, pêwîstî çelengî, pisporî, zanistî û serhildanek azane bû. Mirovên rast û têgihîştî, zîrek, siyasetvan û welatparêz jê re dixwest. Yên nû hîşyar bûbûn hê çavê wan gelek nevbûbû û bi tundî xwe nedan pêş. Wisan bi zû hişê wan nehat serê wan û tiştek jî derûdora xwe fam nedikirin. Wan nezanî ka gelo di nav van toz û xubaran de çi qewimî? Yan jî başî û qenciye tê de bibînin û jî hev veqetînin. Ji ber vê nekarîn xwe jî şer û xerabîyan biparêzin. Dema ku toz û xubar nema û wenda bû û wan çavê xwe vekirin û lê nêrin, lê êdî navnîşana başiyê tê de nema bû. Çi tiştek baş û bi feyde bû di navbera çavvekirîyan de hatibû parvekirin û jî bo nîvhişyar û terkexeman jî jî zincîra esîrtiyê pê ve tiştek nema bû. Ev zincîra han jî ku di dawiyê de bi hêsanî û rehetî kirin situyê wan, bi qeyd û lele hatin tehkîmkirin û ev jî hê zêdetir bû sebebê hinek din hişkiya "girêya kor" ku li gerdena wan alandibûn. Ev yeka han gihîşt dereceke wisan ku êdî ciyê baweriyê nebû ku ev zincîra han jî situyê wan bê vekirin. Yek jî van neteweyên nîvhişyar, terkexem û çarereş, gelek mixabin neteweyê kurd bû.

Mustefa Kemal û welatparêzên tirk ne ji Muaheda Sewrê tirsîyan û ne jî bi hatina leşkerên xelîfe silikiyan. Damezirandina Dîwana Orfî û danîna darên feleqê çavê lawên xwîngerim ên Stenbolê netirsand. Ew hêza ku Ferîd Paşa di bin serokatiya Ehmed Anzawur Paşa yê Çerkez de şandibû ser Anadoluyê, jî aliyê hêzên Mustefa Kemal ve xerab hatin şikandin û belav bûn. Ferîd Paşa jî ser şikandina vê hêzê jî çenk û peran ket û xelkê Anadoluyê ber bi wî ve nehatin. Li ser van bûyeran hêzên ihtilal ketin nav hinek planên din. Fikra bikaranîna siyaseteke nû kirin. Ferîd Paşa jî serokwezîrtiyê dût xistin û di bin serokwezîrtiya Tewfîq Paşa de wezaretek nû danîn. Endamên vê wezaretê han kesên hêmin ên bi nav û deng û serbixwe yên wê demê bûn. Ji ber vê di herdu milan de (Stenbol û Mustefa Kemal) jî hêviya aşî û lihevkerîne hat dîtin...

Em ê mesela Mustefa Kemal û zindîkirina rêxistin û hêza tirkan di Anadoluyê de li vir bihêlin û bînin ser mesela kurd û Kurdistanê...

Peymana Yekîtiya di navbera Mîrektiyên Kurdan û Sultan Selîmê Osmani de û netîceya vê yekîtiya han

Piştî ku mîrektiyên kurdan bi hewildan û xebateke gelek zêde ya zanayê mezin Idrîsê Bedlîsî çûn bin fermana Sultan Selîmê yekem, peymanek bi rênîşandan û tedbîra Idrîsê Bedlîsî di navbera Yawuz û mîrên kurdan de hat çêkirin. Li gor vê peymanê, mîrektiyên Kurdistanê tenê li ser siyaseta derve yekîti bi tirkên re qebûl kiribûn û bi dewleta Osmanî re yekîti çêkiribûn. Piştî vê, mîrên kurdan bi xwe û bi leşkerên xwe ve piştî Sultan Selîm girtin û bi Îsmailê Sefewî yê Şahê Îranê re ketin şer. Ev bûyera han di şerê bi nav û deng ê Çaldîranê de bû sebêbê serkevtina Selîm û şikestina Şah Îsmailê Sefewî. Piştî re destana vî şerê han ê girîng û bi sawm di nav rûpelên dîroka Osmanî de cihêkî taybetî girt û milletê tirk heta îro jî pê îftîxar dike.

Ji wê rojê heta îro, ew kurdên ku di warê bûyerên girîng ên dinyayê de xwediyê gelek tecrube û bîr û bawerî ne, rûşî hemû cure tengî û zehmetiyên bûne û ji gelek astengên mezin xwe rizgar kirine, xwîna xwe dane rêtin û xwîn rijandine, lê cardin destê wan di nav destê birayê wan ê tirk de di rojhîlat û di rojava de, di riya şan û şerefa dewleta Osmanî de xwe ji fedakirinê paş ve nedane, qasê mûyekî xerabî jê sadir nebûye. Bi mal, can, çek û xwîna xwe ve alîkariya tirkên kirine. Tu guman tê de nîn e ku di nav wan qebrîstanên kuştîyên leşkerên Osmanî de, ku li Erebaştan yê yan li Ewropayê li ber burc û surhên Viyanayê car û carnî tenê dîtin, giyanê gelek lawê kurdan jî tê de ne. Lê tirkên ev yekê han jibîr kirin ku neteweyê kurd berê ku bi tirkên re yekîtiyê çêke, serxwebûnî û azadî tam kiribû, bi xweşî û serbestî jiyabû û nedizana ka gelo esîrtî çiyê? Bi ser vê de jî paqij û dilpakên mezin û têgihîştîyên kurdan nebûne çiyê rizamendî û çiyê bawerîya tirkên. Heta îro jî xwîna xwe di riya wan de feda kirin û xwîna xwe rêtin, lê hê zêdetir di çavê wan de sivikbûn û hê zêdetir bûn bindest û ketin nav tengiyê. Di çiyê ku bi çavêkî sitayîş li wan mîrên kurdan binêrin, qedrê wan bigrin û qîmetekê bidin birayetiya wan, riya têgihîştîniyê li ber wan negrin û mecala pêşveçûn û pêşkevîneke temam bidin wan, tam eksê vê ketin destavêtina îdareya hûndurî ya emaretan û mijûlê peydakirina dubendiyan navbera wan bûn û ew li dijî yekûdu dan rakirin.

Ji bo van armancên xwe hemû awayî têkoşan, ji tu tiştêkî xwe neparastin. Şerm nekirin û qebehet nezanîn ku bira berdîn pêşîra bira û kur berdîn giyanê babê. Di xerakirina mîrektiyên kurdan de, negihîştin armanca xwe. Ji ber vê li ser siyaseta Makyavelî meşîyan û qîmet nedan tu desturek din. Ev siyaseta han hê di dema

Sultan Suleymanê kurê Yawuz de dest pê kir û ku jê re Qanunî digotin. Ev sultanê han ku qewmê tirk xwe bi wî dipêve û di rêza padîşahên mezin de dihesibînin, yek ji wan bû ku ji xwînrijandinê zewq distand. Her wektî bi handana jina xwe ya biyanî, ji ber bahana ku çavê wî li ciyê babê wî ye, kurê xwe yê mezin, perçê ji dilê xwe û welêhdê sultanê Osmanî li ber çavê xwe bi celladan da xeniqandin. Wî her roj fitnek dixist nav mîrên kurdan. Di netîceya daxistina hemû fitnek de, dibû alîkariya wî mîrî bike ku bêhêz û kêr desthilat dihat dîtin û bi vî awayî bêsêkin, yek û bi yek mîrên kurdan ên bi hêz û mezin ji hêz û taqetê xist û bi neheqî xwîna kurdên bêguneh rêt. Kurdan ji vê xemek nexwarin û hişê wan nehate serê wan. Ji ber vê sultanên piştî Qanunî jî karîna ser vê siyasetê bimeşin û yek bi yek mîrekiyên kurdan ji holê rakin.

Bi taybetî Sultan Mehmûdê duyem di vê siyasetê de bi yek carê dest bi bêperwariyê kir û bi êşkere ket fikra qirkirina kurdan. Li ser vê ji du milan: ji Botan û ji Rewandiz (1870ê zayînî) rabûn piyan. Lê di netîceya van herdu şoreşên mezin jî, ji ber sebebê hinek nepakiyên hindurî yên kurdan, ev herdu mîrekiyên mezin û bi hêz jî bi tevayî hilweşiyên û di sala 1847an de êdî tu emareteke kurdan di sahê de nema û hemû welatê Kurdistanê raste rast ket bin hukmê tirkan.

Piştî wê tarîxa me behis kir jî (1847), carîna tirkan dev ji kurdan bernedan û bêsêkin ji bo ji holê rakirina bawerî, dîn, ziman, orf û adetên wan têkoşan û mijûlê fewtandina wan bûn. Lê vê siyaseta han di dawiyê de, yanî di qonaxa peydabûna hêza Ittîhâd Terraqî de, reneqê zelaltir sitand. Çûnkî ev partiya han siyaseta Turanî ji xwe re kiribû "dîn" û li gor programa wan di welatê Osmanî de ji bilî tirkan kesekî din ê xwedî maf tuncbû.

Li gel vê jî, dema ku hatin ser hukum, di destpêkê de xwe nêzikî kurdan kirin, kesên di dema Ebdulhemîd de hatibûn durxistin, veşeriyên Stenbolê û rê dan wan ku li Stenbolê komeleke kurdî damezrînin. Lê -em ê di ciyê wê de behis bikin- vê demek kurt domand, pişt re ketin planên paqijkirina welat ji ew kesên ku bi nîjada xwe tirk nebûn. Wan fikra danîna dewleteke sade ya tenê ji nijada tirk pêkhatî dikirin û dixwestin gotina "Osmanî" ji ortê rakin. Vêca dijminatîya navbera tirk û kurdan, ku bi saya siyaseta sultanên Osmanî û ji dema Qanunî Silêman ve dest pê kiribû, di 1908an de, yanî piştî hatina Komeleya Ittîhâd û Terakkî li ser hukum û hatina endamên vê komeleyê yên dîktator li ser kar, bi tevayî êşkere bû û siyaseta Turanî her wektî bû sebebê nesazî û nakokî di navbera tirkan û hemû neteweyên xeyrê tirk de. Di netîceyê de bû sebebê bêhêzî û lawaziya dewleta Osmanî û telefî û ji holê rabûna mezin û serokatiya komeleyê jî...

Piştî Şerê Cîhanê Yê Yekem Kurdistanê Başûr Hukûmeta Ingilîstanê, di sala 1914an de, yanî di destpêka Şerê Cîhanê yê Yekem de, ji başûrê Iraqê ve dest avêt êrişanîna ser sînorê Iraqê. Di sala 1915an de Besrayê û 1917an de jî wilayeta Bexdayê îşgal kir. Di sala duyemîn ê vî şerî de êdî gav avêtibû wilayeta Mûsilê jî. Di wan dewran de, di rûyê xerabî, zulim û kirinên nerewa yên karbidestên hukûmeta Osmanî û nerastî û nepakiya beşê piraniya memûrên eskerî û sîvil de, xelkê bi carekê berê xwe ji hukûmetê guhertibû. Ji bilî vê jî bi navê îşa eskerî çî tiştê xwarinê û zexîrên feqîr û hejaran hebû -bi taybetî yên gundiyan- her roj bi navê tiştêkî, yanî carek bi navê mubayî'e û carek din bi navê alîkariyê zebt û talan dikirin. Beşê piraniya van di navbera karbidest û mirovên mezin ên neqenc û nepak de dihat parvekirin û beşek gelek kêr ji vê diçû diket enbara dewletê, ku ew jî didan eskeran an bi ser jin, zarok û malên memûr û ew zabitên ku di sînoran de sîngê xwe didan ber gullan. Eşkere ye feydeyê bi wî awayî jê nedihat wergirtin û çî ahalî û çî esker roj bi roj diketin nav halekî xerabî, birçîtî û rûttir dibûn û kesên dilkevir jî gunehê wan bi wan dihat.

Rik û kîna tebîetê jî ji vê rewşê re bû serbar; di van salan de ku ji ber şer, kar û barên çandiniyê yê cotkaran di destê kal û pîrên bêtaqet de mabû, li erdê ma. Bi ser van tevan de nebarîna baranê, ev hemû ser hev bûn sebebê hê zêdetir bargiraniya xelkê û dilê xelkê kul û hişk kir. Dilê tebîetê yê req jî nerim nebû û qet nebe ji bo rizgariya feqîrên bêguneh ji birçîtî û nexweşiyê, dilopek baran nebarî.

Bi vî awayî nebûna bêrehmî û bêmerhemetiya tebîetê jî feqîr û hejaran re li milekî, li milekî din jî nepakî, zulim û zordariya karbidestên Xwedananasan bû sebebê xela û qirreke bêdad û malwêranî. Bi awakî wisan ku hoqqeyekarvanê tîkel ê wekî xweliyê, derket liyeyekê. Qasê çend mehan, ji bilî wan kesên ku dewlemend û desthilatdar bûn an ji hukûmetê zexîre û xwarin distandin, ku ew jî piştî xelkê ketin nav tengasî û sixletek wisan de ku êdî nepirse. Xwarinên wekî arvanê birincê, mewjê reş, rûyên hişk jî neman û bi dest nediketin.

Piştî vê, vêca ketin xwarina arvanê berrûyan. Libên pembuyê jî bûn xwarina kesên herî belengaz û lêqewimî yên feqîr û hejarên liwaya Silêmaniyê. Eşkere ye ev rewşa han jî bû sebebê peydebûna gelek cure nexweşiyên. Navek re ku xwarin, herca nanê hişk û baqle jî bûbûn derman û tenê destê xwedî talihan -ew jî bi degmendiket, derman, destê wan biketaya jî ji wê nebû bê bîra wan an carên wisan hebû ku bikarin bikirin.

Ji ber vê, hemû nexweşî namzedên mirinê bûn. Xwedê bike berê ku ber çavê dinyayê bibin îbret zû dimirin. Lê piraniya beşê van nexweşan derdekî wan tune-

bû, di rûyê xwarinên xerab, laşên mirarbûyî yên hinek teyr, mirîşk û dîkan weya ji ber xwarina arvanê berrûyê yan tûyê hişk û libên pembuyê bûn. Demek berê mirina xwe bi tevayî req û hişk dibûn, vêca çav, rû, dest û piyên wan diwerimîn, pirçên ser, çav û simbêlê wan digemirîn û çavê wan diçûn kort û dimirin. Ne tenê mêr, ji ber ku jinên bêkes û keçên ciwan jî, ku rût û tazî mabûn, nedikarîn laşên xwe bigirin. Vêca zivistanê dest pê kir, lê zivistaneke giran û di eksê tunebûna dexil û dan, zivistaneke yekcarî sar, serma û baran. Êdî ew kesên ku Xwedê pariyek nan jî dabû wan, bi jiyaneke tehl û tirş têr dibûn, ji ber hawar û qêrîna bêhêzî û dengê fixan û hawara jin, zarok, pîrejin û pîremêrên nexweş ên ji dest û piyan ketî, ku di bin baran, reşeba û sermaya zemheriya şevên zivistanê de ji kulanandî hatin guhê wan, aramî bi ser wan de dibirî û bêdeshilat dest bi girînê dikirin. Hê ji vê re jî şikur. Roj tunebû ku di bajarekî wekî Silêmaniyê de, ji birçiyandî an ji ber nexweşiyê, ku ew jî di rûyê birçîtiyê de bû, ji deh kesan kêmtir jê nemrin. Ev hejmara han a herî kêmtir bû, hinek roj hebû ku gelek ji vê hejmarê zêdetir jî dimirin. Êdî veşartina laşên miriyan ji çarçeva îmkana herêmê derketibû. Bi taybetî piştî ku gelek roj bi ser cenazên li kulanandî de diman derbas dibû, ziravê xelqê diteqiya. Vêca qasek bi ser de derbas bû, neveşartina cenazan dest pê kir. Êdî ji bo çend seer xew, xelkê berê xwe dida mizgeftan an kulanek xalî yan jî bikare serê xwe têxe qoncekî, çavê xwe li ciyekî xalî digelandin. Bêguman serê her gavekê laşek rût û hêşnbûyî diket ber çav, ku însanan ditirsand û disilikand. Çavlêgirtina vê dêmena han û xemxarinî feyde nedikir, xweveşartin, rizgariya ji dûrketina van wênên tijî fîret, ku kizînan ji dilê mirov diant û dilê mirov diqirriçand, dest nediket.

Exlaq û mîzaca bilind wenda bûbû, dilsozî û dilpakî di nav piraniya beşê xelkê de rabûbû. Bi kurtî exlaqekî pak di ferhenga beşer de nemabû û hatibû malîştin. Pîsîti û kêmtirkeremî di warê namûs de gihîştibû dereceyek wisan qet nehatibû dîtin. Her di eynî wextê de ji Îranê jî kom kom xelk bi pê kes û kusên xwe yên raqewirî ve hatin Silêmaniyê û ji van beşek heta demek din bikare bijî û ji bo jiyaneke nemir û nejtî, bi firotina laşê xwe, xwe îdare dikirin.

Ew kesên ne ji xelkê bajêran ên dewlemend bûn, weya îdareya jiyana wan di destê wan de nebû, yan jî ji wan kesan nebûn ku bikevin bazara bêşermiyê û kesp bi laşên xwe bikin, hêdî hêdî bi wêneyek wisan dilşewitî heliyan û di qelşên erdê de çûn xwarê ku mirov nikare heta hetayê tu carî jibîr bike...

Ji soranî: **ZIYA AVCI**

SÊ ŞÎR JI JAQUES PRÉVERT

STRAN

Em di kîjan rojê de ne
Em di hemû rojan de ne hevala min
Em di hemû jiyanan de ne evîna min
Em ji hevdu hez dikin û em dijîn
Em dijîn û em ji hevdu hez dikin
Û em nizanin jîyan çi ye
Û em nizanin roj çi ye
Û em nizanin hezkirin çi ye.

MESAJ


Ew deriyê ku hinekan vekir
Ew deriyê ku hinekan girt
Ew kursiya ku hinek li ser rûnişt
Ew psîka ku hinek pê şa bû
Ew fêkiyê ku hinekan gez kir
Ew nameya ku hinekan xwend
Ew kursiya ku hinekan qulupand
Ew deriyê ku hinekan vekir
Ew riya ku hinek tê de revîyan
Ew daristana ku hinek tê re derbas bûn
Ew çemên ku hinekan xwe avêtinê
Ew nexweşxana ku hinek lê mirin.

DI ŞEVEK PARÎSÊ DE

Sê darikên kibrîtê
Yek bi yek pê ketin
Di nava şevê de
Yek
Ji bo ku ez rûyê te bibînim
Ya duda
Ji bo çavên te
Ya dawiyê
Ji bo lêvên te
Û tariyek bêşînor
Ji bo ez
Van gişan bi bîr bînim
Û te biguvêşim
Di hemêza xwe de.

Ji frensî: **CAN GULŞENOGLU**

SEYRA GULÎSOR (2)



ŞEREFXAN CIZÎRÎ

Ew versiyona Mihemed Eliyê Kercosî bû. Heger ku mirov îcar Mihemed Eliyê Kercosî ji xwe re bike bingeh, wê gavê ferqa versiyona Mihemed Elî û Miradê Kinê zelal derdikeve pêşiya mirovan. Di versiyona Miradê Kinê de, hersê bira û Seyrê ne xuh û birê hevdu yên heq in. Diya Seyrê û yekî ji biran eynî ne, lê belê herdu birayên din diya wan cihê ye. Li gora Mirado biraye biçûk, Qor Qasim e lê ne Qor Silêman e. Ji ber vê yekê jî, di versiyona Mihemed Eliyê Kercosî de, germiya ku di nav hersê biran û Seyrê de heye, di versiyona Mirado de tune. Di versiyona Mirado de, tenê ev germî li ba Seyrê û Qor Qasim peyda dibe.

Mirado behsa Çiyayê Evdilezîzê, Şingalê, Golê Geniyan, Xirbê Xezalan, Şûva Reşan, Bîra Şerefdînê, Geliyê Dûdê, Geliyê Simoqê, Geliyê Kersê, Sînoqê Şemerî, Hiseynê Dobelên qet û qet nake. Li ba Mirado tenê Îskanê Gulxanê heye. Dîsa Mirado behsa serpêhatiyên Herdem Gozelê, Xan Dûndîrê, Şebabê Xortan û Eyûbê Kurmaxwarî jî nake. Serpêhatiya Eyûbê Kurmaxwarî ji hemû mirovên Rojhilat re diyar e, lê ma gelo ka serpêhatiyên Herdem Gozelê, Xan Dûndîrê û Şebabê Xortan çi pê hatiye? Gelo ew çi serpêhatî ne?

Li aliyê din Mirado, Seyrê nabe Şingalê û Çiyayê Evdilezîzê, ku ew ji bona Yezî-

diyan erda muqades e. Mirado, Seyrê û Eliyê Mamed dibe Keleha Comaniyê cem Îskanê Gulîxanê. Keleha Comaniyê jî li derdora deşta Xerzan e. Li vir jî ferqeke mezin di navbêna herdu versiyonan de heye.

Dîsa li ser reva Seyrê tiştên cur be cur têne gotin. Mihemed Eliyê Kercosî Seyrê dibe cem eşîra Şemera. Ev eşîr di navbêna Dicle û Ferat li bînya deşta Mêrdînê û Ruhayê de dijiyan. Wan gelek caran şer bi eşîrên kurdan re dikirin. Ew eşîreke Ereban î helî mezin î, naskirî û bi nav û deng bûn. Di nav wan û kurdan de hergav dijminayeti hebû...

Mirado Seyrê dibe serê Çiyayê Madiya. Li vê derê ew li nêçîrvanekî rast tê. Nêçîrvan çermê pezkoviyekî dide Seyrê, Seyrê çerm li xwe dike û diçe nava pezkoviyân. Bi wan re radibe, bi wan re diçêre, bi wan re radize û dibe yek ji wan. Ji ber wilo jî gelek caran Seyrê dibêje; "min bi koviya re razaye."

Li Çiyayê Madiya Seyrê demeke baş dimîne. Rojekê ew li bîniya çiya pêrgî feqayekî kurd dibe. Dêrdê xwe ji feqa re dibêje. Feqa kesekî îdealîst û xêrxwaz e, ne wekî meleyên ereban tolaz e. Dawa ramûsan li Seyrê nake. Wexta ku feqa ji bona qasidiyê berê xwe dide Welatê Hesenan û Heyderan, ew dibe weke ba û winda dibê. Ew pêşî riya xwe şaş dike. Dûra qevza xwe ya yekem davêje ba Herezo Tîlo Deriyê Kevera, qevza xwe ya duyem davêje derdora Rojhilatê Nisêbînê, li ba Dêra Çomera, qevza sisiyan jî feqa xwe digihîne welatê Hesenan û Heyderan...

Li gora Mirado Qor Qasim ku birayê Seyrê yê biçûk e, ew hezarûheftsed siwarê Hesenan û Heyderan bi xwe re kar dike û bi carakê re digirin ser Îskanê Gulîxanê li derdora Keleha Comaniyê. Li ba Mihemed Elî tenê hersê birayên Seyrê diçin ser Îskanê Gulîxanê. Dûra kuştina Îskanê Gulîxanê li ba Mihemed Eliyê Kercosî pir sivik, paqij û bêytî asaqan li dar dikeve. Li ser kuştina Îskanê Gulîxanê ferqeke mezin di navbêna herdu hunermendan de heye. Mirado Îskanê Gulîxanê, mitqal bi mitqal, bi tore û bi asaqan dide kuştin. Qor Qasim pêşî li derveyî Keleha Comaniyê konên xwe vedigire, dûra jî bangî Îskanê Gulîxanê dike, wî hûrik hûrik digire nava şitexaliyan. Îskanê Gulîxanê hayê wî ji bayê felekê nîne û di dawiya sohbeta xwe de, ewî Eliyê Mamed çawa kuştîye bi kêf û eşq behs dike. Lê belê ew nizane ku Eliyê Mamed û Qor Qasim pismamê hevdu ne! Piştî ku Îskanê Gulîxanê bi xwe bi xwe, li xwe mikur tê, Qor Qasim pêşî herdu destên wî girêdide, dûra wî bi paşîya hespê xwe ve vedike û tibabekî gêra sitiriyân pêdike. Çavekî wî bi saxî derdixîne, çermê piştê wîna diselixîne, destê wî bi saxî dişikîne. Dilê Qor Qasim bi vê yekê jî dîsa hênîk nabe, hema laşê Îskanê Gulîxanê dide ber xenceran, etfiyan û şûran. Di paşiyê de jî serê Îskanê Gulîxanê jêdike û weke serê pezekî dermale bi serê

rima xwe vedike. Kuştina bi asaq û tore, hilbet dixwaze ku tişteki derxîne pêşyan mirovan. Îskanê Gulîxanê ji bona kêfa xwe ya şexsî sîcekî pir mezin kiriye. Eliyê Mamed xort e, nuh xeta simbêlan rast kiriye û xeşim e, kuştina wî ya ku bi bêbextî li dar ketiye, tu caran ji aliyê exlaqên eşîran de nayê efûkirin. Bav û kalan gotiye; Xwîn bi xwîne tê şuştin. Sûc û ceze di civata kurdan ya eşîrî de, li gora vê piyvane dimeşiya. Xortekî ciwan di xewa şêrîn de, bi bêbextî hatiye kuştin. Nexasim Îskanê Gulîxanê ev xort di mala xwe de kuştîye. Dûra ew xort mevanê Îskanê Gulîxanê bi xwe ye. Ma mirov mêvanê xwe dîkuje?

Li ser van tiştan hemûyan, mirov dikare ji aliyekî din de, malbata Eliyê Mamed jî lê zêde bike. Eliyê Mamed jî malbateke axa û aristokrat e. Ji wan tê ku heyfa pismamê xwe hilînin. Ew heyfa xwe ji kesî re nahêlin. Qor Qasim eynî van gotinan dibêje; "em heyfa xwe ji kesî re nahêlin" Rêzana eşîrî bi hemû haweyî wilo bû. Ji xwe kesên ku desthilatdarê eşîran bûn jî, divabû ku ew heyfa xwe tu carî ji kesî re nehêlin. Heger wan heyfa xwe li erdê bihiştina, ewê desthilatdariya wan zû belav bibûya. Bi kurtî kuştina Eliyê Mamed, ne tenê kuştina xortekî nûhatî ye. Di şexsê Eliyê Mamed de, gelek nakokiyên civata eşîrî li Kurdistanê derdikevin pêş...

Ma gelo evîndariya Seyrê tenê evîndariya pismamê wê Eliyê Mamed e? Li gora dîtina min na. Heger mirov ji aliyê psîkolojîk de li bûyerê binêre, mirov ewê baş bibîne ku Seyrê ji aliyekî de evîndarê welatê Hesenan û Heyderan e jî. Seyrê di rastiya xwe ya psîkolojîk de, naxwaze ku welatê Hesenan û Heyderan terk bike. Çawa zarok naxwazin ji dê û bavên xwe cihê bibin, Seyrê jî naxwaze ku ji welatê xwe cihê bibe. Seyrê li ser fikra welatê navçeyî difikire û ew navçe jî warê eşîra wê ye. Ji loma jî ew naxwaze ku wê bidin begên Farqînê. Welatê Farqînê ji bona Seyrê cihê biyanî bû. Seyrê dibêje ku Eliyê Mamed çilo û çawa be jî, ew ji begên Farqînê ferztir e. Roja bûyerên giran ewê Eliyê Mamed stûneke hesinî be û li pişt birayên min be, dibêje. Baş e, lê ma Seyrê ji ku dizane ku ewê begên Farqînê li pişt birayên wê nesekinin? Di rastiya xwe de ewê pişt birayên wê bi hîlbijartina begên Farqînê re, hîna jî xurtir bibûya. Mirovantiya malbata Seyrê û begên Farqînê ewê her du alî jî hîna xurtir kiribana. Ji xwe Eliyê Mamed pismamê birayên Seyrê bû û çilo ba jî ewê li pişt wan bisekîniya. Weke ku hate gotin; Eliyê Mamed ne maldar û ne jî xwedî nîfîz bû. Bûyerê bi vî haweyî gotin di bingehên xwe de, daxwaziyên Seyrê ku dixwest yekbûna welat û mirovên wê xerab nebe, dianî ziman. Seyrê û welarê xwe yek in, ew û mirovên xwe yek in, bi hîlbijartina Eliyê Mamed, Seyrê dixwaze vê yekîtiyê biparêze. Hilbijartina Eliyê Mamed, di rastiya xwe de hîlbijartina mirov û welatê Seyrê bi xwe ye.

Di epopa Seyrê de rastiyeke din î sosyal heye. Civata kurdan ya eşîrî, ji heyamên kevnare de pir qiymet didane bextê mirovan. Qiymeta mirovan, eşîran, malbatan li gora bextê wan dihate pîvan. Kesê ku xwedî bext bûn, kesên ku ji aliyê exlaqî de, li civatê weke mînaka baş dihate pêşkêşkirin. Wexta ku mirovan xwe diavêtin tor û bextên kesan, malbatan yan jî hemû eşîran, divabû ku mirov wî çaxî hemû sempaîf û antîpatiya xwe, danîbûya aliyekî. Kes, malbat û eşîrên xwedî bext, çi bibûya bila bibûya, ew divabûn bextê ku dane biparêzin. Bextparaztin xweparaztin bû. Bext ewlekarî bû, soza sosyal bû, li xwe xwedî derketin bû, nav û dengê xwe paraztin bû. Ji bo vê yekê jî gelek kes dihatin kuştin, gelek mal dihatin şewitandin, gelek kes koçber dibûn, lê belê bextê xwe jî xerab nedikirin. Di civatê de bext nasnameya sosyal û îdeolojîk bû. Ma îro jî civata kurdan ne hewcedarê bextekî mirovanî ye?

Wexte ku Îskanê Gulîxanê bextê xwe xerab dike, têkiliyên eşîrî jî serobino dibin. Civata kurdên Yezîdî ku di warê bext de deng dabûn, bi kirinên Îskanê Gulîxanê re, stûna xwe ya exlaqî û helî xurt li vir winda dike. Tolazî û doxînsistiya Îskanê Gulîxanê, di bûyera Seyrê de dikeve pêşiya ku mezînekî kurdên Yezîdiyan şerefa xwe, weke ya hav û kalê xwe biparêze. Şerefa kurdê Yezîdî bextê wî bû. Wexta ku wî bextê xwe xerab kir, wê gavê şeref jî pê re namîne. Di vir de Îskanê Gulîxanê ezîtiya xwe dixwe pêşiya normên exlaqî. Zewqa ezîtiya Îskanê Gulîxanê dikeve şûna namûsa civatê û pîvanên meşrû. Weke ku tê zanîn, wextê ku bext li nava civatê tunebe, wê gavê anarşî û tevlihevî derdikeve pêş. Kesên xurt dikarin hemû tiştên xwe, di kesên zêf û hewcedarê alîkariyê de bikin. Wê çaxê zor dibe dermanê hemû derdan. Heq li civatê namîne. Hêza tazî û rût dikeve şûna mirovatiyê û exlaqê paqij. Di civatên wilo de, kî xurt be, ew hemû miramên xwe bi cih tînin. Civata ku bi wî hawayî jî bimeşe, ev civat sosyalîtê û meşrûtiyeta xwe winda dike. Ew wê gavê ne civat e, ew dibe weke keriyekî teban. Li vê derê ferqa mirovan û tebayan ji hevdu namîne. Civat, medeniyeta xwe û mirovantiya xwe diavêje nava lingan. Ma li ba tebayan medeniyet heye? Hilbet na. Lê Îskanê Gulîxanê di bûyera Seyrê de, bûye weke tebayekî hov û xwe diavêje ser nêçîra xwe. Ji ber vê yekê jî wexta ku asaq û tore li ser serê Îskanê Gulîxanê têne kirin, kesên guhdar bi xwe nexweş nayînin. Gelek kes dibêjin; ew heqê wî bû! Bi kurtasî li vir çalakiyên bê exlaqî têne mah-kûmkirin û bi vî hawayî jî referensên civatê yên paqij derdikevin pêş. Bi wî hawayî jî meşrûtiyet li civatê tê paraztin û kêfiyet jî tê ricimandin. Ji xwe îdeolojiya mirovan jî, di dîroka mirovan de wilo zelal dibe.

Di epopa Seyra Gulîsor de pêwendiyên dînî, di navbêna kurdên Musliman û kurdên Yezîdî de roleke sereke dileyizin. Di versiyona Miradê Kinê de, Yezîdiyên

baş li derdora Îskanê Gulîxanê peyde nabin, hemû kes kirinên Îskanê Gulîxanê bi bêdengî dipejirînin. Di versiyona Mihemed Eliyê Kercosî de, li miqabilî xerabiyên Îskanê Gulîxanê, qencyên Hiseynê Dobelên derdikevin pêşiyê. Di rastiya bûyerê de, Hiseynê Dobelên weke bav û kalê xwe yî Yezîdî tevger dike. Yezîdiyê rast Hiseynê Dobelênê û Yezîdiyê sexte jî Îskanê Gulîxanê ye. Îskanê Gulîxanê li gora şerefa bav û kalê xwe tevger nake. Nefsa wî li vir zora exlaqê wî dibe.

Dîsa li ba kurdên musliman dîtin, fikir û helwest li ser rolên melan têne ziman. Mihemed Eliyê Kercosî qerfên xwe bi mela dike, wana li gora kirinên wan biçûk dike, bê bext û tolaz nîşan dide. Li gora îdeolojiya îslamî kesên mela, ji ber ku ew xwenda û zanyar in, gelek caran têne îdealîzekirin. Mela temsîlkarê dînê xwe ne. Divê ew li gora kitêb û îdeolojiya xwe tevger bikin, lê mirov di praktîkê de dibîne ku mela jî dikarin tolaz, bêbext û sextekar bin. Mihemed Elî vê yekê baş dineqîştine û bi vî hawayî jî kirinên melan bi şiklê komedî derdixîne pêşiya guhdaran.

Hilber li ser epopa Seyra Gulîsor tiştên sosyal, dînî, îdeolojîkî, civatî û di derheqa avaniya civata kurdên eşîrî de, li ser gelek hawayên danûstandinan, normên exlaqî û îdeolojiya eşîrtî, hîna jî pir tişt dikarin werin nivîsandin. Ev di vê nivîsarê de îca ne pêwîst e. Lê tişteki dîn heye ku bala min pir dikişîne; Epopa Seyra Gulîsor tenê li derdora Mêrdînê, Beriya Mêrdînê, Biniya xetê, Torê, Omeriyan û li derdora Batmanê tê naskirin. Li gora îmkanên xwe min hinek lêkolîn kirin; her çiqasî Seyrê û Eliyê Mamed Serhedî jî bin, kesên Serhedî vê epopa hanê nasnedikirin. Min ji kesên ku jî malbata axayê Hesenan bûn jî pirsî, dîsa hayê kesî ji bûyera Seyrê û Eliyê Mamed tunebû. Min ji vê rastiye ev netîce derxist; Epop jî hêla dengbêjên derdora Mêrdînê ve hatiye afirandin. Wextê ku Seyrê û pîsmamê xwe derbasî nava Yezîdîyan dibûn, ew bi ihtîmalek pir mezin di derdora Mêrdînê re derbas dibin. Ji ber ku herema Mêrdînê, Şingalê û Çiyayê Evdilezîzê nêzikî hevdu ne, bûyer bi taybetî li vir deng dide û hunermend jî li vê herêmê li ser bûyerê hûr û kûr dibin. Mirov dikare bêje ku Epopa Seyrê hemû ne tenê ji hêla hunermendekî ve hatiye afirandin. Di destpêka afirandinê de, Seyrê ji aliyê hunerî de, belkî ne zêde li ser hevdu bû. Bi sedsalan hunermendên cur be cur tişt li vê bûyerê zêde kirine, detay zelal kirine û avaniya xwe kemilandine. Her hunermendî li gora jêhatbûna xwe perçayek, çarînek, mînakek, awazek, gotinek, warek, darek li Seyrê zêde kirine. Avaniya Epopa Seyrê di bîngeha xwe de hergav weke xwe maye, lê belê her hunermendekî bi jêhatbûna xwe jî, ew avaniya hanê li gora hunermendiya xwe xemilandiye. Di bîngehe Epopa Seyrê de hunermendan nikarîbûn li gora daxwaziyên xwe bixebitin, lê di xemilandina avaniyê de, heta ku hunermendan bixwesta azadî hebû. Ji ber ku ver-

siyonekî nivîsandî heta niha tunebûye, kê li ku çawa Seyrê bigota, wê bêhnîkê Seyrê dibû ew versiyona ku berbiçav li cihêkî dihate gotin. Seyrê bi hemû haweyî berhemeke kollektîf bû. Her hunermendekî jêhatî, hinek tiştên balkêş li Epopa Seyra Gulîsor zêde dikirin. Avaniya Seyrê hergav ne di cihê xwe de dima, ew di cihê xwe de qet ne disekinî, lê belê ew li ser pişra hunermendan, geh bi darê kemançê re geh bi têla tenbûrê re, li gelek warên welatê kurdan digeriya. Li gora rewşê, cih, guhdaran û ruhiyeta hunermendan Seyrê, ya li avaniya xwe hinek tişt zêde dikirin, yan jî li avaniya xwe hinek tişt kêr dikirin. Wekî jêhatbûna hunermendan, Seyrê jî bi xwe, dikarîbû hergav were guherandin. Di vê tevgerandê de hunermend xwediyê azadiyeke pir xurt bûn.

Di edebiyata devkî ya gelê kurd de, hunermendekî karîbû wekî mejiyê kompûtirê bi ziravî, bi mantiqî, bi hosteyî bûyeran, cihan, navan, waran bi dûv hevdu ve rêz bikin. Di konteksta edebiyata devkî ya gelê kurd de, perfektşonîzmeke (kamilbûneke) hunerî hebû. Hunermendên edebiyata devkî hostên gotinan bûn, lê belê ne tenê ketûber gotin, komkirina gotinên vala û pûç ne karê wan bû. Gotinên wan divabû gotinên di cihê xwe de bana. Di bin her gotinekê de, bi sedan mana hebûn. Ji lîstikan bi gotinan û ji gotinên çêkirî, wana herdem xwe dûr digirtin. Hunerê ji bona xelkê divabû xwe li gora kapasîta entellektueliya xelkê, xwe ji nû de tekûz kiribana. Huner ji bona xelkê bû, derd û kulê xelkê dianîn ziman û ew, ji nava kûraniya xelkê jî derketibû. Hunermendan nikarîbûn quretiyê li xelkê xwe bikin, xwe di ser serê xelkê re bibînin û xwe ji cîhanê din bihesibînin. Huner çawa ji nava xelkê derketibû, divabû ew wilo jî li kaniya xwe vegeriya. □

NAVNIŞANA PIÇÛK

Li ber çî derî, çî navnişanê rawestiyam
Şûşak xwîn xwestin ji dil
du piyale rih ji kaniya pêşîran
û tasek ji şeraba namûsê.

Lê

ku min go yek misqalê nadim ji xwe,
navnişan enirîn,
kepir
gêdûk,
civiyan li riya min
navnişanên mezin çûn, wenda bûn.
Niha çivîkekî bênavnişan im ez
li pey navnişana piçûk,
min rî spî kir
wê pahnî dûz kir.

Min li sînoran xist,
da bi guliyên navnişana piçûk bigirim,
lê sozdarên xelkê bûn,
ta wê navnişana kulek.
Qurûs bûm guhanê kaniya azadiyê
kanî, ji tîna herifî
û niha,
ji kaviîlên kaniyê
rimilkê vedixum ez.

H. KOVAN BAQÎ

PIRSÊN YEZDAN



YEZDAN Û NÜDEM bi hev re mezin dibin. Yezdan di çarsaliya xwe de digel hejmarê Nûdemê ya 16an

Yezdan û Nûdem bi hev re çêbûne, herdu jî di adara 1992an de hatine dinyayê. Ger Yezdan keçik bûya, wê navê wê "Nûdem" bûya. Me haziriya xwe welê kiribû. Niha, Yezdan û Nûdem bi hev re mezin dibin. Wê Yezdan di sala 1999an de dest bi dibistanê bike. Lê ew ji niha ve xwe hînî xwendina navan dike. Berî navê xwe, ew hînî xwendina navê NÜDEMê bû. Ji ber ku ew bi Nûdemê re mezin bû. Ji roja ku ew hatiye dinyayê, navê Nûdemê ji malê xalî nebûye, ji navê wî bêtir hatiye zimên, ji navê wî bêtir li ser hatiye peyvandin. Ev yek jî bûye sebeba ku ew carinan ji Nûdemê aciz bibe. Wî carinan bi çavê xwişkekê li Nûdemê nihêriye û gava

dîtiye ku ez ji wî bêtir bi xwişka wî dadikevim, ew ji min jî aciz bûye. Ew dizane ger ne ji Nûdemê bûya ez ê hê bêtir bi wî daketima, min ê bi wî re bi topê bileyista, ez ê bi wî re têketima avê, min ê bi wî re henek bikira, min ê ew hê bêtir hînî tiştan bikira; an jî ya herî girîng, ku armanca van çend rêzan jî ew e, min ê bersivên pirsên wî bi bêhnfirehî bidana.

Pirsên Yezdan, gelek caran bi min pir zehmet dihatin, dikirin ku ez ansîklopedî û pirtûkên taybetî peyda bikim û li bersivên rast bigerim. Bo nimûne, wî dipirsî:

- Bavo, çima dînazor ji dinyayê qeliyane?
- Bavo, mij çawan çêdibe?
- Bavo, çima insan nikarin bifirin?
- Bavo, baran çawan dibare?

Û bi hezaran pirsên astronomî, xwezayî, felsefî, dînî û hwd. dipirsî. Gava min bersiv dida, wî pirseke din jî ji bersivê derdixist û cih li min teng dikir. Hingê ger diya wî bi me re bûya, min ew dispart diya wî, wê jî jê re ta bi derzî vedikir.

Lê di nava pirsên Yezdan de, pirsin gelekî zehmet hebûn ku min bersiva wan dida jî, bersivê Yezdan têr nedikir. Wî her digot: "Çima?"

Niha bi destûra we be, ez dixwazim çend pirsên Yezdan li vir binivîstînim.

*

Yezdan çarsalî bû. Ez, ew û diya wî em rûniştibûn û me li MED-TVyê temaşe dikir. Piştî programeke bi kurdî yeke bi tirkî dest pê kir. Yezdan ji min pirsî:

– Bavo, çima di televizyonên tirkî de bi kurdî tune, lê di televizyona kurdan de bi tirkî heye?

*

Rojekê, Yezdan ji xwe re dîleyist. Di MED-TVyê de programeke zarokan hebû. Zarokan distiran "Welatê me Kurdistan e". Yezdan ji min pirsî:

– Bavo, ger welatê me Kurdistan be, çima em mala xwe nabin Kurdistanê?

*

Rojekê ez, Yezdan û diya wî em derketibûn sûkê. Wê rojê sûk pir şên bû. Bi hince-teke taybetî alên biçûk yê gelek welatan bi benekî ji aliyekî avêtibûn aliyê din yê

sûkê. Min û diya wî me bi destê wî giribû û em di bin alan re derbas dibûn. Yezdan serê xwe hildabû jor û li alan dinihêrî. Gava em derbasî aliyê din bûn, Yezdan pirsî:

– Bavo, min ala kurdî nedît, çima ala kurdî di nav van alan de tune?

*

Êvarekê em rûniştibûn û me li nûçeyên kanaleke tirkî temaşe dikir. Di nav nûçeyan de sehneyek derket ku polîsan bi xezeb li xelkê didan. Yezdan ji diya xwe pirsî:

– Mama, çima polîs wilo li xelkê dixin?

Diya wî lê vegerand:

– Ji ber ku ew dibêjin "em kurd in" polîs li wan dixin.

Yezdan hebekî fikirî, paşê got:

– Ger ew nebêjin "em kurd in" ma wê dîsan polîs li wan xin?

*

Ez êvarekê bi niv qedeh vodka ya sade rûniştibûm û min bêhna xwe berdida. Gava min çend qurt vexwarin, ji ber serbûna vodka yê min madê xwe ne xweş kir.

Yezdan ji min pirsî:

– Tu çima wilo madê xwe ne xweş dikî, bavo?

– Ji ber ku vodka giran e, ne xweş e...

– Ger ne xweş be, tu çima vedixwî?...

*

Yezdan bi diya xwe re çûbû welêt. Rojekê kalikê wî (bavê min) Quranê dixwîne. Yezdan fêhm dike ku kalikê wî ne bi kurdî dixwîne. Loma ji kalikê xwe dipirse:

– Kalko, ma tu bi kîjan zimana dixwînî?

Kalikê wî lê vedigerîne:

– Bi erebî.

– Ma tu bi erebî dizanî?

– Na.

– Wê çaxê tu çima dixwînî?...

F. CEWERÎ

ROHAT ALAKOM: "Armanca Xoybûnê avakirina Kurdistaneke serbixwe bû"


Rohat Alakom yek ji lêkolînerên kurd e ku heta niha di warên cihê de bi zimanên cihê nêzîkî deh berheman nivîsandiye. Vê havînê jî pirtûkeke wî ya nû "Hoybûn örgütü ve Agrı ayaklanması" li Stenbolê di nava weşanên Avestayê de derket. Ev pirtûka ku li ser tevgera Xoybûnê ye, her aliyên tevgera Xoybûnê bi perspektîveke lêkolîneriya ilmî bi me dide naskirin û aliyên vê tevgerê yên heta niha weşartî jî eşkere dike.

Bi hinceta vê pirtûka nû, me bi Rohat Alakom re li ser tevgera Xoybûnê û naveroka pirtûkê sohbetek kir.


NÜDEM: *Çima ne rêxistineke din, lê Xoybûnê bala te kişand?*

ROHAT ALAKOM: Angorî rêxistinên kurdan yên mayîn de derbarê Xoybûnê de kêmtir dihatin zanîn. Ev rêxistina di sala 1927an de saz bibû, min mîzê kir ku di ser sazûna vê rêxistinê re 70 sal derbas bûne. Di dawiyê de min biryar da ku bi minasebeta 70 saliya sazûna Xoybûnê tiştêkî binivîsim û di kovareke kurdî de biweşînim. Di vê navberê de ji ber munasebeta 70 saliya sazûna Xoybûnê jî aliyê *Malbenda Çanda Kurdî* li Londonê semînerêk bi navê *Di Dîroka Kurdî de Cihê Xoybûnê* roja 19. 10. 1997 hatibû amade kirin, wek gotarvan gazî min kirin û li ser vê babetê min semînerêk pêşkêş kir. Piştî vê semînerê xebata min ya li ser Xoybûnê berdewam kir û di dawiyê de ev pirtûka derkete holê û piştî salekê di nav weşanên *Avestayê* de li Stenbolê der çû. Di pirtûkê de çend wêne û sûretên ku kêmtir belav bûne jî cih girtine. Ji aliyê din çend dokumentên dîrokî di dawiyê pirtûkê hene. Ez hêvî dikim ku ev materiyal û malzeme bi kêrî xwendevanan bîn û derbera dîroka Xoybûnê de ji wan re alîkar bibe.

– Di amadekirina vê xebatê de çi zehmetî û dijwartî derketin pêşberî te?




Rohat Alakom



Bergê pirtûkê yê pêşî

– Dema min li ser Xoybûnê ev xebata amade dikir, zêdetir bala min li ser avakar û hîmdarê vê rêxistinê yên pêşîn bûn. Gelo ew kesên ku ev rêxistina cara pêşîn saz kiribûn, kî bûn? Xoybûn li kîderê û çî tarîxê de hatibû saz kirin? Serokê wê kî bû û di nav van bîst salan de çî li serê vê rêxistinê re derbas bibû? Çawa hûn jî dizanin, derbarê rêxistineke weşartî û nelegal de peydakirina van zaniyarî û agahdariyan gelek dijwar e û bersivdayina van pirsan jî ne hêsa ye. Hemû derf li mirov tên girtinê. Di rewşeke waha de mirov dikare çî bike? Dema mirov ji tiştên ku tên zanîn ber bi tiştên nayên zanîn gavên xwe davêje, li pêşberî mirovan bergeh û dergêhên nû vedibin. Min jî wisan kir û di dawiyê de derbarê Xoybûnê de çend dokument û zaniyariyên gelek kêrdar derketin holê. Dokumenta here giring rêbaz û destûra (nîzamnâme) Xoybûnê bû. Di dawiyê de hevalekî ew rêbaz û destûra Xoybûnê bi dest xist û ji min re şand. Bi zimanê Osmanî hatibû amade kirin, dostekî mayîn ew veguharte tîpên latînî. Qasî 34 xalên vê nîzamnâme yê dihatin xwendin. Gelek sal derbas bûbûn, ev dokumenta jî kevn bibû. Rêbaz û destûra Xoybûnê di sala 1928an de hatibû weşandin. Çend cihên wê nedihatine xwendin. Lê belê xalên giring yên rêbaz û destûra Xoybûnê dihatin xwendin. Dokumenteke mayîn ya giring dokumenteke fransî ye, di vê dokumentekê de şubeyên (temsîlkarî) Xoybûnê û endamên wan yek bi yek hatine rêz kirin û navên gelek kesan tên pêşkêş kirin. Bi saya vê dokumentê mirov fêr dibe ku Xoybûn him li hundirê welêt, him jî li derwayî welêt ge-

lek şax û şubeyên xwe saz kirine. Derbarê hîmdar, endam û hevalbendên Xoybûnê de çend dokumentên Fransî û Îngîlîzî yên mayîn jî di arşivên diplomatîk de hatin dîtin. Dokumenteke mayîn jî Peymana kurdan û ermeniyana e. Çawa tê zanîn di sala 1927an de di navbera rêxistinên Taşnak û Xoybûnê de peymaneke dostanetî û piştgirtiyê tê îmze kirin. Ev peyman ji 19 xalan pêk hatiya. Di binê peymanê de îmzeyên nûnerê Taşnakan, Vahan Papazyan û navên heşt endamên Xoybûnê hene.



Bergê pêşîn yê Nizamnameya Xoybûnê

– Bi saya vê dokumenta dawîn navên çend danêr û hîmdarên Xoybûnê jî derketin holê, ne wisa?

– Belê wisa e. Bi saya vê dokumentê bi kêmanî em jî navên heşt endamên Xoybûnê yên komîta merkezî agahdar dibin. Ev dokumenta dîrokî di dawiya pirtûkê de bi temamî hatiye weşandin. Ew navên endamên komîta merkezî ya Xoybûnê ku di dawiya vê peymanê de hene, ev kes in:




Ji çepê ber bi rastê: Qedrf Can, Memduh Selim, Haco Axa û M. Eli Şexmûs (Ji arşîva Omer Şexmûs)


1. Mehmed Şukrî Sekban
2. Celadet Bedir-Xan
3. Memduh Selim
4. Haco Axa
5. Emînê Perîxanê (Emînê Ehmed, Emînê Ramanî)
6. Elî Riza
7. Mistefa Şahîn
8. Kerim Ristem Beg

Di dokumenteke ingilîzî de (30/8.1928) navên çend endamên Xoybûnê hatine rêz kirin ku eynî nav di lîsta jorîn de jî hene:

1. Memduh Selim
2. Celadet Bedir-Xan
3. Haco Axa
4. Emînê Perîxanê
5. Mistefa Berazî (wisan jî Mistefa Şahîn tê nasîn)
6. Şûkrî Sekban



Temsilkarê rékxistina taşnakan: Vahan Papazyan



Serokê Xoybûnê: Celadet Alî Bedir-Xan

Gelo komîta merkezî ya Xoybûnê tenê ji van kesan pêk hatiye? Di vî warî de çavkanîke mayîn jî bîranînên Ehmedê Abdurehman Axa ye. Ev şexsiyetê kurd di bîranînên xwe de dibêje ku ew bi xwe di kongra pêşîn ya Xoybûnê de beşdar bûye û di beşeke bîranînên xwe de navên wan kesên ku cara pêşîn hatine hilbijartin jî rêz dike. Angorî wî, van 13 kesan di komîta pêşîn ya Xoybûnê de cih girtine:

1. Celadet Bedir-Xan
2. Elî Riza
3. Memduh Selîm
4. Mehmed Şukrî Sekban
5. Fehmî Beg
6. Kamûl Efendî
7. Kerîm Efendî
8. Tewfîq Efendî
9. Haco Axa
10. Emînê Perîxanê
11. Bedrettin Beg
12. Bozan Şahîn
13. Mistefa Şahîn

Ew navên ku di dokumentên jorîn de hene çawa tê dîtin di vê listeyê de jî cih girtine. Bi vî tehrî ev hersê dokument hev rast derdixin û hev temam dikin. Mihemedê Mele Ehmed jî di lêkolîna xwe ya li ser Xoybûnê de van navan rêz dike û wek danderên Xoybûnê nîşan dide. Ev xebata ku di sala 1993yan de li Suriyê hatiye weşandin, li ser Xoybûnê wek xebateke pêşîn dikare bê hesabîn. Mihemedê Mele Ehmed bi taybetî bîranînen Ehmedê Abdurehman Axa di xebata xwe de bi kar anîne û ji xwe re bingeh girtiye. Ev bîranînan di rojnameya Armancê de beş-beş (no:91/1989) hatibûne weşandin. Ez bawer dikim ku ev bîranînan wek pirtûk nehatine weşandin. Ehmedê Abdurehman Axa di kongra pêşîn ya Xoybûnê de beşdar bûye.

– *Gelo serokê Xoybûnê kî bû?*

– Hemû dokumentên ku me di ber çavan re derbas kirine, nîşan didin ku ji sala 1927an heta sala 1932an serokatiya Xoybûnê Celadet Bedir-Xan kiriye. Lêkolînerên wek Bazil Nikitin, E.G. Elphinston, Erhart Franz, Nazmi Sevgen di berhemên xwe de Celadet Bedir-Xan wek serokê Xoybûnê nîşan didin. Celadet di dema xwe de kesekî bi kapasîte bûye. Derbarê jiyana Celadet Bedir-Xan de hin zaniyariyên fi-reh di xebata Konê Reş de cih girtine. Ev xebata cara pêşîn di sala 1992an de bi navê Celadet Bedir-Xan -Jiyan û Ramanên Wî bi erebî, di sala 1997an de bi zimanê Kurdî hate weşandin. Berî ku Xoybûnê belav bibe, serokê Xoybûnê Dr. Nafiz Beg bûye.

– *Navê Kamiran Bedir-Xan wek hîmdar di van dokumentên jorîn de derbas nabe, gelo çima?*

– Belê, vê yekê gelek bala min jî kişand. Di çend cihan de tê nivîsîn ku Kamiran Bedir-Xan yek ji hîmdarên Xoybûnê ye. Lê belê çawa hûn jî dibînin di van dokumentên jorîn de navê wî derbas nabe. Ev yeka tê wê maneyê ku ew di kongra pêşîn de nehatiye hîlbijartin û ne berendam bûye. Mîmkun e ku di kongreke mayîn de, ya duwemîn, sêwemîn de hatibe hîlbijartin û ketibe nav komîta merkezî ya Xoybûnê. Dema em berberî û dijayetiyan nav Xoybûnê analiz dikin, navê Kamiran Bedir-Xan derdikeve pêşberî me. Di hin çavkaniyan de wek berpirsiyarê malî yê Xoybûnê tê pêşkêş kirin. Kamiran Bedir-Xan temsîlkariya Xoybûnê ya Libnanê hildabû ser milên xwe û li wir jî dima.

– *Wek tu jî dizanî di derbarê dîrok û cihê sazûna Xoybûnê de çend dîtinên cihê hene. Gelo di warê tespîtîkirina van babetan de tu gihîşt hin enceman?*

– Derbarê vê babetê de him di çavkaniyên kurdî de him di çavkaniyên biyanî de çend zaniyariyên ji hev cuda tên pêşkêş kirin. Xoybûn rêxistineke veşartî û binerdîn bû. Her çalakiyên wê êşkere nîn bû. Ji ber vê yekê jî sazkirina wê di merc û hoyên gelek veşartî de pêk hatibû. Xoybûn mecbûr bû ku xwe biparêza. Derbarê cihê sazkirina Xoybûnê de em rastî çend îfadeyên cihê tên, wek mîsal: "Li serê çiyakî Kurdistanê", "li welatekî biyanî" û "li welatekî dîr" ...Derbarê tarîxa sazkirina Xoybûnê de jî nezelalî û tevlihevîke wisan di çavkaniyan de heye, wek mîsal hin çavkanî dibêjin ku Xoybûn di havina sala 1927an, hin jî dibêjin payîza sala 1927an hatiye saz kirin. Di vî warî de çavkaniya here bingehîn bêguman destûra Xoybûnê ye ku di sala 1928an de hatiye weşandin. Angorî xala yekemîn ya destûrê, biryarê sazkirina Xoybûn di civîna Xoybûnê ya roja 5/10 1927an de hatiye girtin. Ev yeka tê wê maneyê ku Xoybûn di eynî tarîxê de hatiye saz kirin. Gelo Xoybûn li kîderê hatiye saz kirin? Derbarê vê yekê de jî piraniya çavkaniyan didin kivşê ku kongra yekemîn ya sazkirina Xoybûnê li bajarê Bhemdun li Libnanê di mala keşîşê Ermeni Vahan Papazyan de pêk hatiye. Ehmedê Abdurehman Axa ku di vê kongra pêşîn de beşdar bûye, ew jî dide diyarkirin ku kongra pêşîn di mala Vahan Papazyan de pêk hatiye û wan di vê civînê de hev dîtine.

– *Armanca Xoybûnê çi bû?*

– Armanca Xoybûnê ya yekemîn û bingehîn li ser erdê Kurdistana Tirkîyê avakirina Kurdistaneke serbixwe bû. Ji bo xelasbûna perçên Kurdistanê yên mayîn Xoybûnê tu armanc nedabû pêşiya xwe. Xoybûnê li dora sînorê Îran û Tirkîyê alîkarî û piştgirtiya tevgera Araratê dikir. Li dijî Tirkîyê wek hevalbendekî li Îranê dinêrî. Ji ber vê rewşa taybetî Xoybûnê giringîke mezin dida dostanetiya Kurdistan û Îranê. Problema kurdên Îranê jî ber sedemên taktîkî ne problemeke rojane û ecele bû.

Ji bo ku bigihêje vê armanca xwe, Xoybûnê gelek metodên tekoşînê yên ji hev cuda bi kar dianî, wek mîsal di xala 17an ya destûra wê de tiştêkî gelek balkêş cih girtiye. Angorî vê xalê propaganda divê him devkî him nivîskî bê çêkirin. Di warê propaganda devkî de miftî û derwêş divê stran, qasîde û çîrokên kurdî di nav gel de belav bikin û bi vî tehrî zordariya Tirkîyê nîşan bidin. Ev cara pêşîn ku rêxistineke kurd folklor û edebiyatê di warê hişyarbûna neteweyî de wek çekêkê bi kar tîne û vê yekê di destûra xwe de bi cih dike. Ev aliyê Xoybûnê gelek giring e.

– *Li ser peyva Xoybûnê analîzeke fireh di pirtûka te de cih girtiye. Bi baweriya te ev peyv tê çi maneyê?*

– Ev peyva peyveke gelekî balkêş e. Bi taybetî çîroka peyva xo bala mirovan dikêş-ne. Ne tenê ev peyva, saziya peyvê jî balkêş e. Ji ber van balkêşiyên min xwest li ser vê gotinê çend dîtînan xwe diyar bikim. Ev dîtînan çend dîtînan zimanzanîyê ne. Min bi çavêkî hûr hinekî bingehe û peyvê analîz kir û gihîştim çend encaman. Di gelek çavkaniyan de hatiye nivîsîn ku Xoybûn tê maneya "serxwebûn"ê û niha jî carcar hin kes wisan dibêjin. Lê belê îro Xoybûn ne di zimanê devkî de, ne jî di zimanê nivîskî de bi vê maneyê tê bi kar anîn. Di ferhengên kurdî de jî em rastî vê peyvê nayên, wek mîsal mirov nikare bêje: Partiya Keskan ji bo Xoybûna Kurdistanê şer dike. Di zimanê kurdî di zaravê kurmançî de bi piranî peyva serxwebûn tê bi kar anîn. Peyva Xoybûn di wan salan de jî bi vê maneyê zêde nehatiye bi kar anîn. Dema mirov weşanên wan salan raçav dike, tenê mirov wek navê rêxistinekê rastî vê peyvê tê. Mirov bi kurtî dikare bêje ku maneya wê her çûye teng bûye û tenê bûye navekî rêxistinekê. Ji ber vê balkêşiya wê, di gelek çavkaniyan de hin nivîskar, bi vê peyvê dilîzin! hewl didin ku vê peyvê hinekî cuda binivîsin, piçekî modernîze bikin, nêzikî peyva serxwebûnê bikin, peyvê jîndar bikin wek xweybûn, xweybûn, xwebûn, xwêbûn... Ez bawer dikim ku ew nivîskarên kurd bi çavêkî "etimologiya populer" careke din dixwazin û peyvê jîndar bikin û bixine ferhengên kurdî. Çawa em dibînin ku hîsên welatparaziyê di vê rewşê de giran dikêşin. Lê belê ziman û zor qet ji hev hez nakin. Mirov divê bizanibe ku di her zimanekî jî qayîdeyên trafîkê hene. Ji aliyê din çîroka peyva Xoybûn nîşan dide ku civat û ziman gelekî serhev tesîr dikin û gelek pêwendî di navbera civat û ziman de hene. Sosyologiya ziman tenê van pêwendîyan analîz dike.

Me li jor jî got peyva Xoybûn û bi taybetî jî peyva *xo*-gelek balkêş e. Ev peyva di zaravê kurmançî de wek *xwe* tê gotin û nivîsîn, di zaravê soranî de *xo* tê gotin. Eger em wisan qebûl bikin, tê wê maneyê ku ev pêşneyar ji aliyê kesekî an jî kesine soranî diaxifin de hatiye pêşneyaz kirin. Lê belê dîsa jî hîlbijartineke baş nehatiye kirin. Ji ber ku di vî zaravê kurdî de ji bo serxwebûnê *serbexoyî* tê bi kar anîn. Ji aliyê din gelo dengê -y - ji ku tê? Dema mirov dibêje *xo+y-bûn*. Herdu zaravên kurdî de peyveke wek *xoy*- qasî ku em pê dizanin, tune. Di rewşeke waha de balkêşiya peyva Xoybûnê zêdetir dibe. Ji ber vê balkêşiyê ye ku hin lêkolînerên tirk bi zanetî dibêjin ku ev peyv, peyveke niv ermenî û niv kurdî ye. Dîsa ew dibêjin ku di zimanê ermenî de cîhê *welat* peyva *hay* tê bi kar anîn, wek *hay+astan* ango Ermenistan. Ew bi vê dîtînanê dixwazin bêjin ku Xoybûn ne tenê rêxistine kurdan e, ermenî û kurdan ev rêxistina tev saz kirine û xwestine ku Tirkiyê perçe bikin! Bi rastî di navbera peyvên *xoy* û *hay* de nêzikbûn û şibandineke nêzik heye. Lê belê ez bawer nakim ku di dema navdayinê de hesabekî wisan kûr hatibe kirin. Ji ber ku li ser hemû weşan û materyalên

Xoybûnê, Xoybûn wek rêxistineke kurd hatiye nasnadin û pêşkêş kirin. Belê rast e, Xoybûnê wek rêxistin ji bo Kurdistanê serbixwe tekoşîn dida, ev daxwazêke polîtîkû. Lê belê Xoybûnê di dokumentan de û li ser kaxiz wek rêxistineke serxwebûnê xwe nedida nasîn, li ser pirtûkên xwe, weşanên xwe, destûra xwe de hertim *Xoybûn- Rêxistina netewî ya kurd* (Hoyboun-Ligue nationale kurde) bi kar dianî. Çawa em dibînin li hemberî peyva Xoybûnê, Xoybûn wek rêxistineke kurd hatiye nasandin. Ji aliyê din li hemberî wê bi zimanê frensî peyva serxwebûnê jî nehatiye bi kar anîn, ev yeka jî gelek balkêş e. Bi kurtî li ser peyva Xoybûnê mirov dikare gelek tiştan bêje. Îro di vê maneyê de di zimanê kurdî de peyva *serxwebûn* cih girtiye û zêdetir tê bi kar anîn. Bi kurtî em dikarin bêjin ku peyva Xoybûnê tenê navê rêxistinekê ye û wisan divê bê qebûl kirin. Ji aliyê zimanzaniyê de êdî peyva Xoybûn divê wek *"peyveke mirî"* bê hesabîn û wisan bê qebûl kirin.

– *Bi dîtina te rûçik û karakterên ku Xoybûnê ji rêxistinên kurd yên din cihê dike hene?*

– Di dema sazkirina Xoybûnê de tiştê herî girîng ew bû ku cara pêşîn di tarîxa kurdan de çend rêxistinên kurd menfatên xwe yên rêxistinî avêtin alîkî û li dora menfatên netewî (mîllî) civiyan. Di dawiyê da rêxistineke nû saz kirin. Di dîroka Kurdistanê de ev cara pêşîn bû ku çend rêxistinên kurd dibûne yek. Xoybûn di vî warî de nimûna yekemîn e. Kurdan êdî di bin baskên rêxistineke fireh de cih girtibûn. Yek ji wan aliyên Xoybûnê yê balkêş ew bû ku Xoybûn wek rêxistinî metod û tehrên tekoşînê guharti bû. Li gel tekoşîna çekdarî, bi taybetî baweriya xwe gelek bi kaxiz û pênûsê dianî. Ji aliyê din ev gelek welatên Ewrûpayê û Emerîkê seferêke dîplomatîk dimeşand. Bi kurtî em dikarin bêjin ku Xoybûnê hemû îmkanên tekoşînê bi kar dianî û bîna rêxistineke modern jê dihat. Xoybûn guhdarîke mezin dida karê înfomasyonê. Bi taybetî zîhniyeta derxistin û belavkirina karê belavokan em dikarin bêjin ku cara pêşîn Xoybûnê dest pê kir. Xoybûnê wek rêxistin bi zimanê inglîzî, fransî, erebî û tirkî çend pirtûkên gelek înfomartîk û hînkariyê derbarê rewşa kurdan de weşand. Tiştêkî mayîn jî Xoybûn angorî rêxistin û komelên berî wê saz bûbûn, rêxistina Kurdan ya here jiyandirêj bû, qasî bîst salan (1927-1946) jiyana xwe domand. Ji bo kurdan bû tecrubeyêke siyasî û dîrokî.

– *Mîna tê zanîn paşê di nav Xoybûnê de berberî derdikevin û ev yeka wek rêxistin Xoybûnê gelekî qels dike. Gelo ew çi berberî bûn?*

– Di nav Xoybûnê de gelek hêzên ji hev cuda hebûn. Komeke ji xwendî û ronakbîran pêkhatî hebû. Ji aliyê din di nav Xoybûnê de komeke şêx, axa û began hebû. Vê koma dawîn civata kurd ya tradîsyonel û saziyên kevn temsîl dikirin. Di navbera van herdu hêz û baskan de hertim nerehetîk hebû. Ji aliyê din haya îstîxbarata Tîrkiyê ji nakokî û dubendiyên nav Xoybûnê de hebûn, hertim gur û tûjtir dikir.

Tîrkiyê bi hemû îmkanên xwe ve gelek hewl dida ku Xoybûn hilweşe û ji ortê rabe. Yek ji wan metodan li dijî Xoybûnê derxistina qanûnên efûyan bû. Bi saya van efûyan Tîrkiyê dixwast hin



Qedri Cemil Paşa (Ji arşiva Pervînê)



Ekrem Cemil Paşa û xanima wî Cawide xanim

endamên Xoybûnê dev ji Xoybûnê berdin, bên teslîmî Tîrkiyê bin û Xoybûnê perçe bikin. Vê yekê bandûra xwe nîşan da. Wek kesên mîna Elî Rîza, Emînê Perîxanê di sala 1928an de ji Xoybûnê veqetiyên û Mehmed Şukrî Sekban ji paşê dev ji Xoybûnê berda û çû teslîmî Tîrkiyê bû. Ev veqetandin û çûyînen wisan nexweş bêguman li ser Xoybûnê bandûreke neçê dihîşt. Bi saya van veqetandinan hêzên polîst yê Tîrkiyê derbarê Xoybûnê de dibûne xweyê agahdariyên fireh. Ev yeka ji bo rêxistineke veşartî nebaş bû. Lê belê di van salan de Şerê Araratê berdewam dikir. Xoybûnê hemû hebûn û enerjîya xwe di vî warî de seferber dikir. Ji bo vê yekê jî ew hewldayînen Tîrkiyê zêde

T. C.
BASVEKALET

Kararlar 2046/1998

Sayı: 15177

KARARNAME

DAHİLİYE VE İSTİBARAT
CUMHURİYET ARŞİVİ

Suriyeye kaçarak Fransız İstihbarat Dairesine iltica etmiş olan Diyarbakırlı Kürt Cemil Paşanın oğullarından Mustafa Bey Oğlu Mehmet Ferit, Kasım Bey Oğlu Ekrem, Fuat Bey Oğlu Bedri ve Kadri'nin bu hareketleri yabancı memleketlerde askerlik mahiyetinde vazife deruhte etmiş olduklarını göstermesine binaen, 1312 sayılı kanunun 9 uncu maddesine göre Türk vatandaşlığından çıkarılmalrı; Dahiliye Vekilliğinin 7.10.1933 tarih ve 8514.2519 sayılı tezkeresi üzerine İcra Vekilleri Heyetinin 12.II.933 toplanışında kabul olunmuştur.

12. II. 933

REİSİZLİK HUR

Gazi M. Kemal

Bg.V.

Isık

Ad.V.

M.M.V.

Reza

Da.V.

S. Kaye

Ha.V.

S. D. Paşa

Ma.V.

M. Kemal

Me.V.

Reza

Na.V.

Reza

İ.V.

Reza

S.M.V.

S. Paşa

G.V.

Reza

Zr.V.

Reza

Biryamameya derxistina malbata Cemil Paşa ya ji hevvelatiya Tirkiiyeyê. Di binê Biryamameyê de imzeya Mustefa Kemal ji heye.

bandûrhişt nîn bûn. Tenê veqetîn hebûn, dijayetî û dubendiyên nav Xoybûnê ewqas tûj nîn bûn.

Bi taybetî di sala 1930yî de binketina Serhildana Araratê di nav Xoybûnê de bandûreke mezin nîşan da û bû sedemekî bîntengiyê. Piştî vê bûyerê Xoybûn qels bû. Di sala 1929an de gelek kesên mala Cemîlpaşa ketin nav refên Xoybûnê û bûne endamên wê. Vê carê di navbera Bedir-Xanî û Cemîlpaşayîyan de berberî û dijayetîkê dest pê kir. Di dawiyê de Celadet, Kamiran û Sureya Bedir-Xan di sala 1932an de ji nav refên Xoybûnê veqetiyên, xwe dane alîkî û bi karên çandî ve mijûl bûn. Lê belê dijminahîke wisan mezin peyda nebû. Riya diyalogê vekirî ma. Di kovara Hawarê de ya ku Celadet Bedir-Xan derdixist, wek mîsal em rastî çend xebatên Qadrî Cemîl Paşa jî tên. Herdu aliyan jî hewl didan ku hebûna hev înkâr nekin. Carcar jî dijayetîya navbera wan derdikete rûyê avê, ev dijayetî di navbera Cemîlpaşa û mala Haco Axa de jî hebû. Qadrî Cemîl Paşa û Ekrem Cemîl Paşa di rexneyên xwe de Haco Axa û kesên wek wî kesine "nexwendî" dihesibandin. Haco Axa di sala 1933an de nivîseke gelek balkêş di hejmara 15an ya kovara *Hawar* de weşandiye. Haco Axa di vê nivîsa xwe ya bi navê "*Şêx, axa û munevveran*" de dixwaze bala xwendevanan bixşîne ser rola axa û şêxan. Ew dibêje ku serhildanên mezin yên kurdan bi pêşengîya wan çêbûne, di wan deman de xwendevan û ronakbîr li bajarên mezin diman û ji van tevgeran dûr ketibûn. Ji aliyê din Haco Axa her çiqas dijî wan dedikeve jî rola xwendekar û ronakbîran piçûk nabîne. Di dawîya nivîsa xwe de tiştêkî giring dibêje, ew dide diyar kirin ku, kî dibe bila bibe dema di xizmeta millîtê xwe de be, ew di rêke bi qedir û qîmet de ye. Haco Axa bi van gotinên xwe ve dide diyar kirin ku di tevgera neteweyî de divê her tebeqeyên civatê beşdar bibin. Dijî vê nivîsa Haco Axa kesekî bi navê Evîn Civelek nivîsekê di hejmara 17an ya kovara Hawarê de dinivîse û dîtînen Haco Axa rexne dike.

Di nav refên Xoybûnê de ne tenê Bedir-Xanî, Cemîlpaşazade û Hacoyî hebûn. Wisan jî komeke nealîgir û bêteref hebû. Ji destpêkê heta belavbûna Xoybûnê di nav Xoybûnê de man, ji Xoybûn dûr neketin. Xoybûn eger demeke dirêj li ser piyan ma, mirov dikare bêje ku bi saya vê komê hebûna xwe berdewam kiriye. Di nav vê komê de kesên wek Memduh Selîm, Mistefa Şahîn û Bozan Şahîn hebûn. Çend kesên mayîn ku paşê ketibûne nav Xoybûnê roleke wisan pozîtîf lîstin û tevî şerên hundurîn nebûn, wek Nurî Dersîmî, Ebdurehmanê Eliyê Yunus, Arîf Abbas û Nafîz Beg.

Paşê kesên wek Osman Sebrî û Cigerxwin jî ketine nav Xoybûnê. Van kesan çareserkirinên bi radîkal dixwastin. Bîr û baweriyên çeprevîn û sosyalîst hêdî-hêdî di nav kurdan de belav dibûn û bandûra xwe li ser Xoybûnê jî dihiştin.

Mirov dikare bêje ku di nav van bîst salan de (1927-1946) gelek dîtin, bawerî û ceryanên polîtîk di nav Xoybûnê de peyda bûn.

– *Di nav Xoybûnê de cih û rola Bedir-Xaniyan çi bû?*

– Di destpêka sazûna Xoybûnê de Bedir-Xaniyan roleke gelek mezin lîstin. Bi taybetî Celadet Bedir-Xan, Kamiran Bedir-Xan û Sureya Bedir-Xan. Ev hersê kes wek sê aktîvistên here mezin yê Xoybûnê dihatin nasîn. Di avakirina Xoybûnê de roleke mezin jî Xelîl Ramî lîst ku di wan salan de li Libnanê dima. Salên wî bihirîbûn. Kurdan hurmeteke mezin jê re nîşan didan. Di nav hîmdarên Xoybûnê de cih negirt, lê belê hertim wek hîmdar û endamêkî Xoybûnê hate nasîn û wisan hate qebûl kirin. Di sala 1919an de li bajarê Meletiyê wek mutasarrîf kar dikir. Paşê koçî Libnanê kiribû, li wir dima. Di sala 1932an de li Libnanê vefat kir.

Serokê Xoybûnê Celadet Bedir-Xan bû. Di nav kurdên nefîkirî ku di van salan de li Suriyê û Libnanê belav bûbûn, yê herî zana, xwande û herî kurdnas Celadet Bedir-Xan bû. Li Ewrûpê mabû û dinê nas dikir, ziman zanibû. Ji bo serokatiya rêxistinekê gelek pîvan bi Celadet Bedir-Xan re hebûn. Mirov dikare bêje ku di destpêkê de motora Xoybûnê Bedir-Xanî bûn û ew *troyka* ji van kesan pêk hatibû: Celadet, Kamiran, Sureya. Bi taybetî Sureya Bedir-Xan wek dîplomatekî kurdan gelek karên kêrdar kirine. Di dîroka dîplomasiya kurdan de piştî Şerîf Paşa, bi baweriya min kesê duwemin Sureya Bedir-Xan e. Li gelek welatan nav û doza kurdan daye bihîstin û nasandin. Ji Bedir-Xaniyan yê ku bi taybetî li Ewrûpê gelek hate nas kirin, Sureya Bedir-Xan bû. Ne tenê li Ewrûpê wisan jî li Emerîkê navê wî belav bû. Wî ew kurdên ku li Amerîkayê diman li hev civandin û ew li dora Xoybûnê berev kirin. Kesê ku cara pêşin kurdên Amerîkayê bi ruhekî netewî organîze kirin, Sureya Bedir-Xan e. Di raporeke Îngîlîz ku di tarîxa 18/4.1929an de ji Amerîkayê, ji bajarê Detroitê hatiye şandin, dide diyar kirin ku Sureya Bedir-Xan berî ku bê Amerîkayê çûye Îtalyayê û li wir 15 rojan maye û bi Musolonî re hevdudîtinek pêk aniyê, paşê riya xwe bi Yunanîstanê xistiye. Di eynî raporê de hatiye nivîsin ku hejmara kurdên Amerîkayê di wan salan de qasî 10.000 kes bûne. Li Amerîkayê şubeyeke Xoybûnê tê vekirin û gelek çalakiyên kêrhatî pêk tên.

– *Bi baweriya te armanca hevdîtina Sureya Bedir-Xan û Musolonî dikare çi be?*

– Ev hevdudîtin û serlêdanên waha gelek normal in. Her welatek an jî her milletek ji bo xêra xwe bi gelek hêzan re dikare têkeve têkilyan, ev yek nayê wê maneyê

Tout changement ou supplement apporté au present traite ne pourra faire, que sur le consentement commun des deux parties.

Art.18.- Le present traite militaire et politique entre en vigueur de son signature par les deux parties contractantes.

Art.19.- Le texte de ce traite est redigé en francais est fait en deux exemplaires.

Fait a Beyrouth le vingt neuf Octobre, Mille neuf cent vingt sept

Le Parti Revolutionnaire Armenien
Dashednaktzoutioun

V. G. Tapasim

La Ligue Nationale Kurde
Hoyboun

١- ژنرالی مهاباد
٢- ژنرالی کربلای
٣- ژنرالی سنندج
٤- ژنرالی تبریز
٥- ژنرالی ارومیه
٦- ژنرالی همدان
٧- ژنرالی کرمانشاه
٨- ژنرالی دیواندره

Rûpelé dawî yê peymanê ku di navbera rêloxistinê Taşnak û Xoybûnê de hatiye îmzekirin.

ku di navbera her aliyan de sempatîk heye. Dîplomasi ne hunera hevhezkirin û sempatiyê ye, belkî jî mirov tarîf bike, dikare bêje ku dîplomasi hunera hevfamkirin û hevînkirinê ye. Dema Celadet Bedir-Xan li Almanyê dima, çawa lêkolîner Konê Reş dide kîvê, Celadet û Hitler jî hev dîtine. Hitler, nimûneyek ji wê pirtûka xwe ya bi navê "Berxwedana Min" diyarî Celadet Bedir-Xan kiriye. Dema mirov wan weşanên ku bi destê Bedir-Xaniyan derdiketin, mêze dike, mirov dibîne ku Bedir-Xaniyan dema Şerê Cihanê yê Duwemin de li dijî faşîzmê cîh girtine, tu têkiliyên wan bi faşîstan re tune bûne.

– *Di gelek çavkaniyan de tê diyar kirin ku ermeniyên di nav Xoybûnê de roleke pir mezin lîstine? Gelo çi para rastiye di vê de heye?*

– Ermenî û kurd du milletên bindest bûn, dijminê wan yek bû. Enînivîsa wan wek hev bû û gelek caran bi riya hevkarîyê xwestine li dijî vî dijminê hevbeş şer bikin. Pêwendiyên Ermeniyên û kurdan dema sazûna Xoybûnê û destpêka Serhildana Araratê her çûye xurt û germ bûne. Di navbera salên 1927-1930yî de vê hevkarîyê di hemû waran de berdewam kiriye. Gava here giring di sala 1927an de tê avêtin û di navbera rêxistina ermeniyên Taşnak û rêxistina kurdan Xoybûnê de peymanekê dîrokî tê îmzekirin. Ev peyman ji 19 xalan pêk tê. Di binê peymanê de bi navê Ermeniyên îmza Vahan Papazyan û bi navê kurdan îmza heyşt endamên komîta merkezî ya Xoybûnê hene. Li jorê me navên van kesan dabûn. Ev peyman, peymanekê veşartî bû. Gelek karakterên wê yên politîk û leşkerî hebûn. Bi taybetî xala 8an ya vê peymanê gelek balkêş e. Angorî vê xalê ji bo ku karên hevkarîyê baş bimêşin yek ji nûnerên Taşnakan di mercên lazim de divê têkeve nav komîta merkezî ya Xoybûnê û di wir de kar bike. Ev xala ji alîkî de ji bo kordînekirina karan mirov dikare bêje tiştekî normal e. Lê belê Xoybûn rêxistineke serbixwe bû, ji aliyê kurdan de hatibû saz kirin. Di rêxistinekê de beşdarbûna kesekî din timê ji bo Xoybûnê bûye serêşîke mezin. Ev yeka tê wê maneyê ku rêxistina Taşnak dîrek, raste-raste tevî karên Xoybûnê yên hundirîn bûye û Xoybûn xistiye bin kontrola xwe. Mirov dikare bêje ku vê yekê wek rêxistin zirarek gihandîye nealîgirtin û serxwebûna Xoybûnê. Di dawiyê de ev yeka di nav Xoybûnê de bûye sedemê nerehetîkê. Gelek endamên wê gazin û lomeyên xwe bi êşkera anîne ziman. Ji aliyê din rêxistina Taşnak di van salan de rêxistineke dijî Sovyetê bû. Vê yekê li ser pêwendiyên kurd û Sovyetê jî tesîr dikir.

– *Sedemên bingehîn yên hilweşandina Xoybûnê çi bûn?*

– Çawa me li jor jî gotibû armanca Xoybûnê li ser erdê Kurdistanê Tirkîyê sazkirina dewlete serbixwe bû. Piştî serhildana Şêx Seîd, kelecana kurdên koçber ku li Sûriyê û Libnanê star bûbûn gelek bilind bû, hêviyên wan xurt bûn. Merc û hoyên li deverê gelek nazenîn (hesas) bûn. Piştî şerê cîhanê yê yekemîn sînoran gelek dest diguhirand, herkes pey pêşeroja xwe ketibû. Her tişt dikaribû bi lez biguhiriya. Xoybûnê di demê waha dîrokî de kar û tekoşîna xwe dajot. Eva periyoda pêşîn, periyoda pêşketinê bû.

Periyoda duwemîn periyoda qelsbûnê û bêhêzbûnê ye. Kurd li devera Araratê û li devera Dersimê li ser hev gelek darbeyên mezin xwaribûn. Ji aliyê din li cî-

hanê gelek guhartinên mezin çêdibûn. Şerê cîhanê yê duwemîn berdewam bû. Bala kurdan zêdetir li ser Kurdistana Îranê bû. Xoybûna ku bala wê bi salan li ser Kurdistana Tîrkiyê bû, di rewşeke waha nazenîn de tu bandûreke wê nema bû û hatibû dereceke xwebelavkirinê. Ew Xoybûna ku gelek salan li dijî Sovyetê bû an jî Sovyeta ku dijî Xoybûnê derdiket, piştî salên 1940î êdî rolên xwe guhartibûn û di xetên polîtîk yê nûh de dimeşîyan. Xoybûn êdî di xetêke polîtîk ya pro-Sovyet de bû. Di sala 1946an de Xoybûn belav bû. Di dawiyê de bû rûpelekî tarîxa Kurdan.

– Di xebata te de serhildana Araratê cîhekî taybetî digire. Tu dikarî bi kurtî behsa pêwendiyên tevgera Xoybûnê û serhildana Araratê biki?

– Serhildana Araratê bi serê xwe hêjayî lêkolîneke fireh e. Angorî serhildanên kurdan yê mayin serhildana Araratê kêm hatiye lêkolandin. Dema Xoybûn di sala 1927an de tê saz kirin, li devera Araratê (Agirî) serhildaneke kurdan ya demdirêj dest pê dike. Xoybûn bi hemû hêza xwe alîkarî û piştigirtiya vê serhildanê dike. Yek ji xebatên Xoybûnê yê bingehîn bidarxistina vê serhildanê ye. Mîrov nikare babetê Xoybûnê û Serhildana Araratê ji hev biqetîne. Ev serhildan qasî çar salan (1927-1930) berdewam dike û di dawiya sala 1930yî de ji ber sedema bihevhatina Tîrkiye, Îran û Sovyetê ev serhildan têk diçe. Piştî vê binketîna bi rastî Xoybûn ber bi qelsbûnê diçe. Di vê pirtûka xwe de min zêdetir xwest ku tenê bala xwendevanan bikşînim ser giringiya vê serhildanê û pêşengiya wê. Bi taybetî min xwest çend tiştine biyografîk yê kurt derbarê kesên wek Îhsan Nurfî Paşa, Biroyê Heskê Têlî, Ferzende û Xalis Beg (Xalis Oztürk) de pêşkêş bikim. Piştî binketina Serhildana Araratê çawa tê zanîn pêşengên vê serhildanê xwe nedane dest, derbasî Îranê bûn. Paşê çi hate serê wan? Bersîva vê pirsê heta niha jî baş nehatiye dayin. Min xwest bala xwendevanan hinekî be jî bikşînim vê periyoda piştî serhildanê. Di van serhildanên kurdan yê kevn de piraniya serok û pêşengên van tevgeran hatine girtin an jî hatine kuştin. Lê belê di Serhildana Araratê de pêşengên vê serhildanê hemûyan xwe xelas kirine û derbasî aliyê Îranê bûne. □

SERÎLÊDANEKE ÇÎNÊ

ŞAHÎNÊ BEKIRÊ SOREKLÎ



Şahîn digel pîrejineke çînî

Ji bo wan kurdên ji nîfşê min ku di salên 60 an û 70 yan de bi siyasîyê ve mijûl bûn rola Partiya Komunist ya Çînê yeke balkêş bû. Di wan salan de peywendiyên Yekîtiya Sovyêtî û Çînê û gelşên di navbera her du welatên sosyalîst de encamên xwe digihandin gellek partiyên komunist û niştimanperwer yê cihanê jî. Bêyî guman,

wek welatekî ku xwe sosyalîst dizane, welatekî ku hejmara xelkê xwe dora 1300 milyon e û endamekî Encûmena Asayîşê (meclîsa emniyetê) ye, rola Çînê di siyaseta û bazirganiya navneteweyî ya îroyîn de yeke bêyî hempa ye. Di nav çend salên dawîn de hukmata australî, herweha weşanên giştî yên vî welatî, balkêşiyeke mezin dan Çînê û têkiliyên bazirganî yên herdu welatan sal bi sal berfirehtir dibin. Ev çend sal in ku meraqa serilêdaneke vî welatî li nik min heye û di destpêka sala 98 an de min ew meraqa xwe bi cîh hanî, bi beşdarbûna di nav komeke mamostayan de ku dixwaztin ji bo çend rojan biçin Çînê. Gelo ew wêneya ku min ji bo vî welatî û xelkê wê di xeyalên xwe de afirandibû ta çi radeyê di cîh de bû? Hêvîdar im bikaribim di vê gotarê de hem bersîva vê pirsê bidim, hem jî xwendevanan di derbareyê çend tiştên ku xwe bi Çînê ve eleqedar dikin agahdar bikim. Pêwîst e di destpêkê de bête gotin ku tecrûbeya min ya heşt rojan yeke bi sînor e. Loma, amanca gotarê tenê afirandina wêneyeke şexsî ye ji aliyê tûristekî de, ne dayîna analîzeke rêk û pêk.

Di destpêkê de çend agahiyên di derheqê Çînê de: Bi 9 600 000 Km² Çîn bi mezintiya erdê xwe di cîhanê de welatê sêyem e. Ji aliyê rojhelat ta aliyê rojava bêtir ji 5000 û ji bakur ta başûr bêtir ji 5500 kîlometir e. Hejmara danişvanên wê dora 1300 milyon e, ku nêzikî 1/4 ji danişvanên cîhanê dike. Şaristaniya çînî yek ji kevintirîn şaristaniyên cîhana me ye û dîroka wê ji 4000 salan û vir de bi nivîs heye. Yekem dewleta li Çînê di sedsala 21 emîn ya pêşzayîni de dest pê kiriye û dewrana feodal di sala pêşzayîni 475 de. Padîşahên baş û ne baş cîhên hev û din girtine. Hindekan ji wan şaristanî ber bi pêş birine, berjewendiya gelê xwe dane ser ya xwe û malbatên xwe ye û şopên zêrîn li dû xwe hiştine, hindekên din stemkarî li xelkê kirine, yan di dem û dewrana wan de yeketiya welêt ketiye tehlûkeyê, şerên navxoyî cîh girtine û şoreşên gelêrî dest pê kirine. Ji sal 1840 û şûnve hêzên biyanî ketine Çînê û welatîne ewropayî, herweha Japonê, beşîne ji Çînê xistine bin bandora xwe (li nik çîniyan nefreteke mezin li hember japoniyan heye) ta ku di sala 1949 an de partiya komunîst bi seroketiya Mao Zedong ya xwe li dij biyaniyan bi ser xistiye û desthelatdariya welêt ketiye dest wê.

Pirraniya xelkê Çînê hîn îroj jî bi çandiniyê ve mijûl e. Tenê 300 milyon ji wan li 432 bajaran dimînin. Li gor agahiyên fermî 93 % ji Çîniyan endamên koma Han in. Di nav wan de bi kêmasî deh zaravayên cuda hene, lê zaravaya fermî ya Bêjîngê ye ku wek "menderîn" tête nasîn û ya duyem zaravaya "kentonî" ye ku bêtir li Hong Kong û doraliyên wê tête axiftin. Her weha li gor agahiyên fermî, li Çînê 55 komên etnîk hene. Hindek ji wan hema hema asîmîle bûne, yan erf û toreyên wan nêzikî yên çîniyan in, hindekên din, wek Üygirên ku xwe nêzikî tirkan dizanin xwediyên ol, erf û toreyên cuda ne.

Di nav çend salên borîn de hukmata çînî bizava sînorkirina hejmara xelkê dikêye. Ji bo jin û mêrekî tenê mafê zarokekî heye, lê ji bo malbatên gundî, heke zarok keç be, wan maf heye li dû pênc salan zarokekî din wînin. Li gor şîrovekirina fermî, kesên li bervaciya qanûnê ji zarokekî bêtir wînin divêt cezayê bi pere bidin. Ji bo komên etnik yê ku hejmara wan ne weqa bilind e hanîna bêtir ji zarokekî serbest e, lê rêber nedikaribû bibêje ka hejmar bi sînor e yan na.

Ola yekem li Çînê ya bûdî ye, lê her weha çîniyên xirîstiyên û musulman jî hene. Ji van her sê olan pê ve gellek olên din jî hene. Li gel sistêma komunist û siyaseta dewletê ya dunyayî jî hejmareke ne biçûk ji çîniyan olperwer mane. Di dema serilêdana heykelên olîn de kesên rêza xwe ji Bûda re diyar dikirin va yeka aşkere dikirin. Pûtên Bûda yê curbecur haya mirov dikişînin.

Pereyên çînî wek "Yuan" têyên binavkirin. Her dolarekî emerikî dora 8 yuanaan dike.

Katjimêr 10.30 ê êvara îniyê balafira me ji bajarê Sydney firriya û li dû nêzikî deh saetan gihîşt Şanghay. Bi dora 14 milyon daniştvan, Şanghaya li ser derya bi hejmara kesên lê dimînin li dû Çoyçîng bajarê Çînê yê duyem e. Ew navenda ekonomî ya herî grîng û buhatîrîn bajarên Çînê ye. Tête gotin ku hûn îroj jî bandora ewropayî lê maye. Li vî bajarî bêtir ji 10 000 karxane û dezgehên pişesazî hene; herweha bêtir ji 200 şirketên hevpar yê biyanî-çînî, li gor agahiyên fermî.

Li dû mayîna dora saetekê li balafirgeha Şanghay balafira me berê xwe da Bêjînga paytext û li dû nêzikî du saetan em gihştin balafirgeha ku dora bîst kîlometran ji navenda bajêr dûr e. Katjimêr li Bêjîng dora 9 ê sibeya şemê bû (kata Bêjîng bi 3 saetan li dû ya Sydney û bi 5-7 saetan li dû ya Ewropa ye).

Li bervacêya texmîna min çî alên sor û wêneyên Mao yan çî serokên din li balafirgehê nînin. Hem balafirgeh û hem rêya me digihîne navenda bajêr welatine Ewropaya Rojhelat û paytextên welatên Rojhelata Navîn tînin bîra min. Otomobîlên li ser taxan bi pirranî ji modêlên 10 salên borîn in. Ji otomobîlên almanî Volkswagen gellek in, herweha Audi. Ji yê emertikî hejmara otomobîlên Jeep bala mirov dikişîne (van her sê modêlan li Çînê têyên çêkirin). Ji wan pê ve otomobîlên curbecur hene, ji çêkirina Japonê, Ewropaya Rojava û Emerîka. Hejmareke mezin ji taksiyan otomobîlên biçûk in, ji çêkirina Çînê bi xwe. Ji otomobîlên kevin çendekên ji çêkirina Yeketiya Sovyêtî hên tek û tûk têyên dîtin, bi taybetî kamiyon. Rê yeke fireh e, li her aliyekî cîhê sê otomobîlan heye. Rêberê me dibêje, ev rêyeke nû ye û şofêrên wê bi kar tînin pêwîst e pereyan bidin (Toll Way). Dû re em dibînin ku rêyên Bêjîng digihînin hindêk deverên din jî rêyên nû ne û bikarhanîna wan jî bi pere ye, wekî li Îtalya. Heku em nêzikiyê li bajêr dikin hejmara pisîkdêtan zêde dibe. Rêber dibêje, li Bê-

jîngê neh milyon pisîklêt hene. Hejmara xelkê Bêjîng bi xwe 11-12 milyon e lê dora çar milyon kesên din ji doralîyên wê roj bi roj têyên kar, li gor rêber. Taxên Bêjîng ji pisîklêtan û otomobîlan mişt in û rewşa trafîkê wek ya paytextine Rojhelata Navîn e, heke pisîklêt neyên hesabandin. Bi gotîneke din, ew rêzgirtina ji qanûnên trafîkê re, wekî ku li Ewropaya navend û bakur heye li vir yan bi carekê de tune, yan tenê li hindêk taxên serek ta radeyekê heye. Pisîklêt hîn îroj jî li Çînê roleke mezin dileyizin. Ta ber kurtedemekê, li gellek gund û bajarokan hîn îroj jî, pisîklêt dikare ji bo malbatakê wek serbilindiyekê bête hesabandin.

Roja yekem li Bêjîng rojêke pîrr sar bû, ne tenê çimkî radeya germahiyê o bû lê ji ber bayê qebe jî. Bi gotîneke din saldemên Çînê jî wek yê beşê bakur ji erdê ne. Bi taybetî ji ber wê yekê ku em ji havîna australî ya germ di nav rojê de ketin zivistana Çînê ya sar, serilêdana Meydana Tiyanimin di roja yekem de endamên koma me qefilandin. Va meydana navdar mezintirîn meydana Bêjîngê ye û tenê li vir bû ku min wêneyeke Mao Zedong li ser dîwarekî dît (Meydana Tiyanimin bi encama xwepêşandanên ji bo demokrasîyê ku ber dora sê salan bûn sedema kujtina hejmareke ji xwendekaran li tevahiya cîhanê wê demê deng da). Li dû sê rojan em car din li Meydana Tiyanimin veçeriyay ji bo dîtina termê Mao. Bi hezaran kes di dorê de bûn lê yek demêke dirêj di dorê de namîne ji ber ku mirov di çar qoran de têyên rêzkirin û pêwîst e bêyî rawestandî di ewrana mezin re derbas bibin. Wisa diyar e ku rêza hejmareke mezin ji çîniyan hîn îroj jî ji mao re heye. Ji aliyê fermî de ew mirovekî bêyî şaftî ye û navê rexne li wî bêyên kirin. Mao li ser piştê di nav sandîqeke camîn de ye û rûyê wî baş, lê zeravîn, xuya dike. Mirov dil dike raweste û rêza xwe ji bo wî diyar bike lê pêwîst e bêyî rawestandî riya xwe bidomîne. Ez ji xwe dipirsim, heke Mao ji gora xwe ya camîn rabûya û di taxên Bêjînga îroj de bigeriya, gelo wî dê çi bigota?! Bêjînga îroj li ber çavan ne Bêjînga felsefe û siyaseta Mao Zedong e. Bêjînga îroj melaxmeyeke ji sîstêm û siyasatên cuda ye. Li aliyekî bînaşîyê bilind yê wek di taxên bajarêkî Emerîka de, li aliyê din taxên teng û gemarîn; li aliyekî mixazeyên bi tiştên nerxibînd, wek mixazeyên ewropayî, li aliyê din mirovên ku li ser taxan bizava firotina kartan, pênuşan, tişt-miştên hûrik, kuman, lepikan, ... dikin. Yê parsê dikin jî hene û kesên ku li serê tûristan dibin bela û wan bernadîn bêyî ku tiştêkî bifroşin wan mirov aciz dikin. Bêyî guman ew wisa texmîn dikin ku her tûristekî bête Çînê milyonêr e!

Di taxine Bêjîng de, her weha li bajarê Tiyencîn, mirov carine wisa hest dike ku ew li Rojhelata Navîn e. Dema tu bixwazîbî tiştêkî bikirî divê tu zor haydar bî. Firoşkar ji bo tiştêkî heye ku 200 Yuan bixwaze, lê di dawîya dawiyê de tu dê bikarîbî wî tiştî bi 80 Yuanan, heye ku kêmtir, jê bikirî (di mixazeyên mezin yê nû de bazarkirin tu-

ne, lê hejmara van şewemixazeyan kêr e). Êvara yekem, li dû xwarina şîvê di xwarin-gehekê de, li pêş dêrî dîsa firoşkarên peyade civiyabûn. Yekî ji wan kir ku çend pê-nûsan bifroşe min. Min bi îşaret jê re şîrove kir ku min pê-nûs navên lê cotek lepik di-vên. Wî serê xwe hejand, destê xwe avêt tûrê xwe û cotek lepik jê derxist. Min ew bi deh Yuanan jê kirî. Dema ez gihîştim otêlê min dît ku camêr lepikên xwe yên kevin firotime min, lê lepik baş bûn û nexê wan ji bo min arzan bû. Wekî rêberê me dibê-je, nîşê nû wê bizavê dike ku pereyan bi dest xwe, çawa dibe bila bibe. Li gor wî, nî-şê kevin ji rewşa îroyîn ne razî ye. Hejmara bêkarên zêde dibêye. Kesên bêkar maf he-ne heftayê rojekê di karxaneyekê de kar bikin da ku piçek pere bi dest xî nû ew zaro-yên xwe birçî nemînin lê van pereyan têrê nakin. Ew bizavê dikin di taxan de tişteki bifroşin, heta hindekan dest bi parsê jî kirine, ... Hukmatê rê daye karê serbest jî. Yê-n pereyên xwe hene dikarin xwaringehê, dukanekê, yan projeyekê din ji xwe re ve-kin. Li gor du-sê kesên ez li gel wan axiftim, îroj li Çînê kesên dewlemend pirr in, he-ta milyonê hene. Kesên dewlemend û yê-n di nav partiya komunîst de şûnbilind di-karin "tiştê bixwazin bikin," li gor wan. Herweha li gor wan, "yên şûnbilind di parti-yê de di koşkan de dijîn; jiyana wan û malbatên wan wek ya padîşahên demên kev-nar e." Belê, Mao dê ji rewşa îroj ne razî bûya; Çîna îroj ber bi sermiyandariyê diçêye. Keyfa hejmareke mezin ji nîşê nû jî ji rewşa nû re tê. Ew dibêjin rewşa jiyane nûha ji ya ber deh salan baştir e, lê li milê din mirov dibêjin dema ew qas kesên perî-şan li ser taxan dibîne. Mirov dikare bibêje, Çîna îroj welatekî bi 3-4 rûyên cuda ye. Jiyan û rewşa li Bêjîng û Şanghay ne wek ya li bajarên din e, û rewşa daniştvanên gundan û mezreyan bi carekê de cuda ye. Li milê din, Çîn welatekî mathîştîne ye. Ji aliyekî ve mûşekên gerdûnî çêdike, lê li milê din, pûlên postayê hîn bêzembaq in, ya-nê divêt mirov bi xwe zembaqê li paşya wan xe da ku bi zerfê de biqemirîne.

Gelo çî bi şoreşê hat? Gelo çî bi amancên siyaseta partiya Mao hat? Rêber dibêje, divabûn "reform" dest pê bikin çimkî, wek serdarên nû diyar dikin, Çîn rasterast ji feûdalîzmê derbas komonîzmê bûye bêtir ku têkeve qonaxa kapîtalîzmê. "Ji ber ku di-rok nedikare ber bi paş biçe rêya sosyalîzmê dê bidomîne, lê li gel çend gavên ber bi kapîtalîzmê, wek tecrûbeyekê." Ji lew re hukmatê rê daye dezgeh û şirketên biyanî, ji Volkswagen bigir ta Hilton. Lê dewlemendên çînî jî vê fersendê bi kar tînin, ew jî Mercedes û BMW diajon û bandora wan ya civakî û siyâsî jî roj bi roj zêde dibe (Li Bêjîng 37 cihên "McDonald s", 17 cihên "Kentucky Fried Chicken" û 10 cihên "Piz-za Hut" hene). Li milê din, vegera Hong Kong li Çînê dê rola xwe bileyze. Çîn nax-waza ku tevahiya dirav û xibreta dewlemendên Hong Kong ji dest wê biçe, dixwaze ji wan re rê veke ku pere û xibreta xwe li welatê xwe bi kar wînin. Lê rêdana ji bo ser-miyandariyê û teoriya komunîst ê çawa û ta kengê bikaribin bi aştî û aramî bi hev re

bin, kes nedizane. Çawa be ji li Bêjîngê bi xwe, yan bi kêmasî li navenda bajêr, heye ku ew qas belengazî neyêt dîtin, lê Bêjîng bi serê xwe ne Çîn e. Em çûn bajarekî din, bajarê Tiycên, 130 kilometir li başûrê rojhelatê Bêjîng ku hejmara danîşvanên xwe dora 7 mîlyon e. Li vir hejmara pisiklêtan zêde û ya otomobîlan, bi taybetî yên nêrx-bilind, kêr dibe, gemar bêtir dibe û belengazî berztir dibe. Mirovên li vir hîn gellek kesên biyanî nedîtine, hindêk ji wan radiwestin, deqeyekê, du deqeyan û sê deqeyan li mirovê biyanî seyr dikin. Di firoşgehên bajêr de gellek tiştên ku min nedizaniyê çî ne hebûn, tiştên ji bo xwarinê. Tiştine mathîştîne hebûn ku min dîl niye li vir behsa wan bikim ji tîrsa ku xwendevanîne bi şaşî têbigihên, çimkî me maf niye erf û tore-yên civatên din di çavên xwe de nizim bikin, yan li gor zanibûna xwe şrove bikin.

Yek ji adetên din ku wek yên xelkê Rojhelata Navîn e tûkirin e. Çînî ji belxema xwe tû dikin ser erdê. Bi taybetî di taxên gelêrî de, her çend gavan mirov komikek belxem li ser erdê dibîne. Li milê din, gellek kes di van taxan de gemara di dest xwe de diavêjin ser taxê. Herweha di van taxan de, wek li hindêk bajarokên Rojhelata Navîn, bazarên gelêrî hîn îroj jî hene. Mirov dikare li wir gellek tiştan û heywanan biki-re, ji titûnê bigir ta çivîkan. Lê li bervacêya hindêk civatên Rojhelata Navîn, wisa di-yar e ku jina çînî gavên mezin di nav civata xwe de ranane, bi taybetî heke mirov dî-roka Çînê bide ber çav, çimkî di demên ber şoreşê de zordariyeke mezin li jinan di-bû. Jin li dû zewacê navê malbata xwe, ne ya malbata mêr, hildigire lê pirraniya zarokan bi navê malbata bavê têyên nasîn.

Rêberê me dibêje, zanyar û rêberên Çînê her gotine, Çîn hewcedara teknolociya rojavayî ye, ne felsefe. Lê çîqa çand û felsefeya çînî xwediyên rehên kûr bin jî nayê ve-şartin ku çanda rojavayî dest pê kiriye bandora xwe bigihîne çîniyan. Tew hejmareke ne biçûk ji wan birçiyên rê û sinçiyên rojavayî ne. Wek nimûne, ciwanên çînî, bi tay-betî ewên li bajarên mezin roj li dû rojê bêtir ber bi adetên rojavayî diçin, ji dîsko bi-gir ta modeyê. Rêberê me dibêje, dîskoya ku ber çend salan wek "lîztikeke segên dîn" ji aliyê nişê kevin de dihat binavkirin îroj bûye tiştêkî normal. Ji aliyê teknolociyê de, nûjenkirina rê û rêçikên teknolociya kevin li Çînê ne bêyî nêrx e. Karxaneyên ji de-mên raberdû manî êdî ne li gor dewrana îroyîn in, lê bivêr neyêr bi mîlyonan karker di wan de kar dikin. Hukmat neçar e wan rawestîne, yan bi kêmasî nûjen bike, gellek çaran bi alîkariya şirketên biyanî, lê li vir tehlûkeya bêkarmayîna bi mîlyonan tête ber çav ji ber ku karxaneyên nû ew qas karker bi kar naynin. Di rewşa îroj de hîn hejma-ra mezin ji karxane, firoşgeh, xwaringeh û şûnên din mulkên dewletê ne. Li van şû-nan ji hewcedariyê bêtir karlker têyên bi karhanîn. Wek mînak, dema yek dikeve fi-roşhekê sê-çar firoşkar têyên pêrgîna wî; di xwaringehan de ji bo her maseyekê du-sê garson hene. Heta wek mêvan jî, mirov hest dike ku va rewşa dê wisa nemîne. Heke

Çîn xwe li gor şert û mercên ekonomiya navneteweyî bide guhertin, guman nîne ku hejhmara bêkaran li vî welatî dê sal bi sal bilind bibe. Bi encama vê yekê gellek nexweşiyên civakî wek yên welatên rojavayî dê li Çînê jî berfireh bibin, wek dizîkirinê (ku ji nuha ve dest pê kiriye), zêdebûna cerîmetê, gelşên ciwanan, giyanfiroştinê û yên din. Çîn herweha neçar e demokrasîyê jî berfirehtir bike û zêdekirina demokrasîyê dê bibe sedema têkberina disîplînê. Bi gotineke din, heke desthelatdariya welêt wek xwe bimîne çaverê nayê kirin ku Çîn wek welatekî ku Mao û hevalên wî jê hevî dikirin bimîne çimkî bikarhanîna teknolocîya rojavayî û zêdekirina demokrasîyê dê rê li hevîyeke wisa bibirrin, û ji nuha ve va yeka diyar e, bi taybetî li bajarên wek Bêjîng û Şanghay.

Aşkere ye ku şoreşa çînî sêdeke mezin gîhandiye welêt. Dema mirov Çîna îroj bide hember Çîna duh, yan welatekî wek Hindistanê, ev yeka baş diyar dibe. Bêyî guman şîrovekirina rewşê li gor dîtina cîhana rojavayî ne şîrovekirineke rêk û pêk e çimkî şert û mercên li Çînê, hejmara danîştavanên wê û erf û torîyên wan cawaz in. Wekî ez texmîn dikim, têkberina disîplînê û berfirehkirina demokrasîyê li gor modêla cîhana rojavayî dikarin bibin sedema afirandina gelşên mezin li Çînê bi xwe û dikarin herweha bibin sedema wê yekê ku bi milyonan çînî bizavê bikin ku xwe bigihînin welatên wek Australya, Dewletên Yekbûnî yên Emerîka, Ewropa û şûnên din; û tiştêkî wisa dê bibe sedema afirandina kirîzên navneteweyî çimkî van welatan ne amade ne ku cîh bidin bi milyonan penaberîxwaz, bi taybetî penaberîxwazên çînî. Li milê din, rexnegirtina li Çînê ku wê hejmara zaroyan ji bo bav û dayan daye sînorkirin rexneyeke wisa ye ku durûtiya welatên rojavayî diyar dike çimkî ew ji aliyekî ve tîrsa xwe ji zêdebûna hejmara xelkê cîhana me diyar dikin û ji aliyê din ve rexneyê li weltaekî ku hejmara xelkê xwe 1300 milyon e digirin ku dixwaze jiyaneke baştir ji bo wan peyda bike.

Gelo Partiya Komunîst ta çî radeyê rê bide guhertinê, û gelo va partiya ta kengê li ser desthelatdariyê bimîne?! Tenê salên li pêş dikarin bersîvên van şewepirsan bidin.

Di taxên Bêjîng û Tiyencîn de çayxane nînin; hele qehwe tew nayê dîtîn. Tenê di otelên navdar û çend mixazeyên mezin ("plazayên" nûjen) de tu dikarî qehweyê vexwî. Di otelê me de fîncanek qehweya "espresso" bi dora 4 dolaran bû. Lê kesên pereyên xwe hebin dikarin her tiştê li dunyayê heye bi dest xînin. Li her xwaringehê berxwarin bête ser maseyê çayê (ya çînî; wek ya me ne giran e) tête pêşkêşkirin. Çînî bi her tiştî re pirincê dixwin, lê herweha gellek sewzeyî (zêzewata) kelandî. Goştê herî pîrr tête xwarin yê berêz e; dû re goştê ga û çêlekan û dû re yê dewêr. Lê herweha goştê masiyan, mirîşkan, qazan û kerguhan jî pîrr e û goştê segan û maran jî têyên xwarrin. Di xwaringehê de, di nav dora saet û nîvekê de sê mar li pêş me hatin ser-

jêkirin. Garson mar bi zindî tîne û li nêzikî maseyê datîne. Lîngêkî xwe dide ser serê mar û stû dibirre. Dû re beşekî ji wî diguro û yê mayî li piyekî xwe digêrtîne û dibe mirabaxê. Xwîna marî di peyalekê de ji bo mêvanê herf qedirbilind yê li dor maseyê tete pêşkêşkirin û goştê marî li gor daxwazê tete amadekirin, yan di nav şorbeyekê de, yan bi serê xwe li gel tiştine din. Tete gotin xwîna marî ji bo hêz û saxlemiya mirov gellekî bi sût e.

Li Bêjîng û Tiyenjin me gellek leşger li ser taxan nedîtin. Carine komeke ji wan bi talîm di rê de tîyên ditin ji bo guhertina nobetê. Ew leşgerên mirov li meydanên wek Tiyananmin dibîne bêyî çek in û tenê çoyekî kurt (baton) di ber wan re ye. Tenê ew leşgerên li pêş dayîre ne fermî û balyozxaneyan bi dabence ne. Polîsên trafikê şewehîşk xuya nakin û gellek pisîklêr û otomobîl li bervacêya îşaretên wan derbas dibin. Li Çînê leşgerîkirin ne îcbarî ye. Hejmareke mezin ji ciwanan, bi taybetî yên ji gundan da ku fêrî meslekekê bibin yan beşên Çînê yên din bibînin, daxwaza leşgerîkirinê dikin lê tenê hejmareke ji van ciwanan tîyên bijartin li dû îmtîhanên giyanî û ramanî.

Duanzdeh sal xwendin divên ji bo girtina şehadeya lîseyê. Xwendegha navend ji du beşan pêk tê û gellek ciwan beşê duyemîn kuta nakin. Bidestxistina cîhekî di zanîngehan û xwendeghên bilind de dijwar e û pêwîst e xwendekar beşekî ji mesrefê perwerdekirina xwe bide. Kesên belengaz bêyî alîkirina xizman û dostan nikarin xwendina xwe di zanîngehan de bidomînin.

Hêlînen zarokan ji aliyê komîteya civakî ya taxan de tîyên organîzekirin û birêvebirin. Zarok ji saet 7.30 ta 5.30 li van hêlînan dimînin da ku day û bav bikaribin biçin kar. Yên diçin kar pêwîst e perene ji bo lênerîna zaroyên xwe bidin. Van komîteyan hîn îroj jî di civata çînî de roleke mezin dileyizin. Yek yan du endamên van komîteyan ji aliyê hukmatê de tîyên tesbîtkirin û meaşên xwe ji dewletê digirin, yek ji endaman mamûrekî polîs e û endamên din ji jin û mîrên di teqawîrê de ne ku hindêk caran tîyên hebijartin. Hindêk ji van komîteyan karê paqîşkirina taxê, pîrsa tenduristiyê, heta pîrsa asayîşê (emniyetê) jî hildigirin ser milên xwe. Bi hilweşandina taxên kevin û lêkirina bîneyetên bi apartman re rola van komîtiyan dijwar dibêye, lê li gel wê jî van komîtiyên civakî hîn hene. Pîrsa parastina bîneyet û şûnên kevin li Çînê yeke nû ye. Hindêk profesorên zanîngehan dest pê kirine daxwaza parastina bîneyetên kevin bikin. Karkerên çêkirina rê û lêkirina xaniyan, li bervaciya hindêk welatên pêşketinî, hîn hacet û metodên kevin bi kar tînin, lê li şûnên wek Bêjîng di dema lêkirina bîneyetên bilind de hindêk hacetên nûjen di kar de ne. Li Bêjîng bi xwe guhertin û "pêşveçûneke" pirralî heye, li her derê bîneyetên nû tîyên lêkirine.

Şûnên kevnar li Çînê pîrr in. Dîwarê Mezin wek yek ji "ecayîbên dunyayê" tete he-sibandin. Beşine dîwêr bi sedan sal berê hatine çêkirin û beşên din ji aliyê padîşahên

cuda de harine lêkirin. Dirêjîya dîwêr 5000 kîlometir e û ji deştan bigir heta serê çiyayên dîkîşê, lê hindek beşên wî hilweşiyane. Li Bêjîng û şûnên din gellek koşk, heykel, cîhên olî û baxçeyên kevnar û navdar hene. Yek ji cîhên mathîştîne li Bêjîng "Bajarê Qedexê" ye. Tê de bêtir ji 9000 ode hene. Li vir tenê padîşah, jin û carîyeyên wî, endamên malbata wî, wezîr û mamûr û serekhezên wî diman, ... Tê de xanî û kevneşopên bi nex hene. Bajarê binerd jî cîhekî balkêş e. Ev "bajar" di navbera 1969 an û 79 an de hatiye lêkirin, bi fermana Mao û bi encama neyartîya di navbera Çînê û Yeketîya Sovyêtî de. Tirs ji hêrîşên firroki, yan tew noklêrî hebûye. Tunelên bi dirêjîya 25 kîlometiran cîhine li navenda bajarê digihînin cîhên din. Bi sedhezaran mirov dikarin bi hêsanî di van tunelan re xwe bigihînin şûnên din. Herweha cîhên civînên qumandaran, razana leşgeran û dayîreyan di "bajarê binerd" de hene.

Bi gotina daniştvanekî Bêjîng, sîstema helbijartinê li Çînê yeke tevlihev e. Pîrraniya xelkê yê digihên şûnên bilind nedinasin. Hemwelatî mirovên ji devera xwe heldibijêrin, van kesan hindekên din ji bo herêma mezînd heldibijêrin û vayên dawîn endamine ji bo bajarê heldibijêrin û yê bajarên dengên xwe didin endamên wîlayetê, ... û herweha. Serdarên şûnbilind digihên desthelatdariyê bêyî ku mirovê adetî bizanibe ew kî ye û çawa gihîştîye wir, li gor wî.

Berê karkerê çînî divabû hefteyê şeş rojan kar bike lê ji gulana 97 an û vir de hefteyê pênc rojan û rojê heyst saetan.


Saldema çînî li gor hîvê ye. Sersala îsal di 28 ê heyva yekem ya zayînî de dest pê kir. Her duanzdeh sal wek çerxeke demîn tîyên hesibandin. Van salan li gor navên heywanîne tîyên binavkirin: Sala Mişk, Sala Gê (gayî), Sala Piling, Sala Kêrguh, Sala Êfrîr (Dragon), Sala Mar (mêir/marî), Sala Hêsp, Sala Bizînê, Sala Mèymûn, Sala Kerê, Sala Kêleşêr (dîk), Sala Sêg û Sala Berêz. Di 28 ê heyva yekem ya îsal de Sala Piling dest pê kir.

Bawer nakim gellek çînî di derheqê kurdan de agahdar bin. Ji ewên ez li gel wan axftim tenê yekî navê kurdan bihîstibû, ew jî li dû ku min behsa şerê Kendavê kir û gote wî, heke wî wê demê bi hezaran penaberên derketinî ser çiyayê di televizyonê de nedîtibin.

Heye ku mirov bikaribe bibêje ku Çîn cîhaneke bi serê xwe ye, lê sal bi sal ew jî, bi taybetî bajarên wê yê mezînd, ji cîhana mezintir nêzîktir dibine. Teknolojiya nûjen, satelît û bazirganiya navneteweyî dê wê jî bikin beşekî ji gundê gerdûnî ku wek "GLOBAL VILLAGE" tete binavkirin. □

(Sydney: 2/98)

Notên Yekî Dinyayî (1)



Digel ku Özkan Mert bi salên dirêj li derveyî Tirkiyeyê, li Swêdê jiyaye jî, dîsan ew yek ji şairên Tirkiyeyê yê bijarte tête hesibandin. Heta niha nêzîkî deh pirtûkên wî derketine. Ew niha li Swêdê dijî û di ber şairtiya xwe de di beşa tirkî ya radyoya Swêdê de dixebite.

Me ev şîra wî bi daxwaz û destûra wî wergerand kurdî.

ÖZKAN MERT

I.
Min deftera xwe ya adresan bir Pekînê
Zarokên yekî şebeşfiroş
li ser radizin. Bi şev,
wek qedîfeyê reş
diheje bi mijankên wan ve.
Ez tim li dûr im ji xwe
li nabera Napolî û Rio de
li kuçeyekê
Ez li tiştên ku kevir ji hezarsalan ve
dibêjin guhdarî dikim.
Hevalê min ê herî pêşî
bexçeyekî sêvan
ku berê binê deryayê bû

û ez yekî biçûk ê dinyayî
ku di bin baskên çûkan yên germ de
digeriya bûm.
Parkek li wir hebû
hêlanên wê nû hatibûn boyaxkirin
û keçikeke fediko,
ji memikên wê yên hûr
bêhna kerikan dihat...

2.
Pekîn! Bêhna şorbê jê tê her sibehê
Bi parkan û ewran ve dimînin
bi milyonan siwarên duçerxan
Toreke masiyan
xwe rast dike
ji bo ku tev li merîdyenan neyê kirin.
Şûra Çînê zirfirirokeke mezin e
razaye li ser çiyên wilo ketî.
Ez tim li dûr im ji xwe
li meyxaneyekê
li navbêra Pekîn û Izmîrê
ez bi keçikên Çînî re henekan dikim
ez bi dinyê re yariyan dikim
Ji ber vê yekê jî sûretê min
daliqandiyê bi hemû çeman ve
Li min digerin
Ez zanim bi dû şopa min de ne
wê min bigirin rojekê illehî.

Ha va ye!
Binerin ez va li ber we me
li ser piştê
ciwanîyekî reş im
bi berstuka min ve
guleke
kovî

Notên Yekî Dinyayî (2)

1.

Lênûsa min a adresan
di atlantîkê de sobayê dîke
çiyayên agirîn li ser in
û albûmeke kevnar: sûretên min
hemû rijiyane deryayê
Râyê min
di nava gola Wanê
û atlantîkê de veziliyaye
bi kêreke sûsteyî qul û xir û xopan e
çûk tê re difirin
Her demê tê zanîn bê ez li ku me
gava min bi peyvekê esrar dikişand
Sibeha ku min li Borneoyê
bi qereçiyên deryayê re
zina dikir û ez hatim girtin
ji xwe tê zanîn.
Gava min wek keleşekî çog didan çiyên
ewr li ser milên min hûr dibûn
Devera ku ez ê xwe herî dawî lê veşêrim
bexçeyê ku bi dû keştiyê de dibezin e
Ez zanim bi dû şopa min de ne
wê min bigirin rojekê illehî.
Wê ne bi desmaleke reş
lê bi dengê çûkan bigirin çavên min
Wê bistîka guleke bi dirî
bilîze di nav lêvên min de soxî

2.

Deftera min a adresan
di derya reş de sobayê dîke
li bajarekî ji dinyê hatiye veşartin: Odesa
Li bûlwara Prîmorsky
di paca xwe ya li ber tava hîvê de
dinere Çexov
Di derencên navdar
yên zirxiya Potemkîn de
erebeya zarokan hîna jî digindire

Li bara orela Londonskaya
bi qedehên konyakê duello dike Pûşkîn
Li kuçan, qîzên biçûk
xwe didin ewrûpiyan
bi şûsakî şampanya navdar
a Odesayê: Zeman.
Odesa wek guleke li ber pacê
xuya dike.

3.
Deftera min a adresan
li Venedîkê
bi gondolekê ve kelemçe kirin:
Darên alûçên qedexekirî
û duşemên zerbûyî tê de hatin dîtin.
Penguen bi tiramvayan ketine helbestên min
-Penguen
Ew çawa karin têkevin helbestan?
Nayê zanîn!

Û nayê zanîn
tiştên ku dolabeke biçûk
li gundekî çîyan digotin.
Ez zanim bi dû şopa min de ne
wê min bigirin rojekê illehî.
-Lo dinyayîyo! Me şopa dilê te dît.

4.
Ha va ye!
Binerin ez va li ber we me
ez
li ser pişt a ciwaniyekî reş im
bi kabokên min ve
ewr perçe dibin
bi berstuka min ve
guleke
kovî

Notên Yekî Dinyayî (3)

1.

Deftera min a adresan li Swêdê girtin
li newalên wê yên bi berf
 xezal dibezînin
Bi daristaneke ku hildiçene
 ez navê wext lê dikim
ez bi fira çûkan
 nêzîkî dinyê dibim
Rûyê min ê ku di nav deryan
 û otobusan de mayê
 nayê xwendin.
Ez ji gellekî zû ve ye li vir bûm
 min çemek li pişta xwe pêçabû
 û bi bivirê xwe yê kevirî
 masî digirtin.

Li ser dîwarê şkeftan
 hîna germa destê min heye
Ji wî çaxî ve li min digerin
Ez zanim
 wê min bigirin rojekê illehî
Wê bi dargerînkên
 destên min girêbidin.

2.

Em hemû girtiyên tiştinan in
Di nava me hemûyan de
 kuçeyên zirav difitilin
û hewaleyên baranlêhatî ên zaroktiya me hene
Xortaniya me ya ku diherike u diçe
 di rengê şampanyayê de
ne dilopên xwîna dilê me ne
 pelên gulan
Mamostê min ê çavşîn ê cebîrê
 ku her demê sifir dida min
xoşevîsta min a dibistana pêşî
û hevalê min ê wek şêrekî, Ehmed,
 hûn ketin bexçeyê vê helbestê
Hûn bi xêrê hatin!

3.
Lê her demê tê zanîn bê ez li ku me
Ez li Parîsê xwazgîniyê rojê yê herî pêşî me
belkî ez bi sibeheke Lîzbonê re me
ji ber dengê saksafonan
 di nav xwêdanê de ye laşê min
Ez li ser piştê ciwanîyekî reş im
 şewqeyê ji sarê ye li serê min
ez bi hizneke di tahma lîkorê de qayîşê dikêşim.
Ez zanîm,
ez herim ku, ew li min digerin
wê min bigirin rojekê illehî
-Lo dinyayîyo! Me şopa dilê te dît.

3.
Ha va ye!
Binerin ez va li ber we me.
Ez li çî çiyayê gava ku ez dîtîm
qutikê xwe yê sipî ji xwe kirin
 li bendî
 we me
bi berstuka min ve
 guleke
 kovî.

Wergera ji tirkî: SÜLEYMAN DEMİR

SERPÊHATIYÊN HAYQAR

Peyvên di biçûkayê de wek neqşên li kevîran in, zûbizû ji bîra meriv narin.

Di dawiya salên 60î de min navê Metran Hanna Dolabanî bi pirtûka "Mardîn Tarîxî" bihîst. Li gora di bîra min de maye, Nivîskêr di wê pirtûkê de, behsa tarîxa Kurdistanê kiriye. Piştî 30 salî, dema 15 salên min li Swêdê di mişextiyê de buhurîn, min ji dostekî xwe pirsra Metran û pirtûka wî kir. Dostê min Îlyas, li ser pirsra min, soz da ku wê pirtûkê ji min re peyda bike. Îlyasê hêja, piştî demekê bi xanima xwe re hat mala me, bi xemgîniya peydanekirina wê pirtûka ku min dixwest, ji bo ku destivala bi ser min de neyê, pirtûka "Serpêhatiyên Hayqar" ya Metran Hanna Dolabanî ji min re anî. Ev pirtûk jî wek ya din bi tirkî bû. Min ev serpehatiya xwend. Çend tiştin wê bala min kişand:

Ji aliyekî pirtûk wek, "Kelîle û Dîmne" û "Zerdûşt Weha Kerem kir", bi aforîzma, pend û peyvên bi mane hatibû xemilandin, ji aliyekî din ve bûyer, li Mezopotamyayê ku bendera gelan e, derbas bûye. Digel ku zimanê pirtûkê yê tirkî ne gelekî xweş bû, belê ew tirkîya ku pê hatiye nivîsandin, ji yekî ku li devera Mêrdînê mezin bûbe re ne hinde zahmet bû jî. Min bala xwe dayê ku gelek pendên beriya 2700 salî, îro jî ji gelek kesan re pêwîst e ku lê guhdarî bikin û li pê wan bimeşin. Ji milekî din ve, erê bi navê Aramî ye, lê belê tore û kultura gelên devera Mezopotamyayê teva di nav wan pendan de tên dîtin.

Gava min pirsra Metran Hanna Dolabanî kir, dostekî suryanî Sulêman, ji Tûr Abidînê navê Xûrî İbrahîm Aksan û telefona wî da min. Sulêman ji min re got:

-Tu ji xwe re telefonê ji Xûrî re veke, navê min nebêje, eger tu qebûl kir, ew dikare li ser Hanna Dolabanî agahdariyan bide te.

Min telefonî Xûrî İbrahîm kir, çîroka xwe jê re darvekir, kêfa wî gelekî hat û

me li ser em ê kengî hevûdû bibînin. Li hev kir. Di dema me li hev kiribû de, bi qevdek gul, ez çûm serdana Xûrî yê 87 salî. Di destpêka peyivandina me de; Xûrî Ibrahîm xwe da naskirin, derbarê ol û komela (civata) suryaniyan de agahdariyên hêja dane min. Min dengê Xûrî tomarî benepeyvê kir. Ji devê Xûrî Ibrahîm Aksan;

Metran Hanna Dolabanî di 27ê êlûna 1885an li Mêrdînê hatiye dinyayê. Xwedê li gora dilê wî dayê di 9ê meha 11an sala 1908an de Sikûmê Rahîban (Cilên reş yên namzêdên ruhbanîyê. li xwe kir). 9 salan Şervoyo- Dêyroyo (Tercûbeya li dêran ji bo namzêdên, ku dikarin bibin rahîb yan na) ma, bi cilên reş xizmeta dêrê kir, sala 1918an bû Kahin (Ruhbanên ku dikarin ayinan birêve bibin û li pêşiya cemaatê nimêj bikin.) Li muqabilê Dêra Zahferanê, di Dêr Seydê de, 6 salan bi serê xwe jiyana Munzewî kir (kete xewlxanê). Di pişt re çû Edenê 4 Salan mamosteyî kir. Mêrdîniyan çûn ew ji Edenê anîn û ew birin Metranxaneya Erbaîn ya Dêra Zahferanê. Di sala 1946an de bûye Metran. 22 salan metranî kir. Di nav xelkê deverê de gelekî bi nav û deng bû, herkesî rûmeta wî digirt. Sê çaran felcê lêdaye, bi lêdana cara çaran, meha 10-11an sala 1969an çû rehetê. Gorra wî li Dêra Zahferanê ye. Li dora 100 pirtûkên wî he ne.

Pile û mertebeyên ruhbanîyê yên Suryanî Ortodoksan:

- 1-Şemmas
- 2-Baş Şemmas
- 3-Papaz
- 4-Baş Papaz= Xûrî
- 5-Isqif.- Patrik, yanî Metran nazewicin. Papaz (Keşe) eger jina wî bimre, cemaat dikare pileya metranîyê bidêye. Di vê rewşê de dibe Isqif.
- 6-Metropolît
- 7-Mafiryan
- 8-Patrik= Metran

HEMÎD KILIÇASLAN

Stokholm 15/6/1998

HAYQAR KÎ YE?

Hayqar, katib û şahyar (wezîr) û mohrdarê qiralên asûriyan ku jê re Şerkino-yên (1) z ê jî dibêjin, Serhaddum (2) (b.z.722-705) û Senharîb (3) (b.z.705-675), filozof û dadmendekî mezin e. Di dema van qiralan de bi dilpakî kar ji dewleta xwe re kiriye. Bi pend û şîretên xwe re bi serketina di şerên ku beşdarî tê de kiriye û bi xelatên ji serekan, bi talanên ji şer, gelekî dewlemend bûye. Lê ji ber bêdûnde bû, xwarziyê xwe ji xwe re pêsikand, kire warisê xwe. Xwarziyê xwe di hebûnê de mezin kir, piştî bi zanîn û edebê perwerde kir, girtin û berdana mal û mulkê xwe da destê wî û li şûna xwe kir şewirdarê qirêl. Xwarziyê wî Nadan li şûna ku rêzdariya salmeziniya (xalê xwe) Hayqar bigre û li pê pendên wî bimeşe, ji ser xwe çû, ket bin bayê payebilindiyê û bi zewq û sefayê daket. Bi rêyên ne durust li wendakirina Hayqar geriya. Nadan heta bi bêbextiyekê li berdakirina xalê xwe Hayqar geriya. Li ser vê bêbextiyê, Senharîb (685 b.z.) biryara berdakirina Hayqar da. Celadê ku biryar hate destê wî, ji ber ku dostê Hayqar bû, ew nekuşt, di binê erdê de cî jê re çêkir, veşart.

Ji ber ku Hayqar di birêvebirina karê dewletê de pirr jîr û zana bû, dema navê kuştina Hayqar belav bû serdarên dewletên cîran kêfxweş bûn. Mîrê Misrê, bi bahaneyekê ji Senharîb re qasid şand, mirovekî ku bikaribe di navbera erd û ez-mên de, koşkekê ava bike, jê xwest. Wê demê kiryarên Hayqar yên hêja û mezinaya wî hat bîra Senharîb û li kuştina Hayqar poşman bû. Celad, gava heyret û jovaniya Senharîb dît, jê re got; Hayqar sax e. Kêfa qirêl hat û ew ji cihê lê veşartî da derxistin, şande Misrê. Kêfa melikê Misrê ji peyvên Hayqar re hat, rûmeta wî girt û ew li welatê wî vegerand.

Bi kurtî çîroka Hayqar ev e. Gelek mesele û pend tê de hene. Di 500 saliya berî zayinê de, ev çîrok li Misrê hate dîtin, lê peyvên bi hîkmet bi tenê bûn. Di wergerandina 70 î de, di pirtûka Tûbiya de navê Hayqar peyda bûye. Peyvên bi

hîkmet Şirahoglu tev li pirtûkê kir (9:9)

Di zoo saliya beriya zayinê de, Bosidoniyaz navê wî aniye zimên. Peyvên wî yên bi hîkmet, Demokrît wergerand yunanî, Loqman Hekîm û Osep (4) çîrokên xwe ji vê pirtûkê wergirtine.

Numûneya bi suryanî ya vê pirtûkê, li pirtûkxaneyê Kembrîçê, bi jimara 2020 î, li weşanxaneyê Brîtanî bi jimara 750 peyda dibe. Weşana wê yî bi suryanî cara yekê Madam Simit, di sala 1898 an de (derxist).

Mebesta me ji belavkirina bi tirkî; da mirov herdem xwe bidin qencyê û ji nankoriya Nadan birevin. Ji bo ku ji aliyê kesên din de, payebilind bin, divê bi edeb û peyvên bi hîkmet yên bav û bapîran bêne xemilandin.

M. H. DOLAPÖNÜ

15. 6. 1961

- (1) Şerkîno: (Sargon'II)-722-705 b.z
- (2) Serhaddum: (Assarhaddon)-681-669
- (3) Senharib : (Sennaherib)-705-681
- (4) Osep : Esop

ÇÎROKÊN HAYQAR

Di 20 saliya katibiya qiralê Asûr û Nînowayê, Senharîbê kurê Serhadum de, ez, Hayqar, hê xort bûm, ji min re gotin zarokên te çênabin. Ji bo ku ez gelekî dewlemend bûm min 60 jin anîn, ji wan re 60 koşk ava kirin. Min dît ku zarokê min çênebûn. Min perestgeheke mezin ava kir, agir li hundurê wê gurmujand û hêviya xwe pê ve girêda û dua kir;

"Ya Xwedayê min, ku ez bimrim û kurekî min tunebe, wê xelkê çi bêjin? A vaye Hayqarê qenc û dadmend û ji Xwedê ditirsiya jî mir. Ji bo gorkirina xwe ne kur û ne keçek li pê xwe nehişt. Wek Meûn mîratxurekî malê wî tune. Ez li ber te digirim, ya Xwedayê min, bila kurekî min hebe! Gava ku ez mirim bila axê bavêje (ser) çavê min" Di pê van gotinan re deng hate min;

"Ya Hayqarê nivîskar û hakim! her tiştê te xwest, min da te, lê belê ez te bê dûnde dihêlim, li ber nekeve. A waye kurê xweha te Nadan, bila bibe kurê te. Gava mezin bû tu dikarî wî fêrî her tiştî bike." Dema min ev bihîstin careke din ez li ber Xwedê geriyam;

"Ya Xwedayê min, Tu xwarziyê min Nadan bi kurîtî dide min ku dema ez mirim axê bavê çavê min!" Ji ber min tu bersiv wernegirt, min stuyê xwe li ber emrê Xwedê xwar kir. Min xwarziyê xwe Nadan wek kurê xwe pêsikand, ji ber zarok bû, min ew da 8 daşîran. Bi hingiv xwedî kir, li ser xalîçeyan vexist, hevirmêşên erxewanî lê kir. Kurê min mezin bû, wek dara êrvist(çam)ê bejin avêt. Min fêrî her zanîne kir.

Dema qiral ji seferê vegeriya, ban min kir û got; Hakim, nivîskar û şewirdarê

min Hayqar, ger tu pîr bû û mir, kî yê wek te xizmeta min bike? Bi bersivdana xwe re min got; Herûher tu hebe ya qiralê min. Kurekî min weke min zana û bi hîkmet û fêrî karê nivîsandinê buyî heye. Qirêl got; "Ka wî bîne, ez bibînim. Eger bikaribe li ber min raweste, ji bo ku tu temenê xwe yê mayî di îstîrehetê de bibuhurîne, ez ê te serbest bihêlim."

Wê gavê, min çû kurê xwe Nadan anî huzûra qrêl. Gava qiral çav lê ket, got; "Îro li huzûra Xwedê pîroz be!(şabaş ji Xwedê re), Hayqar xizmeta bavê min Serhaddum û ya min kir, gîhaşt haqê xwe. Di saxiya xwe de kurê xwe anî, li ber dergehê min rawestand, bila vêca ew îstîrehet bike."

Di pê re min Hayqar, ji qrêl re; "Herûher bijî qiralê hêja. Wek heta nuha min xizmeta te û ya bavê te kiriye, ji nuha û pê ve kurê min jî dê xizmeta We bike, bi tenê bêhna xwe bi xortaniya wî re fireh bike ku lutfê te li ba min bibe du qat." Gava qrêl ev gotin bihîstin, destê xwe yê rastê da min û ez jî, Hayqar, min xwe ji qrêl re tewand û berê xwe da malê. Di perwerdekirina kurê xwe de xebitîm, heta ku weke nan û avê bi zanîne têr kir, min jê re weha got:

- 1- Nadan, kurê min, guhê xwe bide pendên min. Peyva min wek peyva Xwedê bila di bîra te de be.
- 2- Nadan, kurê min, ger te peyvek bihîst, di dilê xwe de veşêre. Nebî ku di de-
vê te de bibe bizot û agir û te dax û şermezar bike. Ji ber vê, li rûkala dunyê,
tu dilşikên bi, ewê Xwedê li te were xezebê.
- 3- Kurê min, her tiştê te bihîst nebêje û tiştên te dîtin eşkere meke.
- 4- Kurê min, girêka mohrkirî vemeke û ya vekirî mohr meke.
- 5- Kurê min, çavên xwe li jinên xemilandî megerîne û dilê xwe mebijîne çavbi-
kılan. Ji ber tu her tiştên xwe bidêyê bê fêde ye û (tu) li ba Xwedê gunehkar
dibî.
- 6- Kurê min, bi jina hevalê xwe re zinê meke, dibê ku hinek jî bi jina te re zinê
bikin.

- 7- Kurê min, wek dara behîvê lezê meke ku berê kulîlka vedike û dawiyê tê xwarin. Lê wek dara tuyê ku dereng ber digire, zû tê xwarin, erzan û şêrîn be.
- 8- Kurê min, li jêr binere, dengê xwe nizm bike û yên li jêr bibîne. Eger bi dengê bilind awayî (xanî) bihata çêkirin, dê kerê rojê du xanî ava bikira. Eger bi qewetê cot bihata kirin, (hencar) halet ji pişta devê (hêştir)ê nedihat vekirin.
- 9- Kurê min, bi merivên zana re gêrkirina keviran ji badevexwarina bi cahilan re baştir e.
- 10- Badeya xwe birijîne ser gorra qencan, lê bi mirovên gunehkar re vemexwe.
- 11- Bi merivên xwedan hîkmet re heneka meke, xwe bi pêkenokan xwedî hîkmet nîşan mede.
- 12- Bibe hevalê merivên xwedî keramet ku tu jî wek wan xwedan keramet bî. Bi kesên rûşuştî (bêşerm) û zimaşayik re mebe hevrê, da ku tu wek wan neyê dîtin.
- 13- Kurê min, heta ku pêlav di piyê te de be, pê li sitiriyên bike da ku tu, rê ji kurên xwe û neviyên xwe re xweş bike.
- 14- Kurê min dewlemend maran bixwin, wê bêjin derman e. Lê ku feqîr bixwin wê bêjin ji birçîna ye.
- 15- Kurê min, para xwe bixwe, dest neavêje ya hevalê xwe.
- 16- Kurê min, bi bêaran re nên jî mexwe.
- 17- Kurê min, bi kêfxweşiya kesên ji te heznake xemgîn mebe, bi xemgîniya wan şa mebe.
- 18- Kurê min, nêzîkî jinika dengê wê bilind mebe.

- 19- Kurê min, li xweşikbûna jinê megere û dilê xwe nebijînê. Ji ber, xweşikbûna jinê kêfa wê ye û peyva devê wê xemla wê ye.
- 20- Kurê min, yên ku ji te hez nakin, ger bi xerabî werin te, tu bi qencyê bersiva wan bide.
- 21- Kurê min, merivên gunehkar bikevin ranabin, kesên pak nakevin, lewra Xwedê bi wan re ye.
- 22- Kurê min, kurê xwe ji cezadanê bê par meke, lewra; ceza ji bexçan re wek zibil e û ji keran re wek pêwendê bi piyên wan ve ye.
- 23- Kurê min, ji bona ku tu ji ber kêmaniyên kurê xwe şermezar nebe; beriya, ji te xurtir, li ber te rabe, dema zaro ye, wî bigre.
- 24- Kurê min, hayê te ji gayê raketî û kerê simdirêj hebe. Guh mede qûlên revok û cariyeyên dizek.
- 25- Kurê min, gotinên merivên derewîn wek çivîkên qelew in, bi tenê bêhiş wan dixwin.
- 26- Kurê min, nifirên dê û bavan li xwe nîne, yan na tu bi bextewariya zarokên xwe şa nabe.
- 27- Kurê min destvala bi rê de meçe, lewra; tu nizane kengî dijminê li te rast bê.
- 28- Kurê min, wek dar bi şax û berê xwe, daristan bi darên xwe dixemile, mêt jî bi jin û zarokên xwe dixemilin. Mêrên bê bira, jin û zarok li hemberî neyaran şermezar û bêqîmet in. Wek dara li devê rê ne. Her rêwî berê wê dibin û her lawir pelên wê diweşînin.
- 29- Kurê min, mebêje, ez zana me û mezinê min nezan e, ancax, tev li kêmaniyên wî, rûmeta wî bigire da ji te bê hezkirin.

- 30- Kurê min ta ku tu kesên din, tu hozan ne hesabandin, tu xwe hozan mehesibîne.
- 31- Kurê min, ji bo tu kêr neyê dîtin û rû bi rû ji te re nebêjin, ji vir here; di huzûra mezinan de derewa meke.
- 32- Kurê min, bila tu rastgo bî da ku mezinên te bibêjin, were vir û aferim!
- 33- Kurê min, di roja tengayê de kufuriya bi Xwedê re meke. Ne be ku dengê te bibihîze û li te were xezebê.
- 34- Kurê min, ji hevalê xwe zêdetir qenciye bi xulamê xwe re meke, di dawiyê de tu nizanî kî dê bi kêrî te bê.
- 35- Kurê min, kûçikê ku xwediyê xwe bihêle û li pê te were, bi kevîran berdê.
- 36- Kurê min, keriyên ku rêyên (rêberên) wan pir bin, dibin xwarina guran.
- 37- Kurê min, di ciwaniya xwe de dadmend be, da ku tu di pîrbûna xwe de bi şeref bî.
- 38- Kurê min, bila zarê te şêrîn be û vekirina devê te bi kêf be. Dêla kûçik nan didê, devê wî cezayê didê.
- 39- Kurê min, ji bo hevalê te pê li stuyê te neke, piyê xwe meke bin piyên wî.
- 40- Kurê min, bi peyvên hozanî li merivê fermanîdar bide, tu bi daran li bêaqîlan bide ne xema wî ye.
- 41- Kurê min, tu (ger di ber xwe de) merivên hozan bişîne, şîreta lê meke. Bêaqîlan meşîne, tu here!
- 42- Kurê min, kurê xwe berê bi nan û avê nasbike, di dûre mal û sewalê xwe bispêrê.


- 43- Kurê min, ji bo serê te neşkê, ji dawetan beriya herkesî vegere. Li bende gulavên bêhnxweş nemîne.
- 44- Kurê min, yên xwedîmal hozan, yên desteng gunehkar û qels in.
- 45- Kurê min, min xwê hilgirt qurşûn gêr kir, lê min, ji dayîna deynê ku meriv nekiribe girantir nedît.
- 46- Kurê min, min hesin li pişt xwe kir, kevir gindirandin, lê bi min ji zavayê li mala xezûrê xwe bimîne girantir nehat.
- 47- Kurê min, kurê xwe hînî tîbûn û birçîbûnê bike da wek bi çavan dîtîyê malê îdare bike.
- 48- Kurê min, çavkor ji dilkoran bi xêrtir in. Lewra, yê çavê wî nabîne zû fêrî riya dibe û pê de dihere. Dilkor ji riya rast derdikevin.
- 49- Kurê min, navê baş ji birayê dût û dostê nêzîk û xweşîkbûnê bi xêrtir e. Lewra, navê baş heta û heta ye. Xweşîkbûn diçilmise, tê guhertin.
- 50- Kurê min, mirina mirovê rihetiya wî tune, ji saxbûna wî bixêrtir e. Qêrîna di guhên bêaqilan de ji stranê baştir e.
- 51- Kurê min, simê di destê te de, ji zeyta di beroşên wekî din de, mîha nêzîk, ji çêleka dût, çivîkekî di destê te de, ji hezarên difirin, feqîrê dide hev ji dewlemendê belav dike, qutikê ris yê li te ji hevirmêşê li wekî din, bi xêrtir e.
- 52- Kurê min, peyva xwe di dilê xwe de bihêle, ji te re baştir e, lewra bi guherandina gotina xwe tu yê dostê xwe wenda bikî.
- 53- Kurê min, heta tu di dilê xwe de nepijîne, bila peyv ji devê te dernekeve, ji ber lukumandina di dil de ji lukumandina zimên bi xêrtir e.
- 54- Kurê min, gava te gotinek xerab bihîst, heft erîna kûr di bin erdê de veşêre.

- 55- Kurê min, tu li xirecîrê rast hat, lê ramewest e, çûnkî ji xirecîrê mirin dertê.
- 56- Kurê min, kî rast haqiyê nede, Xwedê tîne xezebê.
- 57- Kurê min, ji bo ku dostê te nehat hawara te, ji dostê bavê xwe bi dûr mekeve.
- 58- Kurê min, mekeve nav bexçê malmezînan û bi dora qîzên wan mekeve.
- 59- Kurê min, di huzûra axayê xwe de, alîkariya dostê xwe bike da li ba şêr (mîr) ew jî alîkariya te bike.
- 60- Kurê min, bi mirîna dijminê xwe kêfxweş mebe.
- 61- Kurê min, tu li mirovê ji xwe mezintir rast hat, bisekine û silavê lê bike.
- 62- Kurê min, kengî av bê war rawestiya, çivîk bê bask firiya, qijalk wek berfê sipî bû û talî wek hingiv şêrîn bû, wê demê cahil jî dibin hakim.
- 63- Kurê min, tu weliyê Xwedê be, dîsa xwe jê biparêze, bi paqijî here huzûra Wî û di ber Wî re meçe.
- 64- Kurê min, tu jî rûmeta yê ku Xwedê dabiyê bigre.
- 65- Kurê min, di eynî rojê de (du caran) bi kesekî re mekeve mahkemê. Li ber lehiyê rameweste.
- 66- Kurê min, çavê mirovan wek kaniya avê ye, heta ku ax nekevê ji mêl têr nabe.
- 67- Kurê min, ger tu bixwazî bibî hakim, devê xwe ji derewan û destê xwe ji heramiyê bi dûr bixe.
- 68- Kurê min, tev li xwestin û nîşana jina mebe. Xerab bikeve, tu sebeb e, çê bikeve, tu nayê bîra wan.

- 69- Kurê min, kesê bi lixwekirina xwe xemilandî, bi peyva xwe jî xemilandî ye, kesên bi lixwekirina xwe bêkêr, bi peyva xwe jî bêkêr e.
- 70- Kurê min, tu li huzûra Xwedê jî xizna bibîne, para Wî pêşkêş bike.
- 71- Kurê min, alîkariya mirovên berê têrxwarî û birçî bûye, bike, destê xwe me-de yê berê birçî û têr xwaribe.
- 72- Kurê min, çavê xwe bermede jinika xweşik û li xweşikbûna ne ya te be, me- nere. Lewra, gelek kes ji ber xweşikbûna jinê wenda bûn. Evîna wê jî wek agirê bi pêtî ye.
- 73- Kurê min, bila mirovên zana û hozan bi daran li te bidin û nezan gulyaxê di laşê te nedin.
- 74- Kurê min, bila piyên te ber bi dostên te ve nebezin, dibe ku ji te têr bibe û dostaniya we nemîne.
- 75- Kurê min, ji bo nezan bi te nekenin gava tu feqîr bû, gustîlka zêr meke tili- ya xwe.

Dûmahih di hejmara bê de

Wergerandina ji tirkî: **HEMÎD KILIÇASLAN**



XEWN JÎ QEDEXE NE

SIDQÎ HIRORÎ

Hêriş bi kartêkirina axaftinên dayika xwe yên xweş û dilveker kete nav hizra ji xwe re peydakirina binkofkekê û devberdanê ji jiyana zegorditîyê. Dayika wî gotê:

– Kurê min, ma tu dê heta kengî weha bî? Min jî divê ez te berî mirina xwe bibînim zava û bi van çavên xwe nevkên xwe jî bibînim. Dotmama te hez ji te dike û mamê te jî li hêviya gotina te ye û tu jî hez jê dikî, evca çima tu lezê nakî?

Keyfa wî pir bi wan gotinên dayika wî hat û herweçku dayika wî ya di dilê wî de didît, wî jî got dayika xwe:

– De başe dayê, ez dê hizra xwe tê de bikim. Nuke tu here binve û spêdê jî bo min tiştê çêneke, ez dê biçim bo nik mam Osoyî, ez dê çayekê li cem wî vebixwim.

Spêdê haya dayika wî ji wî hebû de-

ma çû destavê û vegerya û cilkên derketinê kirine ber xwe. Lewma, ew jî ji nav cihê xwe rabû û hat bo nik wî û gotê:

– Kurê min, ez dê bo te çayekê durist bikim..!

– Ne dayê, wî gotê. Min pêxweş e ez evro çayekê li çayxaneya mam Osoyî vebixwim.

Pêlava xwe da ser pêyên xwe û derket. Sehkir seetê, hêj çarêkek bo destpêkirina karê wî maye. Rêka çayxaneya mam Osoyî girt û di hizra xwe de ne yê tena bû. Nedizanî bo çi. Paşî hate bîra wî ku wî xewnek dîtîye, lê hindî hatê ku bibîne bîra xwe ka ew çi xewn bû, lê neşiya.

Gehişt çayxaneyê, kete hundir, berê xwe diditê ku hevalê wî Serdar jî rûniştîye, silav kirê. Bi rex Serdarî ve rûnişt û ketine nav axaftinê. Serdarî pirsyar jê kir:

– Tu çawanî, rewşa te çawa derbas di-

be?

– Baş e, diqede.

– Ez dizanim diqede, lê çawa diqede?

Hêrişî xwest berê axaftinê biguhere, evca got:

– Serdar, min şeva dî xewneka sehîmdar dîtiye û ez hindî di rê de hatim ku wê bînim bîra xwe, lê nehat, heta ku min tu dîtî, ji nû ew kete bîra min. Her çend e dibêjin, wê xewna ku te nevêt bibe rastî nevegêre, lê ez dê wê bo te bibêjim, ji ber ku ya min di xewnê de dîtî çî carekê di serê min de nebûye.

Di wê gavê de mam Oso har hindav serên wan.

– Hûn gelek bi xêr hatin, mam Osoyî got herduyan. Çi pê nevêt, wekî her car, tîrarkekê mastî û du nana û du çayan!

– Manê mam Oso tu dizanî, hewce-nake tu bipirsî, Serdarî got û Hêrişî jî bi serê xwe gotina wî erê kir.

Mam Oso jî çû pey têstê û çayê. Her di eynî gavê de, du zilamên efendî hatin û li ser textê li pişt wan herduyan rûniştin. Serdarî berê xwe da Hêrişî û jê pirsî:

– Ê, de bêje, ka çawa bû?

– Ha ew, çî nemabû ji bîra min biçve, Hêrişî got. Şev bû û em pênc kes bûn. Paxil û binkefşên me tijî belavok bûn. Me cehde û kûlan dan berêk, her ji Girê Basê bigre heta taxa Şêlê, me çî dîwar û stûnkên kehrebê nehêlan ku me poster û belavok pê ve nehilawîstin

û nenûsandin. Li binê taxa Şêlê, min guh li yekî ji hevalan bû dibêje "xwe qurtal bikin, hatin me". Û piştî wî dengî, min xwe dît bi tenê, lê bi rijdî belavok û posteran bi dîwara û stûnkan ve dinûsînim. Lê min, ew kar gelek bi lez û bi tîrs dikir. Ji nişkave ronahiyeka geş kete ser piştê min, terzinkek bi ser laşê min de çû, ez lê zivîm, min dît ku ronahiya laytên pêşiya tirimbêlekê bûn. Min dizanî ku ew polis in û hatine telba min, lew ez bezîm û herdu layit jî bi dû min ve û çî nemabû bigehne min. Nizanim çawa, di wan gavan de, hate bîra min ku min tişteke di berîka qapîtê xwe de hilgirtiye. Ku destê min çû di berîkê de, ket ser narincokêkê. Wê gavê çî nemabû bigehme navzîrka, dema min narincok ji berîka xwe anî derê û havêtiye tirimbêlê û digel dengê peqînê, min xwe ber bi jêr, bo nav zîrka havêt. Ez ji ketinê rabûm û bezîm. Pêstîrkê ez girtim, hilngiftim, ketim û êdî min hay ji xwe nema. Min spêdeyê xwe dît yê li binê dîwarê di nav çemekî de. Dîwar gelek bilind bû. Min bawer nedikir ku ez ji wê bilindahiyê firibûm û çî bi serê min nehatibû.

Hêrişî axaftina xwe birî û sehkirê seta xwe û got:

– Serdar ji destûriya te, çî nemaye bo destpêkirina karî, hema ez bi kuttek vêra bigehim.

– Hema rast here, ez dê para bidim, Serdarî got.

Hêriş derket, çend pêngavan çû û herdu zilamên li ser wî textê li pişt wî û Serdarî rûniştî jî ji cihê xwe rabûn û bi dû wî ketin. Li serê kûlanê, wan rê li Hêrişî girt û yekî ji wan herduyan, xwe pir nêzikî wî kir, bersîng lê girtin û daxwaza pênasnameyê jê kir. Yê din jî li pişt wî rawestiya û devê debanceya xwe jî xist piştê Hêrişî. Hêrişî bi hêbetbûn temaşayî herduyan kir, lêvên xwe miçandin, destê xwe yê rastê dirêj kir berîka xwe, pênasname jê anî derê û da dest yê li ber sîngê wî rawestiyayî. Wî zilamî jî ew jê wergirt, berê xwe dayê û paşî gotê:

– De baş e ka fermu digel me, piçek karê me bi te heye, dê zû bizivî ve.

– Biborin, wextê min nîne, divê ez niha bigehime ser karê xwe. Ez ji karê xwe vemame. Ev, min pênasnameya xwe nîşa we da, evca we çî ya dîtirê ji min divê?!

Lê zilamê li pişt wî rawestiyabû, enya xwe li wî kir girê û bi dijarî lê kir qêrî:

– Devê xwe bigre û zû berî me bikeve bo daîreyê.

Kesê nezanî çî li Hêrişî hat û wê spêdeyê piştî ku ji çayxaneyê mam Osoyî derketî ber bi kîve çû.

Piştî du rojan celbiyên Serdarî jî hatin, wan, ew ji ser karî bir, wan, ew bê çî pirsyar û destûrwestin ji rêberên daîreyê wî ew girt û palpêranan û rahavêtin bo nav tirimbêleka emnê. Serdar her wekî, yekî ava cemîsî li zivistaneka sar lê

kiribe, mit û şaş bûbû, nedizanî mesele çî ye û ka ev girtina wî ji ber çî ye. Di xaniyê emnê de, Efserekî gotê:

– Serdar, em te baş diniyasin û pirsê hemiyê dizanin, evca nehewceyî çî veşartina ye li ber me. Ya te kirî bibêje û bo te bi xwe çêtir e.

Serdar mîna kesekê serlêzivirî, ma bû hêbetî û ji xwe dipirsî "Lo va çî xêr e? Çî qewmiye û wan çî ji min divê û bo çî ye ez kişandîme vê derê?! Wî her bi wê çirîseya mendehoşiyê got Efserekî:

– Bibore, lê ez ténagehim ka hûn behsa çî dikin!

– Ténagehît, Efserekî bi tamsarî got. Tu xwe xişim neke û destên me bi xwe neke. Bo me bibêje ka ew hersê hevalên we yên din kî ne û ka we her pênca ew belavok û narincok ji kîve anîbûn û kê ji we narincok havête tirimbêla polîsan?

Bi bihîstina van hemî tawanbarkirinan cilfek bi Serdarî ket û ma di cihê xwe de neliv û bêcan. Hizra xwe kûr di meseleyê de kir. Heçku wî berî niha jî guh li axaftineka ji vî rengî bûbû, lê tirsê rêya hizirkirinê li ber girtibû û nedîkarî bine bîra xwe ka çî bû û kengî bû. Ya ew jê piştrastbûyî ew bû ku ew ne tirane û henek bûn û ew yê girtiye, di destên zilamên emnê de ye.

– Zû biaxive û rastiye ji me re bibêje heke dê em wê bi serê te binin ya çî dijîmina bi serê yekûdu neanî, Efserekî bi lêheyitîn ev got. Bêje ka we bi çî rêk xwe gehande xerabkara û ev ji kengî were,

hûn vî karî li dijî dewletê dikin?

– Bi Xudê haya min ji çi tiştekê weha nîne. Serdar diveleriziya dema ev digot. Ez ne ew kes im yê ku hûn lêdigerhin, ez bêguneh im, min hay ji...

Lê hêj Serdarî gotina xwe hewnekirî şeq û zillehên şefellih û dehbezilaman dabezîne ser laşê wî û wî êdî xwe nedît. Wî hindî kir qêrî û hawar, lê, ma dê bigehe kî derê. Pêyên wî bi kindirî bilndbûn û patika wî bi tnê ma bi erdî ve nûsiyayî û dirb li dû dirban vewşyane pehniyên pêyên wî. Wî dizanî ew feleqe ye, wî gelek cara guh lê bûbû ku lêdana feleqeyê weha ye, lê ji ber dijwariya êş û janên qutanê êdî wî gelek ageh ji xwe nema.

Wî di nîva şevê de çavên xwe zilkin, di odeyeka teng û tyarî de bû, hemî pa- rçeyên laşê wî bi nale nal bûn. xwest baş hizra xwe di meseleyê de bike ka wî di jiyana xwe de çi kiriye ku li ser bihête girtin, lê çi tiştekê weha nehate bîra wî. Ew ji xwe pişt rast bû ku wî çi cara û çi roja xwe têkilî siyasetê nekiriye û ew ji suhbet û karên ji wî rengî direviya. Ū li dema ku hevalekî axaftinên ji wî rengî li cem bikirana wî digotê "Serê neêşe nehewceyî çi dersoka ye" yan "Heke nebiye gul nebe stîrî jî". Ew di nav van hizr û mabulyanan de bû li dema reşeka dergêh vekirî û Efser bi jor ketî û gazî- kirî wî:

– Hilo rabe, ma xwe tu ne li hotêlê yî. Bêhna min hind fireh e. Tu yan dê

rastiyê bibêjî yan jî tu êdî derveyî vî avahiyî bi çavên xwe nabînî.

Çi axaftin ji Serdarî nehat, lê xwe dît neçar ku careka din bibêje:

– Ez çi ji hindê nizamim. Ez ne ew im yê hûn li dû digerhin. We divê...

Efserî nehişt ku ew axaftina xwe bi- domîne û ferman da reşekên xwe:

– Wî bînin, dirêjkin digel vî ji qesta û bê wec e.

Efser, piştî fermana xwe, derket. Her- du reşekan Serdar ji mila girt û da bera- hiya xwe û palpêranan û bi dû Efserî ve bir. Dergehek hat vekirin, Efser kete hundir û herdu reşekan jî serdar pakda bo nav wê odeyê. Wî li wê derê guh li dengê Efserî bû dibêjeyê:

– Tu, her dibêjî, ez ne ew im û haya min jê nîne, de ka baş berê xwe bide vî kesê li nîva odeyê razayî, ka çi naîne bî- ra te. Pa nê eve yek e ji wan herpêncâ û tu jî yê duyê yî.

Serdarî baş mêze kirê. Kelexekê cil li ber dirhayî û xwînelotkî li nîva mezlekê teraşkiriye û hema bêhna wî serdikeve. Efserî bi pêyekê xwe milê kelexî raha- vêt, berê navçavên kelexî ketine Serdarî. Navçavên wî reş û şîn û werimî bûn. Serdarî çavên xwe lê kirine rik. Di cihê xwe de veciniqî, heçku nû haya wî ji xwe bû. Bi xwe re axift:

– Ev hiştî Hêrişî ye, ev Hêriş e, hema Hêriş bi xwe ye, herê herê...

Bêdeng ma, sehm û tirsê ew girt. Çavên xwe girtin û vekirin. Paşî ji nişkave



bû tîq tîqa wî û berda kenî. Efsêrî bi xeyidîn gotê:

– Tu dikî kenî?! Ya ji te ve tu dê bi xwedînkirinê, xwe ji destên me qurtal biki?

Ew li Efsêrî zivîrî û gotê:

– Nexêr, mebesta min ew nîne, lê heke tu jî rastiya vê serhatiyê bizanî, tu jî

dê biki kenî.

– Bê werbadan û bê hêve û wêve bêje ka çi li nik te heye, Efsêrî ev got Serdarî.

Serdarî jî dest pê kir, bo Efsêrî behsa hindê kir ka çawa li dema wê spêdeyê ew li çayxaneyê mam Osoyî bû û çawa Hêriş jî hat wê derê û bi rex wî ve rû-

nişt û çawa got ku wî xewneka dîtî lê paşt bi çayçîyî ve mijûl bûn û çawa her di wan gavan de du zilam hatin û li ser textê li pişt wan rûniştin. Û her ji çavdîtina yekemîn wî hizra xwe kir ku ew herdu zilam emn in. Herweha ji Efserî re got ka çawa wî piştî hîngê ji Hêrişî xwest bibêje ka ew çi bû û çawa bû. Û ka çawa Hêrişî jî dest bi vegêrandina xewna xwe kir û got: şev bû û em pênc kes bûn. Û vêra çû û xewna Hêrişî ya belavkirina poster û belavoka di nav bajarê de got.

Efserî berê xwe da Serdarî û kelexê Hêrişî. Bêhinkekê hemî man bê deng. Serdarî hest bi xwe kir yê rehet tir piştî ku rastiya pirsê ji wan re gotî û ew dinav xwe de yê pişt rast bû ku dê kêmtîst ev Efser vê serhatiyê fehim bike û dê Hêrişî jî digel wî berbidin. Ji nişkave Efserî hêl pêyê xwe li erdî da û li Serdarî kir qêrî:

– Ya ji te ve tu dê bi hindê xwe qurtal bikî. Li dema ku xişimên wekî te diçûne xapa em bi parzînkên tijî xap dizivîrin ve.

– Nexêr, mesele ew nîne..., Serdarî got. Ew herdu zilamên we, li destpêka axaftina Hêrişî li wê derê nebûn û wan guh li peyva xewnê nebû û, lewma jî ew nizanin ka Hêrişî bi duristî behsa çi di-kir.

Efserî xwe tîrş û tehil kir û got:

– Te rast got, lê feydê te nadit û tu nikarî wê bêxiye di bazinê xewnekê de.

Ev axaftinên te li nik me bi çi naçin û ma nê her hindeka wekiriye, evca ew hindek çi hûn bin û çi kesine din bin feriq nake, her kurd in.

Çi kesekî di bajarê wan de, ku ew nas dikirin, bawer nedikir ku ew herdu kes li ser tiştêkê weha hatibine girtin, çunkî hemî kesên ew nasdikirin ji hindê pişt-rast bûn ku ew herdu kes xwe tûşî siyasetê û kar û suhbetên ji wî rengî nakin û her ji ber hindê jî gazindeyên xelkî ji wan hebûn ku li pirsê gel û welatê xwe bi xwedî dernakevin.

Piştî çar heyvan ji berzebûna wan herduyan, kelexên wan gehiştin malên wan. Çav lê qoqilandî, ezmanê Hêrişî jê vekirî, nînokên dest û pêyên Serdarî jê hillkişandî, pişt û sîngên herduyan ji bilî sotandina bi binikên cigareyan, otî kirî.

Xelkê bajêr bi hindê gelek û gelek he-rişî û di nav xwe de tingijî û ew serhatî bû axaftina navcivatan. Dema ku li çay-xaneyê dibû behsa wan herdu xurtan mam Osoyî digot:

– Mamo ev bêbextiyeka sor û rût e. Lê rast dibêjin "Se se ye çi sipî be û çi reş be" û "Agir ter û hişkî dide berêk".

□

EBDILMECÎT ŞÊXO:

"Werger kilîteke zêrîn e"

Hevpeyvîn: HEYDERÊ OMER

Dr. Ebdilmecît Şêxo nivîskarekî kurd e, xwendina xwe li derveyî welêt xelas kiriye. Nameya doktoriyê di derheqa çapameniya kurdî de, di sala 1988an de, li Lenîngiranda berê xelas kir. Wî du pirtûk ji zimanê rûsî wergerandine zimanê erebî; dîroka lêkolînên zaravayên zimanê kurdî, ya Qanatê Kurdo û kurtedîroka wêjeya kurdî ya Maruf Xeznedar. Dîsan wî berhevokeke helbesvanên kurd ji kurdî wergerandiye zimanê erebî.

Herwisan jî gelek lêkolîn, gotar û helbestên wî, bi du zimanan û di bin pir navan de, di kovar û rojnameyên kurdî de hatine weşandin. Heyderê Omer ji bo xwendevanên Nûdemê pê re sohbeteke berfireh kir.

HEYDERÊ OMER: *Ez bi hêvî me ku danûstandinên me nekeve çarçewek klasîk. Lewre dixwazim bi pîrsekê dest pê bikim, ku ew jî ji zû ve, di serê min de, bi çê bûye.*

Du pirtûkên ku mijarên wan kurdî ne, ev in:

1- *Dîroka lêkolînên zaravayên zimanê kurdî*

2- *Kurtemêjûya wêjeya kurdî, te ji zimanê rûsî wergerandiye zimanê erebî.*

Rola wergerandina vê berheme çî ye? Te çima wergerandiye erebî, lê ne kurdî?

Dr. EBDILMECÎT ŞÊXO: Berî her tiştî, wergerandin, bi hawayekî gelemperî rûdaweke zanistî ye. Rola wergerê, di pêşveçûna civaka mirovahiyê, di dîrokê de pir bilind bûye û dê her dem jî, rola xwe pêşketî bilîze. Heger wergerandin nebûya, şaristani-

ya hemû civakan, dê ne li tengha xwe ya niha bûya. Gelên biçûk û mezin kevn û nû, bi riya wergerê, hevûdu nasdikin û ji ber hev fêr dibin. Li gor vê yekê, divê rewşenbîrên me wergerê ji bîr nekin; yanî ew bixwe kiliteke zêrîn e, dergêhên çand û dîroka gelan vedike. Vêcar ji bo çi me ew du berhem ji zimanê rûstî û ya sêhemîn jî, ji zimanê kurdî, wergerandin zimanê erebî? Bi berhema ji zimanên biyaniyan wergerîne zimanê kurdî, divê ev di pileya yekan de be, wek ku hemû gel weha dîkin. Lê mixabin rewşeke gelê me ya nemaze heye. Neteweyê me çê, xerab, pir gelan nas dîke û rêzdariya hemîyan dîke, lê gelên cîranê me kêr nas dîkin, û cîranên me ji ereb, tirk û faris li ber sedemên rêzanî, me baş nas nakin û hin kes ji wan gelan naxwazin me yekser nas bikin. Lewre em nabînin, ku rewşenbîrên van neteweyan, serên xwe bi ziman û çanda me re diêşînin û karên baş jî, li gor berjewendiya gelê kurd dîkin. Ji bîlî çend kesên pêşverû, ew jî, di nav sê gelên cîran de, bi qandî tiliyên destan tune ne, ji ber vê, kurdên rewşenbîr divê bi riya wergerandina ser zimanên tirkan, ereban û farisan, perda tariyê, li pêş endamên van civakan rakin û xwe bi riya zimanên wan bi wan bidin nasîn. Heger ev yeka baş pêk bê, ez di wê baweriyê de me, ku çarelêkirina pirs û tevgêra me dê hêsantir bibe; yanî bi kurtebirî û bê guman, pirtirîn ronakbîrên Ereba nizanin, ku zimanê me nivîstî heye, nizanin ku em xwediyên edebiyat, çand û kelepur in, yanî dîroka me li ba wan nenas e. Ma gelo heger wisan be, dê çawan mafê me nas bikin û piştgiriya çand û dîroka me bikin? Yanî pênasîna gelê me pir pêwîst e. Lewre me dît ku em ligor kanîna xwe, parake xwe di wergerandinê de pêşkêş bikin.

– *Gava ez bala xwe didim xebat te ya çandî, dibînim ew xebateke pirrengîn e, pirdengîn e...*


Bi taybetî parve dibe ser van xalan: Wergerandin, rêziman, helbest û lêkolîn.

Pirê nivîsevanên me jî wisan in. Ev yeka jî, wek ez dibînim ziyaneke digihîne van kar û xebatan. Bi bawerîya te, sedemên vê yekê çi ne û tu xwe çawan dibînî? Ango kêjan celebê wêjeyê dê digel te berdewar bibe û pirê dema te dagire?

– Bi rastî, bi ya me be, ev yeka han ne ji min re û ne jî ji pir hevalên me yê nivîskar re cihê pir pesnê ye. Lê çima em kurd di vê rewşa ronakbirî de dijîn, ev pirseke pir objektîv e.

Heger em li awêna dîroka gelan temaşe bikin, em dê baş têde bibînin, ku ev tund xuyaya rind belavkirîye, yanî ev zagoneke siruştî ye, ku gel di bin siya vê xuyayê re derbas dibe.

Ji ber ku kîjan netewe dibe, bila bibe, ew jî di demekê de şûnekerî bû, hêdî-hêdî û piştî salan gîhayê tengeha xwe ya niha. Em dibêjin belkî baştir bibe, ku em bi kêmasî nimûnekê ji we re bidin xuyakirin. Va ye hozan Lomonosov, hozanekî rûs bû, ew bi çend şaxan mijûl dibû, ji ber ku ew berî her tiştî welatperwer û rewşenbîr bû, wî nikaribû çavên xwe ji kêmaniyên neteweyê xwe yê rûs, bigirtana. Wî xem û derdên neteweyê xwe dixwar û dikişand, gava wî li derûdora xwe dinêhêrî wî valahiyeke mezin di çanda rûsî de didît. Wî pir kes li meydana çandê nedidît, lewre hesta wî ya niştimani ew ber bi karên têkel û cure-cure têve dida û bi ya me be, ew jî pêwîst bû, ji ber ku hebûn tim ji tunebûnê baştir e û ew hebûna kême, yan zêde ye, baş e yan qels e, ev pirseke din e.



Dr. EMDILMECÎT ŞEXO

– Ji ber hin nîrên taybetî, gelek nivîsevanên me du-sê navan li xwe dikin. Heger xwendevan yekser bi wan nivîsevanan ne nas be, dê nizanibe, ku ev du-sê nav yên mirovekî ne. Rastiyên zanistî derûnî jî teqez dikin, ku şewê û derbirin wêneyê kesitiya nivîsevan û ponijiya wî eşkere dikin.

Ango çendî nivîsevan navên pir li xwe bike jî, dîsan şewê, derbirin û ponijiya wî curek dimînin û ji xwendevanan ve xuya dibe, ku gelek mirov di mirovekî de dijîn; nav pir in, lê kesîtî yek e. Bi baweriya min, ev yeka bendên qelew li pêş birêveçîna toreya kurdî peyda dike, gava du-sê deqên nivîsevanekî; her yek ji wan bi navekî be, bêne

wergerandinî zimanekî biyanî, hingê tesîra vê yekê negatîv, dê bi bêz bête xuyakirin. Ma Dr. Mecîs, di vê babetê de çi nêrîn heye?

– Bi xwe navên mestear ji zû ve hene, sedemên wê jî, her dem tunebûna demokrasiyê, li welatên ku nivîskar tê de dijîn e. Rûpelên dîroka wêje û rojnamevaniyê li cîhanê ji nimûnên wisan pir in, bê guman ev li nav gelên ku ji bo demokrasiyê, ango ji bo azadiya xwe ya neteweyî têdikoşin, pir in. Hema ji te re mînakekê bibêjin; Maksîm Gorkî yek ji wan e. Romana wî ya bi navê "Dayik", romaneke hêja ye.

Yanî bi ya me be, ta ku nivîsevan bikaribe di warê xwe de berdewam bike, diviyabû xwe zû û zû aşkere nekira.

Em werin ser kurdan bixwe, nivîskarên me jî, pir caran neçar bûne navên weha li xwe bikin Celadet Bedir-Xan bi heft, heşt navan bû. Lê em dixwazin sedemeke din ya girîng, bi ser ya berê de bibêjin; ew bi şûndamayîna gel ve girêdayî ye. Nimûne, di dema ku C. Bedir-Xan "Hawar" derdixist de, ma çend rojnamevan û nivîskarên Hawarê hebûn?

Ew bi qasî pêçiyên destan tunebûn, zora giran pir li ser Celadet Bedirxan bû. Lewre wî dizanibû, ku di warê hunera rojnamevaniyê de, çênabe û gelek nebaş e, ku du caran navek, di hejmarê de hebe, ango jî tim û tim navek, ango didu di kovarekê de bêna dîtin. Ev yeka li dijî huner û psîkolojiya rojnamevaniyê ye. Yanî xwendevan nikare pir bi dilxweşî bere navekî here. Heger çiqas ew nivîskar gernas û jîr be jî... Çimkî xwendevan tim dixwazin kesên nû, di rojname û kovaran de nas bikin.

Lê mixabin, bi ya min be, ev dîsan wek min berê nîşan kiriye, ji van herdu sedeman pêkhatiye:

- 1- Tunebûna azadî û demokrasiyê li Kurdistanê.
- 2- Kêmbûna nivîskar û rojnamevanan li Kurdistanê...

– *Lê tevî van rastiyên ku te numakirine jî, ez dibêjin ev pirnavên nivîskarekî dîdine xuyakirin ku pir kes ji nivîsevanan teqlîda hevûdu dikin. Ji ber ku ew berhemên wan jî hevûdu nêzîkî bin, ji ber ku gişt yên yekî ne. Yanî nivîsevan bi navan pir dibin û pêre jî yekser berhemên ku heyamên wan wek hev in pir dibin.*

Lê yên xwedî dengên xweser kêr in. Ev yeka jî dide xuyakirin ku wêjeya me, ne wêjeyeke afirandîye, lê wêjeyeke teqlîdî ye.

Heger em werin ser wêjeya me li Sûriyeyê, em dibînin ew di van çend salên dawiyê de, di tevgereke germ de dijî, namaze jî helbest. Çend navên nû tên guhdarkirin. Lê

gava em dibêjin hin navên nû, gelo em dikarin bibêjin hin dengên nû jî? Ango hin dengên xweser peydabûne, anga ew hê dixebitin, ji bo ku dengêkî xweser peyda bikin?

– Rast e, di van çend salên dawiyê de, bizava wêjeya kurdî li Sûriyeyê, bi çend gavên têbînkêş pêş dikeve, ez dibêjim pêş dikeve û nepêşkettiye; yanî wêjeya kurdî, bi zimanê kurdî, li Sûriyeyê, hîn di prosesê de ye, ew niha di bergeha derbaskirinê de dijt.

Belê ezbenî! Em hin navên nû, pirtûkên nû dixwînin. Kurd dibêjin: "Dar li ser koka xwe şîn dibe", wêjeya me kurdan jî, divê li ser koka xwe şîn bibe, çimkî dara toreyê kurdî, ji koka xwe ve piravî û pir bi pişkujên vekiriye û damarên xwe kûr berdabûn û berdane giyanê gelê kurd. Lewre em, bi helbestvanên xwe yên klasîk wek Feqê Teyran, Melayê Cezîrî, Ehmedê Xanî û gelekên din, xwe pir şahnaz û rûmetdar dibînin. Torevanên me yên klasîk ne tenê li Kurdistanê naskiribûn û nasdikin. Tesîra Melayê Cezîrî li wêjevan û bîrewerê alman Gothe hebûye. Heger em li dîwana Gothe, ya bi sernava "Dîwana Rojhilatê"; wergera Dr. Ebdil Rehman Bedewî yê Mesrî vegerin, em dê baş bibînin, çawan Gothe (1749-1832) sûd ji Cezîrî wergirtiye.

Lê mixabin parvekirina Kurdistanê, di navbera Osmaniyan û Sefewiyan de, alozke dijwar li pêş wêje jî avakir û dabêşkirina welatê me, cara duhem jî, di navbera çar dewletan de, ziyaneke mezin gihand toreyê me. Yanî ev herdu xişm û bêtarên bingehîn, nehiştin wêjeya me li ser koka xwe baştir şîn bibe û hîn pirtir nasdar bibe.

Bi ya me be, toreyê me di nav bahoz û babilûskên dîrokê de, jiyana xwe berde-wam kiriye û hîn jî berxwe dide. Pêşdaçûna wêjeya me bi pêşdaçûna tevgêra gelê kurd ve girêdayî ye. Heger tevgêra azadîxwaza a gelê me li kîjan beşê Kurdistanê pêş dikeve, wêje jî, li wir pêşdikeye û herwisan jî bervajî vê jî rast û durist e. Heger em li başûrê Kurdistanê mêze bikin, em dê xweşik bibînin, ka çawan çande û toreyê kurdî bi tevgêra ramiyarî, civakî û aborî re, gavên xwe pêş de davêje û bi dehan helbestvanên nû û dengên nû, wek Şêrko Bêkes, E. Pêşew, E. Mizûrî, Mîhsîm Qoçan, di ezmanê toreyê kurdî de geş bûne.

Gelê kurd, li Sûriyeyê ta niha, dibistan û zanîngehên kurdî nedîtîye, kovar û roj-nameyên kurdî hindik û qels in, partî û rêxistinên kurdî, li Sûriyeyê, bi erdên xwe çapemenî, wek tê xwestin, nikarin rabin... Ma gelo çawan wêjeya me, li vir, wê pêşkêfî be?

Piraniya helbestvanên kurd, li Sûriyê, hîn li ser rêça kevneşopiyê berde-wam in û

ew ji xwendegeha Cegerxwîn rizgar nebûne.

Em bixwe ne li dijî kevneşopiyê ne û ne jî li dijî helbestên Cegerxwîn in. Rola wî di pêxistina helbesta klasîk a kurdî de gelek mezin e. Lê tiştê ku em carna bi çavên nîzîm li hin şagirtên Seydayê Cegerxwînî binihêrin, ew e, ku helbestvanên me yên klasîk, tiştên nû, baweriyên nû, ramanên nû û bi hunermendiyêke nû nanivîstin û bi hevîrê Cegerxwîn nanê xwe çêdikin.

Ez dîsan dibêjim, em li dijî kevneşopiyê nîn in, ew xwendeheke toreyî ya cîhanî ye, lê em fotokopiyan napejirînin.

Rast e em jî dibînin, ku di van çend salên dawiyê de, bizava toreyî kurdî li Sûriyeyê, bi hawayekî gelemper, ketiye qonaxêke nû û firkek baş daye xwe. Berhemên wêjeyî roj bi roj pir dibin. Bi ya min be helbesta kurdî ya nû, li Sûriyeyê ji dayika xwe bûye û helbestvanên me berxwe didin, ku di helbesta kurdî de bibin dengên nû. Pêwîst e em bibêjin tengeha helbesta nû û dengên nû ne yek in, ev jî tiştêkî sirûştî ye.

Gava em dibêjin dengên nû, yanî pêwîst e em jê têngihînin, ku ev dengên nû di pileya xwe ya bilind de ne. Carna helbestvan di dengê xwe yê nû de serketî dibe û carna jî, ne wek tê xwestin, dengê wî bilind dibe.

– Nêrînek li ba hin helbestvan û hin çîroknivîsên kurd li Sûriyê, nemaze jî li nik hin lawan, heye. Dibêjin giringiya wateyê dê bê wate be, ewqas ciwan e. Lê li pêş qêrî-nên J. P. Sartre û xwe digerin û jibîrdikin ku peyv û wateya wê, bi carekê, ji hevîdu dabestnabin û wek ku helbestvan nikare helbestekê bê durv biafirîne, wisan jî nikare helbestekê bê wate biafirîne. Nêrîna te di vê tengê de çi ye?

– Tu dibêjî ev nêrîna li nik hin helbestvan û çîroknivîsên kurd li Sûriyê heye, rast e. Lê em dikarin hinekî li dîroka wêjeya cîhanî vegehin, em dê bibînin, ku berî van nivîskarên me nûhayî, bi dehan û sedan di cîhana torê de û bi taybetî di cîhana rojavayê de, hene û berhemên xwe bi vê tunbaweriyê derxistin û hîn jî diweşînin.

Malarmê, Vîrlîn û Rambo, helbestvanên fransî, hîn di sedên 19an de, ev tunbaweriyê "Sîmbola" kûr kirin, ta ku bûye dibistaneke wêjeyî li cîhanê.

Sîmbola van helbestvanan û ya hevalên wek wan, pir caran bi mebest, nefemkirî dihatin nivîsandin. Ew di wê baweriyê de bûn, ku helbestên wan diviyabû ji pira-niya gel re wek hicêban bin û herwisan jî, ji rewşenbîran re bibe wek jojeke muzîkî.

Sîmbolîstan ji mijarên civakî û etîkî bi dûr diketin û wan digot: Huner li hember

pirsên civakî û moralî ne berpirsiyar e, armanca wê hestkiriya ciwanî û qeşengiyê ye. Di baweriya wan de, heger helbestvan çî ramanê yan watweriyekê bibêje, ew pêwîst e rast û durist be, çimkî ew ji hestekî kûr û tenok, yê helbestvan, derdikevin. Encama van gotinên min ew e, ku ew dibêjin: "Huner ji bo huner" e.

Vêcar heger em bixwazin, yan nexwazin, ev tun baweriya bûye dibistanêke wêjeyî li cîhanê û şagirtên wê li pir welatan çêbûne, wek me got, vê tevgerê ji Fransayê de dest pêkir û di pir welatên biyanî re, li Ewropa û bi bandorek xurt, derbas bû. Nimûne, Yêrîs (Îngilîsî), Raylkê (Almanî), Andirê Bêlî (Rûsî), ketin bin bandora vê dibistanê.

Hêdî-hêdî pêla vê bi riya wergerandinê gihaye welatên ereban jî û gelek helbestvanên ereb, li ser vê şopê helbestên xwe hûnane. Li vir birayên me, hin helbestvanên kurd jî, bi riya zimanê erebî ketine bin akama vê dibistana wêjeyî. Belkî tu, yan xwendevanên vê danûstandîna me bibêjin çima ev pêşgotina dirêj ji bersivê re?

Ez dixwazim bi riya kurterexistîneke dîrokî bibêjim, ev tun dibistana li nik kurdan jî, bê guman dê hebe û li gor yasayên sosyolojî û rewşenbîrî, rûdaweke xweser û xweber.

Lê, heger ev tun rûdawa baş e, yan xerab e, ev pirseke serbixwe ye, divête em hinekî jî li ser wê rabiwestin.

Ez tu carî naxwazim bibim heval û şagirtê vê dibistanê. Ez peyva bê wate nikarim bibîsim, yanî ev hest û weşê hecêbkî dihên tevinkirin, ne tawanbar û ne kêrhatî ne û bi ya min be jî, divê huner bibe çekek şaristanî û li rex zanînen din, bi erkên xwe yê mirovperwerî û civakî rabe...

Şagirtên dibistana "Huner ji bo huner e" dixwazin, bi riya ciwanbûna dîmenê, xwe ji berpirsiyariya pîroz ya huner, rizgar bikin.

Bi ya min be, ev tun avakirina dibistanekê, ji roja rojê, bi mebest hatiye, ta ku ew bibe kend û kosp li pêş guhertinên civakî, aborî, rêzanî û hwd. Ji ber ku heger min bidîta hunerê bi naverok, rast ne qeşeng û ne ciwan e, bê guman, min ê jî bigota naverok zîyanê digihîjine qeşengiya huner, yan jî, ew ciwaniya helbestê vedîşêre. Lê bi hezaran helbestên kurdî hene, herdu aliyên helbestê baş in û carna jî yek di ser yekê re ye. Xwendevan him bi ciwaniya dîmenê giyanê xwe av dide û him jî bi naveroka wê, hişê xwe xwarin dide. Yanî heger hunermend bikaribe xwendevanên xwe bi herdu aliyên hunerê ve têr bike, çima em dê herduyan ji wî nexwazin?!

– Em gişt dizanin ku piraniya gelê me nizanin bixwînin û beşekî mezin jî yê dixwazin, nikarin bi zimanê afirandinê re bide û bistîne. Ev pergala bergeheke dirêj û fî-

reb dixê navbera nivîskêr û civaka me û hevgehîştina ku di navbera wan divaye, qels dike, angê nezanîn, nahêle nivîskar bigihê xwendevanan. Ji ber ku ew ji ziman û derbirina nivîskêr têdigin. Hin kes hêsaniya afirandinê jî bi vê sergêrê çare dibînin û dibêjin divête nivîskar bi zimanê ku gel jê têdigihêje binivîse. Lê di bawerîya min de kesên weha diponijîn, ne kar û bar û rola nivîskêr nas dikin û ne jî cîgehê wî di civakê de dizanin.

Bi nêrîna te çawan nivîskar wê bikaribe bigihêje xwendevanan, bêyî ku ji ezmanê afirandinê berjêr bike?

– Di jiyandê de pir taqekirina bi serketinê û pir jî têkçûn e, divê em tawanê ji yê serketî bibînin.

Di warê zimên de jî, pêwîst e em tawanê ji jiyana zanistî bigirin. Pirsê zimên û pîrbûna zarav û devokan li nik pir neteweyan hebûn û hene, heger nivîskar û daneranan herdem bi zarav û devokên xwe binivîsandina, dê zimanên wan gelan nebûna zimanên lîteraturî û nedigihîştin tenggehên xwe yê bilind.

Di her zimanekî de, wek zimanzanan parvekirine, du beş hene; zimanê lîteraturî (nivîsandinî) û zimanê tevayî (devkî).

Zimanê lîteraturî, encama gelek zarav, peyv û bêjeyên gerok û aktîv in. Yanî ew peyv û bêjeyên aktîv ji zaravekî ketine zaravekî din û bi vî rengî di pêvajokê de, sermîyanekî dewlemend ji peyvên çalak çêbû û pê hat nivîsîn, bi wî zimanî re hate gotin, zimanê lîteraturî.

Lê ev peyvên qels û pir ne çûne û ne jî hatine û tim li cîhê xwe mane û neketine pirtûkan, yan çapemenîyan û tenê bûne peyvên axaftinê, ji wî zimanî re tê gotin, zimanê devkî.

Ev pênasîneke pir kurt e û belkî kêm be jî, lê ez dibînim ew di vê bersiva min de pêwîst e. Lê heger em nik zimanê kurdî rawestîn, tu jî dizanî, çiqas zarav û zaravokên me hene û dîroka me ya rêzanî nehiştiye ku pir peyv û bêjeyên me gerok û çalak bin. Vêcar li vir problema me hîn kûrtir û berfirehtir dibe.

Di zimanê kurdî de, niha bi sê zaravayên bingeşîn tê nivîsîn: Kurmanciya başûr, kurmanciya bakûr û zazakî. Yanî her yek ji van zaravayan bûye zimanekî lîteraturî yê serxwe û bi dehan û sedan berhem pê hatine nivîsîn. Lê bidaxwa, ka em ji xwe pirs bikin, em rewşenbîr, yan rojnamevan û nivîskar dikarin bi her sê zaravayên nivîsandî bixwînin û têbigihînin! Bê dudilî ez dê bibêjim ji hezarî ne yek.

Vêcar heger em hîn bi zaravokên xwe binivîsîn, yanî em hîn ji xwe re û bi xwe alozan pirtir dikin.

Di vê mijarê de ez hezdikim bibêjim, pêwîst e ronakbîrên me, qaserî dikarin zaravayên gelê xwe fêr bibin û bi riya nivîsandinê peyvên hemû zaravayan li nik me hemiyar bibin çalak û aktîv. Pêkanîna vê tun pêşniyarê, bi tenê dikare zimanê me pêş da bibe.

Ez nizamim em dê çawan bi riya zaravokan, ji hev rêbigîhin, heger em hîn bi zaravayên lîteraturî, ji hev têngahên?!...

Ew kesên dibêjin, bi zimanê gel binivîsin, heger mebesta wan zaravok, zimanê gel e, bi ya min be, ev xwastek ne di cîh de ye.

Tiştêkî din heye, divê ez bibêjim, heger em wek gel di nav xwe de dipeyivin, binivîsin, yanî pêwîst e pênivîsên me nekevin bin mercên rêzimanî û şeweyên lihevînên hevokan.

Lê gava em dibêjin, çênabe, em bi zimanê tevayî (gel) binivîsin, ev nayê vê wateyê, ku em diwar û bi hawayên netê giştî binivîsin. Na, nivîsandina lîteraturî jî bi sirûştê deqê û mijarê ve girêdayî ye. Yanî, nivîsîna lîteraturî par ve dibe ser çend beşan û her beşek riweşt û taybetiyên xwe hene. Nimûne:

1- Zimanê zanistî; felsefe, dîrok, zimanewarî û ûhd.

2- Zimanê wêjeyî; roman, çîrok, şano, helbest, ûhd.

3- Zimanê çapemeniyê, kovar; rojname, televîzyon û radyo. Careke din, di hundir van beşan de parvekirin û cudakirin, di hawayê nivîsînê de çêdibin. Yanî zimanê kovaran, çênabe wek yê rojnameyan hêsan be û yê rojnameyan çênabe wek yê kovaran, xurt û kûr be; yanî zimanê rojnameyan û televîzyon û radyo pêwîste ji yê kovaran hêsantir be û ziman û şewenivîsîna rexnevanan ji şewenivîsîn û zimanê ro-mannivîsan girantir be, ûhd.

Bi ya min be, ev tun parvekirin, pêwîst e vê nede nivîskar û rojnamevan û hoza-nan, berhemên xwe netêgiştî, yan jî pir hêsan biweşînin.

Li dawiya dawiyê, ez te pir spas dikim, ku we ev fersend da min, ta ku ez bikarî-bim hin baweriyên xwe, li ser çend pirsgerêkan û li gor zanîna xwe bidim xuyaki-rin. □

LI RÛYÊ WÎ YÊ ASÛRÎ TARÎXEKE BIRÎNDAR

HUSEYÎN ELÇÎ

Yakup

bi keser li dîwarên mor gabriel

dinihêre

kelegirî dibe

heke here; tehcîra bêdawîn a sedsalê

heke bimîne; zilum mîna simbêlên palik rapêçayî

ji deyr-ul umurê hera zahferanê

li şewqa hingûra êvarê fedike

bayên kambax li ser rûyê wî

zingil hew lêdidin

dest bide kîjan kitabê jî

kîjan încilê jî bibe rûyê xwe

ev herêm xewnên wî di xwîné de dihêle

asê û stêwr

bêeman û serhildayî

ku di hemû bedena wî de bîrîneke reş mezin dike

mîdyad; stariyeke bombekirî

li kolanên wî tarîxeke birîndar

heke here; rê mayinkirî, desteyên cêrdevanên xwînax li rîyan

heke bimîne; mirin li nêrîna wî ya asûrî nîşandekeke bangê

"ez ketim rê ber bi mêrdînê

ez ketim ber derdê te"

xisim dikevin rê ber bi Swêdê

estel êdî kasabeyekî terkkirî ye

ku kavilî lê nobedarî dike
stockholm xurbeteke sar
anrakya iklimekî dûr
arar ê kengî dengê xwe bibîne
yakup digirî
"di navbera estel û mîdyadê de"

DIYARBEKIR

heta şihîr jî, bêrawest, li stariya xwe dilerize
li vî bajarî
heke em bipeyivin gotin têrî nakin
heke em bêdeng bimînin dilê me xunaveke funyekêşandî

adar '95

WINDA

ji keserên
ku ji pelên kulîlkên hişkbûyî gêr dibin re
di kêrahiyên dilê min ê westiyayî de
hew çih heye
(bêyî şihîrê)

li pey rêwîtiyên ku hatine pê
pejna ku ji tîlên gîtarekê bilind dibê
ma stranên ku te ji bo rêwîtiya xwe danîn pê, bi qayide bûn
ku te dilê xwe bi qayide qeyd kir
paşê li hember rûyê xwe şikestî
li hember stranên xwe yên peregende xeydî
te bayekî tîkçûyî li hevûitînên xwe zêde kir
di hûlwarên bajarên dûr de

gulan '95

Wergera ji tirkî: **MEHMED UZUN**

MOZAYIKA ŞIKESTÎ

A. HICRÎ İZGÖREN

Min rû û rûçikê xwe di bîreke bêbinî de winda kir heye ku ez
êzîdiyek bim
Gava êvar dadikeve çavên askekê
Mîna ku kemendên donkîrî dipêçikin stûyê min hingî
Di xewnên min de dergûşên xwînî yên zarokan
Qînoreke hezar salan stranên şikestî, peregende
Hingî efsaneyên Babilê dibin dereweke kevnare
Xwîn dilop dike ji rûpelên Avestayê
li agir, av, ba û axê

Di her herêmekê de min rengê hûnand heye ku ez gewendeyek bim
Heke ez bibêjim ku min xewnên xwe di beriyên de winda kir
Dîsan jî ew agir tu carî netefiya di bedena min de şewitî
Rûniştewanan nikarîbûn min bikin yek ji xwe
Li ser her axê miriyên min hene
Loma nexşe perçe dikin dilê min
Hemû tixûb ordiyekê ne ji agir

Janeke derengmayî me heye ku ermenîyek bim
Mîna gor û kêlek bê ziyaretvan
Hertim ez xewle bûm ez bi nasîba xwe dizanim
Hemû replik şaş şîfre bûne
Li ser xêzên rûyê min radiweste rîwayet
Her roj ji nû ve li çarmîxê dikevîm

Mîna ku ez şerpeze bimî li vê dinyê heye ku ez suryanek bim

Mîna kahniyeke kevnare ku hew jê av diherike
Dev ji winda kirina şopên bîranînan berdîn
Ez dixwazim welê bimînim
Mîna sandûqeke zîvîn tevî defterên min ên nîvçe yên rojane ku tê de
ne
Bila gotina hizînê bibe berdêlk bi umrê me re
Dîsan jî ez her şev di guhê kevîran de dinehwirînim
Ez rûyê xwe di avên Dijle yên sar de dişom
Dijle kirîvê min e ji mîladan û vir ve

DI RENGÊ XWÎNÊ DE

Niha ez rûyê xwe li kîjan rûpelê jî bizivirînim
Tavilê pêwendîya sebeb û encamê tê holê
Her rêzekê bi "tashîhekê" birîndar
Wext dibe çîrokbêjek
Mizgînî li mirinan dike, derewan dimêjîne
Infazan mezin dike di dergûşa tarîxê de
Di her serê quncîkekê de huwiyeta min ji min dipirse
Ez birîna xwe vedikim û nîşan didim

Tu di nexşeya rûyê xwe de geliyan tînî pê
Di çavên te de çemekî şop diguherîne bêdeng
Stranekê notayên xwe yek bi yek vedirişîne
Li vir ez têk derim li hember adeteke kevnare

Her tiştê ku mana xwe winda dike li vî bajarî
Nâvê xwe li olaneke bi rengê xwîna ron dinivîse
Bêrawest diqulibe ser nasnameyekê
Dibe gotina dawîn a umrekî ku bi şîn û axînê dere û winda dibe
Bi xaniyên kevnare ku bi şewatan bûne xirbe
Her ku dere ev bajar bi te dişibe

Niha wext deynê janekê dide
Ez şerhekê datînim ser qedera xwe heqê xwe li xwe helal dikim
Çavên te li bersîveke pêwîst a pirsîyarekê
Mozayîkên qurşûnî li bircên wê
Fermo aha bedena min a ku li pey şewaran maye
Tu dikarî fitîla dawîn jî pêxînî
Ez bedena xwe jî diyarî te dikim

Wergera ji tirkî : **MEHMED UZUN**

KUÇEYÊN DIYARBEKİRÊ

IHSAN FİKRET BİÇİCİ

Kuçeyên Diyarbekirê...
Ku bi destê hov û bênsaf ê
Wext û benî-ademan
Bûne xirbe, şerpeze

Rojina ez xwe didim hev û derim
Li kuçeyan digirim, ev ya te, ew ya min
Bi hêviya ku tiştine bibînim
Ku hê jî ew şihîra kevnare tê de ye
Ku hê jî Diyarbekir pê re ye...

Lê heyhat...
Niha
Mîna leşkerekî bênişan in
Îskender Paşa, Ali Paşa, Bayram Paşa
Bi kurrahî hemû Diyarbekir seranser...

Mîna ku ev hemû ne rastî lê çirokek bû
Ma bi tenê evê hanê li pey mabû?

Evgirsa ax û keviran ku ew ê biqulibe ser betonê
Hiç kesekî li serê dinyê neditiye
Ku dêwekî weha bêhempa
Bi van destê cûce hilbiweşe

Ewçend ker û lal...

Gelo delalek niha çawan diqîre?
"Hewşeke mezin,
Du eywanên mezin,
Odeyêke bedew
Sê melis, palkursiyek,
Du zêrzmîn, mitbaxek,
Li hewşê gulên mihemedî û leylaqek...
Li koşê mala kurên zazayan,
Li pey wê hesinger hoste Kîrkor,
Zêrînger Dîkran,
Li milê wê yê rastê Husên Efendiyê Mantincî,
Li aliyê din Silêmanê Cercisiyan,
Milê çepê Kamîle Xanima Hembelî
Li pêşî tarîkiyam..."

Niha li tapuyê
Bi ser çardeh kesan qeydkirî
Mezqeneke modern...

Êdî ne ew kahnî man,
Ne şaneşîn, ne ew deriyên gûzîn...
Çaralî rapêçiyaye kuçeyên Diyarbekirê
Li ser her gavê avahiyên nenas, bêşexsiyet...

Di spêdê îniyekê de ji Kırklardaxiyê
Ber bi Dîjleyê coteke kevok
Coteke kevok ber bi Dîjleyê
Di spêdê îniyekê de ji Kırklardaxiyê...

Qasida mirinê ye
Dîjleya ku melûl, mahzûn diherike...
Westiyayî û tî
Û di spêdê şeveke bêxew herikî de
Çawan meriv pêrîşan e, eynî welê.

Diyarbakira ku di bexçeyên wî yên binefşan de
Niha ce tê çandin...

Mehmet Cemil vala li ber xwe dikeve
Vala efkar bi ser Hoste Fuat de tê
Diyarbakir mir û çû
Sersaxî li heval û dostan bikin.

WEY LI MIN

Ev şehr-î Amûd
Ev Diyarbakira bêpayan ku
Çendîn serpêhatî dîtine
Di tarîxa dûr de, di tarîxa kevnare, di tarîxa nû de...

Sewda, şer, pevçûn di nava hev de
Mîna ku me hîç ew roj nedîtine
Di her çiqilekê wê de heft gulên bişkovî
Ew gulên pembe, spî, çîkî sorî xwînî...
Niha bedena wê sexte
Pelên wê derew
Kulîlkên çilmisî yên li cîhekî xewle yê dilê min
Wey li min...

Mîna ku meriv li pey evîndarên kevnare be,
Welê te di sûretên kevnare de bi bîranîn.
Ez û Tu qulibandin ser daristaneke xaniyên şelto şehetî
Cahalerê camiyên te vegirtiye.
Pîrhevokan tora xwe hûnandine di dêrên te de.
Stûna stariya dilê min hilweşiyaye
Wey li min...

Ka li kû ne ew avahiyên bedew

Ku dest bi dest li kolanên bi hamravatê şuştî
Bawer bike, bi qasî keça wî Anjel delal bûn
Ew deriyên ku Dîkranê Ermen dineqîşandin.
Niha tax di şînê de ne, kolan di nava xwîna rewan de
Tu êdî payiza evîna min î
Wey li min...

Ewçend zane û rêgihîştî
Resûlê Borî, Mîkailê Kurd
Cafêrê Turkoxlû, Husniyê Suryan, Hayikê Ermen
Emûnê Cihû, Îsmelê Zaza
Mozayîkeke nedîtî, bêpayan
Niha
Mîna destmaleke bixwîn di kefa destên min de
Wey li min...

Li Berdebûrê
Li Hesevarê, Sarikiz, Cînaliyê
Niha hilweşiyayî, wêran, pejmûrde
Koşka Hamiyê, Koşka Pembûyê, Axûlûdere.
Her roj em cesedekê li bexçeyên ku me wextekê jê evîn radikir
Gorî axê dikin
Hêstirên çavên min nasekinin
Wey li min...

Wergera ji tirkî : **MEHMED UZUN**

MIÇIQÎNA ÇEMEKÎ

YILMAZ ODABAŞI

tu di çavên xwîntîjî yên hesretê de venîştî
li te dipîrsim
tu bi tiştêkî nizanî

mîna lehiyekî ez ber bi evîna te herikîm
herçî tu mîna çemekî ku avên xwe jî min vedîşart dûrmayî...

*

xelashûna evînekê
bi miçiqîna ava çemekî dişibe

tu ne dikarîbûyî bibûyayî deryayek
ne jî tu mîna çem mayî

*

wekî xwe be
wekî xwe be!
heke tu ev î hingî bibe yeka din

ez ê bimirim jî keseran heke tu ev î
heke tu bibî yeka din, hingî jî kê hez bikim ez ê?

/ne Diyarbekirê ez fahm kirim ne jî te
lê te bizanibûya min çiqas hez dikir herduyên we.../

DIYED Û KURTEBIRÎ

-ji bo bîranîna av. Medet Serhat-

umrê me kurtebiriya avên kûr e
evîndar e
hov e
asê ye!

umrê me dengê dîlîtiyê ye ku bi qeydan kilîdkirî
xewle ye;
jiber ku yekane ye...

û nobeta desteyên çekdaran e
li ber deriyên me
li ruhên me
nivîsarên hilweşînê ne
hawirdora me hemû hêlinên çivîkan

*

umrê me digere li wî diyarî, li vî gelî
welatê wî li kû ye?

umrê me,
çi yê cil û bergên me ne ku gava em dimirin li pey dimînin?

*

umrê me stûna mêwan, cêra şarabê ye
umrê me gergefa keserê, birayê evînê ye

umrê me kurtebiriya avan
avên kûr e...

NAME

Şorbenîsk min ji bîr kir
tilîşewitî, hevrêşk û meyir...
xweziya
tasek dims li ber min bûya
nuha li wir...
lo esker çî dikir bila bikira...

bi min re ma
-newê gorê baş e-
hisreta qeraş aş e;
ya min şal û şapik...
di talda tahteye Gebar de nuha
min pal dabûya;
nanekî tenûrê jî hebûya
azad bûma hê çêtir;
ji xwe bindest im...

ez bêjim -têm çavên te-
nuha şil in...
û destên te binmil in, xuşka min
-silavan ragihîn xwarziyê min
bêje -xalê te radimise
têr têr tê eniya te...

û li ber nekeve
li ber min jî...
ma ez xalê kê me?
ne, te digot -çi mêt e-
-berxê nêr ji bona kêr- e
êşa xwe nexe dilê xwe
sibehêkê rabe, xuşka min
bi ser wî bajarokî de bidêre.
birayê te...

21 Cotmeh 1995

Wergera ji tirkî : **MEHMED UZUN**

ŞIROVEYA DÎWANA MELAYÊ CIZÎRÎ

(Mele Ehmedê Zivingî)

"Şirovegêrê Dîwana Melayê Cizîrî" Mele Ehmedê Zivingî di sala 1893yan de, di demeke ku bavê wî Mele Mihemmedê Paluyî li Bajarê Sêrtê dersdarî kiriye, hatiye dinyayê. Hê kalê wî ji hêla Paluyê ve hatiye li Sêrtê bi cih bûye û heya mirina xwe li wê derê jiyaye. Bavê şirovegêr Mele Mihemmed piştî mirina bavê xwe dest bi xwendinê kiriye û demeke dirêj li Norşênê bi hemdemên xwe yê mîna Mele Ebdullahê Werqanîsî û Mele Ebdulqehharê nebiyê Mele Xelîlê Sêrtî re xwendiyê, Îcaze xwe wergirtiye û dageriyaye bajarê Sêrtê li mizgeft û dersxaneyên wê dersdarî kiriye. Lê demek piştê ji wir bar kiriye hinek deverên din û dawî hatiye gundê Zivingê ku li hêla Findikê (Finikê) dikeve, bi cih bûye û li wir miriye.

"Şirovegêrê" me Zivingî piştî mirina bavê xwe demeke dirêj ji aliyekî ve ji bo xwendin û dersdanê xebitiye û ji hêla din ve jî weke mezinê malbarê ji bo aboriya wan şol kiriye. Ew wextakî li Cizîra Botan maye lê piştî vekişandina Fransa ji Sûriyeyê, çûye cem zarûyên xwe bajarê Qamişlî û piştî demeke kurt jî li wê derê bûye muftî.

Mele Ehmedê Zivingî çawa ku ji pêşgotina vê şerha Dîwanê tê zanîn ji mêj ve xwestiyê ku berhemeke hêja li pey xwe bihêle; vêca dema di dawiya temenê xwe de ziviriye cem zarûyên xwe bajarê Helebê û heya mirina xwe sala 1971ê li wê derê maye hingê serê wî rihet bûye û rabûye dest bi daneserheva çapên Dîwana Melayê Cizîrî kiriye. Wî bi sebr û hedaneke dirêj xwe daye ser şiroveya vê Dîwana hêja ku hem bi naveroka xwe û hem jî ji aliyê edebî ve hemberiyê bi hemdemên xwe re kiriye. Di şerhkirina Dîwanê de çawa ku di pêşgotinê de dibêje wî alîkariyê baş ji Mele Ebdusselamê Cizîrî girtiye, lê mixabin ku ew jî zû miriye.* Wî di sala 1377/1957an de ev şiroveya Dîwana melayê Cizîrî qedandiye û navê 'Iqd el-Cewherî Fî Şerhî Dîwanî Şeyx el-Cezerî' lê daniye. Ev berhem di sala 1377/1957an de li bajarê Qamişlî li çapxaneyê er-Rafidîn hatiye weşandin.

Ev Şirove ji du cildan pêk tê, Zivingî pêşî gotinên wê yê kurdî û farisî bi ere-

bî yeko yeko mane kirine û piştê jî carekê bi kurtî û di pey de jî dîsa bi dirêjî li ser hev şirove kiriye. Min jî ev şiroveya wî ji erebî wergerande kurdî lê di ferhengkirina gotinan de min hin guhertin çêkirin. Ji pêla hinek gotinên kurdî ve min yên erebî ku wî pêwîstî bi manekirina wan nedîtibû mane kirin, lê hinekî kurdî ku vêca min pêwîstî bi manekirina wan nedît lê wî bi erebî ew mane kiribûn wisa hiştin û yên din bi tevayî wergerand.

(Ji bo ku ji xwendevanan re tevlihevî çênebe pêşî me çar risteyên helbestên Melayê cizîrî nivisandin û di pey de jî şiroveya wê ya tevayî nivisand lê ferhengoka wê me bir dawiya helbestê bi cih kir û bi reqemekê ew nîşan da ku ew ferhengoka kîjan risteyan e. Di dawiya dawî de jî hinek notên wergêrê şiroveyê hatine nivîsîn û bi reqem û stêrekê hatine nîşandan ku ji hev bêne cudakirin û bê zanîn bê ewe not ji kur diçin).

EMÎN NAROZÎ

BI NAVÊ YEZDANÊ PAK Î DILOVAN Û MEHRÎVAN

Beşa "elîf"ê [yanî qafiyeya wê bi tîpa "êA"ya erebî ye]

Newaya Mutrib û çengê fixan avête xerçengê
Were saqî heta kengê neşoyin dil ji vê jengê
Heyata dil meya baqî binoşin da bi muştaqî
Ela ya eyyuh es-saqî edir k'sen we nawil ha'

Encama maneyê: Deng û awazên dengbêj bi amûretê muzîkê çengê re bilind bû heya ku gihîste burca kêvcalê ber perê esmana. Ey meygêr were me bi araqa xwe ya mayînê (baqî) av bidê û dilê me yê mirî bi evîna xwedayî sax bike. Ta kengê em dê vî dilê ku ji ber siwarbûna li gunehan û çûna li pey nefsa qirêj, zengarî û cedewî bûye, neşon û di vê qirêj û gemarê de bihêlin. Ji ber ku dil bi araqa ku me dike serxweşê evîna baqî (mayînê) dijî, em ê jî li vexwarina wê ji dil û can her bidomînin û bêdanepaş bibêjin: "Ey meygêrê rastî fermo wan şûşeyên wê araqa herheyî û sermedî bigerîne, bi destên me bigihîne, da ku em ji vê hebûna xwe ya

gewdeyî (cismanî) cuda bibin, ji têkilî û peywendiyên xwe yên vê cîhana dere-
wîn xelas bibin û hilkişin wan meqamên rûhanî.

Xuyaye ku Şêx [Melayê Cizîrî], mehrîvaniya Xwedê lê be, ev qesîdeya xwe te-
vî ya 'aşiqê rebbanî yê bi nav û deng Hafîzê Şîrazî kiriye. Ew qesîdeya ku dîwa-
na wi ya farîsî pê tê destpêkirin:

"Ela ya eyyuh es-saqî edir ke'sen we nawilha,
Ke 'îşq asan nimûd ewwel we lê uftadi muşkilha.

Zanayê mezin Sûdî di şiroveya xwe ya bi zimanê tirkî ku li ser dîwana Hafîzê Şîrazî
çêkiriye de dibêje: "Ev helbesta »ela ya eyyuh es-saqî« ta dawiyê ku Hafîz dîwana
xwe pê destpê kiriye beşek ji helbesteke Yezîdê kurê Me'awiye ye ku li ser wezna
Hezec e. [Hezec di şî'ra erebî ya kevn de navê weznek ji ya 'arûz e - E. N.] Ji ber vî
sedemî jî hinek şa'iran ew eyibdar kirine û bi zimanê farîsî ev risteya jêrî li ser goti-
ne:

"Xwace Hafîz ra şebî dîdem bi xab
Goftem ey der fedl û daniş bî mîsal
Ez çî bestî ber xod î'n şî'ri Yezîd
Ba wucûd î'n heme fedl û kemal.
Goftî: waqîf nîstî z-î'n mese'le
Malê kafîr hest ber mu'mîn helal.
(Şevêkê min Xwoce Hafîz di xew de dît
Min gotê: "Ey yê di zanîn û çakîyê de bêhempa
Digel ewqas kamilî û çakî
Bo çî ev şî'ra Yezîd, te bo xwe ristî?"
Got: "Tu bi vê meselê nizanî ku
Malê kafîr jî mu'mîn (musilman) re helal e")

Herweha di vî warî de el-Katîb en-Nîsabûrî jî weha gotiye:

"Eceb der 'hîretem ez Xwace Hafîz
Bi nû'î keş xired zan 'aciz ayed.
Çî hikmet did der şî'ri Yezîd û,
Ke der Dîwan nuxust ez wey surayed
Eger çî malê kafîr ber muselman

Helalist ve derû qîlî neşayed
Ve lê ez şîr 'eybi bes 'ezîmest
Ke luqme ez dehani seg rubayed."

(Ez li xwoce Hafiz ecêb heyrî mam
Bi awayekî wisa ku hiş û tê nagihîje
Wî çî hikmet di şî'ra Yezîd de dît
Ku (malikekê jê) anî û xiste serê dîwana xwe
Çendî ku malê kafiran ji musulmanan re
Helal e û di vê de ti gotûbêj jî tineye
Lê ji şêr re ew eybeke pîrr mezin e
Ku gepa devê seyekî birevîne")

Ev gazin û lome û rexneyên ku li ser vê cergûbeziya [teviheviya] bê mane ya helbesta xwe bi ya Yezîd re li Hafiz têne kirin di cihên xwe de ne. Çiku Yezîd bi wan kirinên xwe yên pîs î kirêt û çepel tê naskirin, nemaze di cenga bi Huseyn re, Xwedê jê razî be, piştî ew kuştin, perîşanî û derbederiya ku anî serê ehlê beyta nebewî [malbata pêxember]. Herweha ji ber wan gotin û helbestên wî yên ku bihna înkariyê jî ji wan tê, çewa ku Hafiz jî di helbesta xwe ya bi nav û deng ya "Leyte eşyaxî bî bedrîn şehîdû" ta dawiyê de qala vê yekê dike û rewşa şerê navbera Yezîd û Huseyn û kuştina wî [Huseyn] dide zanîn. Li ser vî şerê di navbera wan de û li ser kuştina Huseyn gelek dîtinên cuda derketine, hinek ji wan, çewa ku di kitêbên dîrok, şerî'et û yên bingeha olî de jî hatine, le'neta li Yezîdî jî dirust didêrin.

Ku Katib dêmê cedwel kit şikeste xet muselsel kit
Ji yek herfan mufessel kit, kiye vê² muşkilê hel kit?
Dizanî rûd û 'ûd ewwel çî tavêtin surûd ewwel?
Ke 'işq asan nimûd ewwel we lê uftadî muşkilha.²

Encama maneyê: Dema nivîskarê qudretê (hêz û biriyê) ruyê dildarê bi gulang û kakulên bi ser hev şikestî ve xemiland, ew li pey hev rêz kirin û bisko bis-ko ji hev qetandin, gelo kîja bispor e ku vê gelşa zor û tevihev û vê mamika xer-bilî ji hev derîne û şirove bike. Na ji bilî wî aferîndeyê birîxurt pê ve kesekî din nikare. Ey dengbêj ma tu dinasî û dizanî ku gelo Rûd 'Ûd serê pêşî çî deng

û awazan dertanîn û çî distran? Wan digot ku, "Evîn serê pêşî hasayî û xweş bû, ew ji hevdtin û lihevnihêrtineke xweser û besît derket holê, lê dawiyê ji evîndarê reben re zehmetî û tadeyiyên zor ku gihîştin kêrta mirinê, derketin. Ev nîv-malika "ke 'îşq" ta dawiyê çewa ku bihurî, ji qesîdeya Hafîzê Şîrazî ye, dilovaniya (rehma) xwedê lê be.

Ji mihra wê şefeqs'dê, şêrinle'lê şekerwe'dê
Dinalim şubhetê re'dê ecêb im lê ji vê ce'dê
Ke dil ra tabê her çîneş, bi kufre mîbered dîneş
Zi tabê ce'dê muşkîneş, çî xwun uftadi der dilha?³

Encama maneyê: Ji ber derdê evîn û hizkirina wê yara kuruhniya ruyê wê mîna şewqa stêra Sa'd e, lêvên wê yên sor fena la'l û sozê wê yê hevgihanê jî wek sermes-tiyê şêrin e, qêrîn û zarîneke wek dengê ewran ji min tê. Digel vê ji ez ji bo xingalokiya wan zulfan ecêbmayî mame, çimkî her bisekî honayî bi reşayiya xwe dîn û îmanên dil jê dibin û wî kafîr dikin. Ew çî xwîneke ecêb î pir û şewat û sebahetek e ku ji ber kelewehca wan gulangên gustilokî û miskîlekîrî dikevin dilên wan evîndarên xwedayî.

Bedewiya têkelkirina peyva "kafîr" û "dîn" û ya "misk" û "xwîn"ê veşartî nîne.^{3*} Nîv-malika dawî ji qesîdeya Hafîzê Şîrazî ye, rehma Xwedê lê be.

Di vê taqê di vê xanê me 'eys û êminî kanê
Kesê dest dit ji dewranê, nîhalik vê gulîstanê
Der axûşes çu mîared ki ez dil canes buspared
Ceres firyadi mîared, ki ber bendîdi mehmilha⁴

Encama maneyê: Di bin kumbeta vê çerxa gerok û di vê xana lêdanîn û jêbarkirinê de çewa dê jiyanêke têt û tije û ewlehiyêke pêbawer bi destê me bikeve. Lewra çî kesê ku di vê dinya fanî de ji bo himêz û qeçaçkeirina ji fedîlî dilê xwe destê xwe dirêjî çiqulek ji baxçeyê gulîstanê bike, canê xwe bisipêrê, xwe jê re bike gorî, hingê ew pêrgî mirinê tê û dibe zingîna zengilê kerwankêş û pêre weha dike qêrîn û gazî: "hay hê rayijîn pertalên xwe, hûr û mûrên xwe yên giran bidin hev, barên xwe bişidînin û xwe ji bo barkirinê amade bikin.

Ji xwe di vê dinyayê de kes bi tevayî nagihîje meram û mexsedên xwe ku bigihîjinê jî berî ku pê mirad bikin dimirin. Mebest ji nîhala ku bi maneya çiqul e,

dildar e, yanî gava ji yektî re li hev bê û bigihîje dildara xwe ji hingê dewr û zeman nahêle ku bi wê nêzikî û hevghîhanê şa bibe û pê mirad bike, çiku mirin ji nedî ve bi qirikê digre û wî vedigerîne.

A rewşa cihana qirêj ku mîna ye telpa kul û kederê û cihê sehîtiya xêr û şeran e, ev e. Nîvmalika paştî ji helbesta Hafîzê Şîrazî ye, rehma Xwedê lê be.

Bi Qur'anê bi ayatê eger pîrê xerabatî
Bibêjit secde bin latî, murîdên wî dibin qarî
Murîd er bêbeser nebwed, zi fermaş bi der nebwed.
Ki salik bêxeber nebwed zi resm û rahê menzilha^{5/4*}

Encama maneyê: Ez bi qura'n û bi ayetên wê sond dixwim ku ger pîrê meyxaneyê yanî şêxê rêçenas, li mirîdên xwe ferman bike û bibêje: "ji Latî re", ku mebest pê dildarê heqîqî ye, "herin secdeyê!" Dê mirîdên wî bi ya wî bikin, emrê wî bînin cih û jê re xizmeteke baş bikin. Lewra ger ku mirîd ne kor be ji ber fermana wî pîrê xwe dernakeve û diji wî ranabe. Çimkî ew rêçenasê ku bi xwe li wê riyê çûye, rê û dirbên wê dîtine û naskirine, nezanê bi nîşan û dirûvên ku mirov pê digihîje wî cîgehî nîne û jê ne bêagah e. Na, ew bi zorî û astengiyên ku di vê rê de derdikevin û mirov ji gihîştina cem evîndara rastî diewiqînin baş dizane. Yê ku dikare ceza kêr bike û zehmetiyan hêsayî bigerîne ew e, nexwe divê mirîd bi korî têkeve ber emr û fermanên wî û li ber destê wî bibe mîna miriyekî ber destê mirîşo ku bê nanakirin vî alî û wî alî diqelibe.

Ev nîvmalika dawî dîsa ji helbesta Hafîz e, rehma Xwedê lê be.

Şevê zulmat û deryayê ji mewcan qet xeber nayê
Şikestî keştiya bayê ecacê wê⁵ şefeq dayê
Ji herfan mah û salê ma nehat der şiklê falê⁵ ma
Kuca danendê halê ma sibikbarani sahilha⁶

Encama maneyê: Şêx (Melayê Cizîrî) rehma Xwedê lê be, rewşa xwe ya evînê bi ya rêwiyeke gemiya bayê ku di şeveke tarî de bager û gilêleyeke dijwar lê radibe û keştiya wî dişkêne lê tu alîkarî jê re nayê, dişibihîne. Ew [Mela] dibêje: "Mîna ku ez di şeverşeke pîrr tarî de di deryayeke pêllihvkerî de bim, gemiya bayê ya ku ez tê de bim, şikestibe û li ber nixrobûnê be, lê ji ber gurrîna pêla û gurregurra/vizzîna bayê jî pêjna tu alîkarî neyê. Herweha xeyn ji wê bager û gilêleya hijbirî tî darweşîn

ku di şûna rohnîkirina şevê û rastkirina rewşê de hê bihtir derd û kulan pirr dike û tarîtiyê zêdetir dike pê ve tu hevî û umîda min ji bo zelalkirina vê şevê û ruhnikirina vê tarîtiyê nemaye. Çendî ku bi saya hevîdariya tîpan encama rewşa min diyar dibe jî lê ji nav wan tîpan tîpên sal û mehên ku bi awe û şekleklî umîdewar azadî û dibxweşiyê ji min re bînin nayên der. Di vê rewşê de ew kesên barsivik ku li qeraxê hêşabûnê û li yê aştiyê ne wê çawa bi halê min zanibin û pê bihisin.

Di hinek çapan de di şûna peyva "şefeq" de ya "şevê" tê. Li gor wan çapan maneya "Ecacê wê şevê dayê" weha ye: Bager û firtonyê di wê şeva tarî de da wê gemiya şikestî û ew hê bihtir niqo kir. Li gor vê yekê tu pêwîstî bi zehmetiya ku ji bo rastkirina maneyê, me li jor bi peyva şefeq ve dît nîne. Ev malika paşî ji helbesta Hafîzê Şîrazî ye, rehma Xwedê lê be.

Me ra J' ewwel çî bir xamî? kişand axir bi bednamî
Ji rengê Se'dî û Camî, ji şuhret pê hisîn 'amî
Bi deng û bang û awazî dibêjit nexmeya sazî:
Nihan key maned an razî ke zû sazendi mehfilha⁷

Encama maneyê: Ey ewê ku dike qêrîn ma tu dizanî bê pêûsê di derbarê me de çî kiriye û çî daye? Wê di dawiyê de navê me bi xirabî nivîsandiyê û di nav xelkê de nav û dengê me biraştiyê bi evînê, derxistiyê. Çawa ku nav û dengê Şêx Se'diyê Şîrazî û Şêx Abdurrehmanê Camî jî, rehma Xwedê li wan be, bi wî awayî deraniye ta ku ji ber nav û dengiyê pirr amiyên ku bi tenê evîna mecazî jî dinasin, pê hisîyan. Herweha ji ber dengvedaneke zêde aletên muzîkê hemî qêrîna wan e vê yekê terane dikin û li her hêlên cîhanê digerin. Nexwe wê çawa ev nihêniya han ji kesî re veşartî bimîne; ev yek ji wan herçar tiştên nebûyî (mehal) ye. Çimkî herkes pê xeberdide û di civat û caxiyan de wextê xwe pê derbas dike.

Ev nîvmalika dawî ji helbesta Hafîz e, mehrîvaniya Xwedê lê be.

Ji Hafîz Qutbê Şîrazî Mela fehm er bikî razî
Bi awazê ney û sazê, bibî ber çerxê perwazî
Tuzed mîn hubbîh as-sefwa bîhî ehl ul-hewa neşwa
Meta ma telqe men tehwa, de' îd-dunya we ehmilha⁸

Encama wateyê: Ey Mela ger tu bi alîkariya awaz û teraneyên tembûr û neyê nihêniyek ji yê Hafîzê Qutbê Şîrazî jî dil fahm bikî bêguman dê tu bi firr û perwa-

zan xwe bilind bikî haya bigihîjî ber kumbeta çerxa esmana, yanî bigihîjî cih û mertebeyên bilind. Herweha dê tu ji wê kêf û şadiya ku ji paqijî û safiya evîndarê tê û kesên bengî timî pê mest û serxweşin zahfir bibînî û hingê jî dê tu bigihîjî bilindtirîn mebesta xwe ku leqayîbûna jêhizkirî ye. Nexwe gava tu leqayî dülketiyê xwe bûyî û te ji wî nimetê (dirûdê) hevghîhanê yê ku darxeratê dara gonî ew civandiyê, tam kir hingê dev ji rewşa cihanê berde û wê bispêre chlên wê; yan jî wê bi paşve bide û cad û xebat bike ku tu hê bêhtir ber bi pêplûka dîtî û hermayîne (beqaê) ve biçî jor.

Ev nîvrêza dawî paşya qesîdeya Hafîzê Şîrazî ye ku bi "Ela ya eyyuh as-saqî edir ke'sen we nawilha" dest pê dîke û Şêx Ehmed, rehma Xwedê lê be, hinek malikên wê, çawa ku tu jî dibînî, tevî qesîdeya xwe kiriye û pê çarên xwe temam kirine [yanî sisê nivîsandiyê û ya çaran jî ji hafîz girtiye].

Wergera ji erebî: **EMÎN NAROZÎ**

1.

nawa: deng, dengê muzîkê, awaz

mutrib: dengbêj, stranbêj

çeng: amûretêkî (aletêkî) muzîkê ye

Fîhan: feryad, zarîn û qarîn

xerçeng: kêvcal/kevjal, li vir mebest jê burca kêvcalê ye.

saqî: meygêr, araqgêr

jeng: zeng û qirêj e

heyat: giyan, jiyan, jîn, jî

meya baqî: araqa mayinê, ewa ku te'sîra serxweşiya wê timî dimîne, mebest jê evîn e.

binosîn: vexwin

bi muştaqî: bi dil û can, bi kêf û xweşî

ela ya cyyuh es-saqî edir:

edir: bigerîne, mebest pê gerandina cureyên araqê li ber araqvexwiran e, maneya malikê giş weha ye: Ey meygêr araqê bigerîne û tevî şûşeyê wê bi dest bigihîne.

2.

katib: naskiriye (mebest ji katib ku bi maneya nivîskar e, Xwedê ye – E. N.)

dêm: rû

cedwel: [rastkêş, xetkêş], dema nivîskar xetê li ser rûpelan rast dikişîne tê gotin ku "cedwel kirîye" di vir de armanc delalkirina rû ye.

muselsel: rêzkirî, li pey hev ristekirî

şikeste: şikestî, tewandî, mîna nivîsa italîk.

şikeste û muselsel: du cureyên destnivîsê ne, lê di vir de mebest jê bisk û rûncikê yarê ne ku ji bo delalîyê wan bi ser ruyê xwe ve berdide.

ji yek herfan: tîpan ji hev, mebest bi tîpan biskên por in.

mufessel kit: cuda bike, veqetîne

muşkîle: gels, problem, pirsgerêk

Hel kit: şareser bike, ji hev derîne

rûd û 'ûd: navên du aletên muzîkê ne

surûd: awaz, naxme, stran, lawje

ewwel: pêşî, di dest pêkê de, "ewwel" a duyemîn ji bo eseyitiyê ye. Li vir nişaneke pirsê ya veşartî

heye yanî "Gelo tu dizanî ku Rûd û 'ûd serê pêşî çi deng û awazê derdixin"? bersiva pirsê ji di malika pey de "ke 'îşq . . ." ta dawiyê de ye.

ke 'îşq: ku evîne, ku 'îşqê, ku dildariyê

asan: hêsayî, hêsan, rihet

nimûd ewwel: pêşî êşkere kir, di destpêkê de diyar kir

uftad: bû, çêbû

muşkîl: gels, problem

ha: di farisî de nişana piraneyê ye

muşkîlha: gelek gels

3.

mîhr: evîn

şefeşe'd: ewa ku mîna stêra Se'd rohnî dide.

şîrîne'l: ewa ku şîrîniya lêvên wê yên sor weke kevîrê giranbiha yê le'l e.

şekerwe'd: ewa ku sozê wê yê hevguhane mîna şekir şîrîn e.

şubhet: mîna, weke, nola, layî, fena

re'd: gurmîna ewran

'ecêb im: ez şaş û mar mame

ce'd: porê xingalokî, yê gustîlokî

ke dil ra: sedemê ecêbmayinê ye, yanî ecêb e ku dil

tabê: rewneq, ronahî

herçîney: her xelekên bisk û keziyanyên honayî

kufr: reşayî

mûbered: dibin, jê dibin jê distînin

dîney: dîne dil, yanî nermî û çirîskên her şebiskek ji gulangên dildarê yên xingalokî, bi reşayîya xwe baweriya dil jê distînin û wî kafîr dikin.

zi: ji, ji ber

tab: rewneq û kelewahc, kelebîn

ce'dê muşkîney: porê dildarê yê xingalokî û miskîlekîrî

uftad: bû, çêbû, ket, rîjiya

der: di, der

dîlha: piraneya dil e, yanî xwîn herikî û kete dil, mebest jê şewata wî bi wehca evîne ye.

4.

taq: kumbeta felekê ye, di hinek çapan de "tav"

hatiye ku mebest pê roj e, lê "taq" rasttir e çiku nêzîkî "xanê" ye ku mebest pê cihan e.

xan: cihê ku rêwingî û kerwan lê datînin û qonax dikin, lê li vir mebest jê dinya ye.

'**eyş:** jiyân, hevhabûrîn, tiştê ku meriv pê dijt.

êminî: ewleyî, emînatî

dest dir: dest bide, dest dirêj bike

dewran: dinya, cihan

nihal: çiqul, guli

gulîstan: baxçeyê gulan

der axûş: di himêza wî çiqulî de

çu: gavik, kêlik

mîared: dikşîne, eslê hevokî wusa ye: "çu mî ar-diş der axûş" yanî gava ew wî çiqulî bi ber dilê xwe ve dikşîne û himêz dike.

ki: ji ber ku, ji bo, çiku

ez dil: ji dil, cidî, ji ber fedilê dil

caneş: canê wî kesî

bûspared: bisipêre, yanî wî himêz bike da ku ji dil û can rihê xwe bisipêre.

ceres: zengil

firyad: feryad, fîxan

mîdared: dike, digre, yanî zengil feryad û fîxan dike.

ki: ku

ber: li ser

bedîd: şid, şidandin

me'hamil: barê rêwitiyê ye

ha: nişana piraneyê ye, yanî barên xwe şidandin û xwe ji bo rêwitiyê amade kirin.

5.

bi Qur'anê bi ayatê: yanî ez bi Qur'an û ayatê sond dixwum, ev her pênc peyvên han: Qur'an, ayar, xerabat, lat û qatî, dawiya gişan bi "T"yê, ne bi "ê"yê têne xwendin.^{6*}

pâr: serok, rêber, rêçenas, rêşinas

xerabat: meyxane, araqgeh, badexane

qatî: xizmeta çê ji şahan re, guhradêr, sernerm, berferman, beremr^{7*}

er: eger, ger, erke, eke

bêbeser: bêçav, bêbinahî

nebwed: nebe

zi: ji

fermanes: fermana wî (pirî)

bi der nebwed: dermakeve, nayê der

ki: ku, ji ber ku

salik: lirêçûyî, rêger, rêbiwar, rêbûrî

resm: nişan, şûnd, şop

rah: rê

menzilha: cihên silûkê, cihên rêgerî ye

6.

zulmat: tarîfî, reşayi

derya: behr, derya

mewc: pêl

xeber nayê: pêjn û deng nayê

keştiya bayê: gemiya bayê, ya ku bi bayê digere

ecac: bablîsok, ecacok, firtone, gilêle

şefeq: ronahî, tirêj, spide, şewq

dayê: lêkera dema rabûrî ye lê bi hatina peyva "wê" dibe dema niha.

wê şefeq dayê: yanî bi xêra gilêle, bager û bablîsokê ronahiye daye ser wê şeva tarî, ger ne ji ecacokê bûna ruhni nedikete şevê.

herf: tîp, mebest jê tîpên aramî û demsaziye ne

mah: meh, hîv

ma: me

der şiklê: di şiklê, di sûretê

falê ma: fala me yanî xweziya me, hêviya me ya qencyîyê, bextê me^{8*}

kuca: çawa û li ku

danend: dizanin yanî li ku û çawa dizanin

halê ma: rewşa me

sibikbaran: yên barsivik

sahilha: qeraxan, kenaran, keviyan

7.

me ra: ji min ra, ji bo min

j'wwel: ji ewil, ji pêşî

bar: girt, da, bir

xamî: qelem, ev pîrsa wî tiştê (çarenûsa) ku ca-ra pêşî pênuşê jê re nivisandiye û xiziyê riya wî ye, bersiv jî di nîvmalika pey ya "kişand . . ." t. d. de ye.

kişand: xet kişand, nivîsand

axir: dawî, di dawiyê de

bi bed: bi xirabî

namî: ew navê ku pênuşê daye me û li me kiriye

bi bednamî: bi navekî xirab, bi navê xirab, yanî qelemê navê me bi xirabî nivîsand.

ji rengê: wek awayê, mîna wî tiştê ku anî serê dildarên din yê mîna:

Se'edî: Şêx Se'diyê Şîrazî yê navdar

Camî: Şêx Ebdurrehmanê Camî [Nûreddîn 'Ebdurrehman Camî, 1414-1492] yê naskirî ye, ne ku Şêx Ehmed en-Namiqî el-Camî ye, çiku ew [Ehmed en-Namiqî el-Camî] di nav wanên xwediyê dîwanên evîndariyê de nayê dîtîn û pênuşê ji ji ber kêmasiyan ew mîna xwediyê dîwanên evîndariyê ne biraştiye. Lêbelê li gor Mela derxistina navên wan ji nav ên zanayên êşkere (zahîrî) û xistina wan ya nav zanayên evîne li gor dîtina besit û berbiçav nav û dengiyeke xirab e, çendî ku di eslê xwe de li cem evînwaz û dilpeyrewan (ehl el-qulûb) nav û dengiyeke qenc be jî, lê ne li cem amiyan yanî herkesî.

ji şuhret: ji ber nav û dengiyê, ji ber navdariyê

pê hisîn: pê hisiyan, bi wî tiştî hisiyan

'amî: xelk, herkes, amî, gel

bi deng: bi dengekî bilind

bang: gazî, qêrîn

awaz: deng, qêrîn

naxme: terane, vingîn, ginîn

saz: aletekî muzîkê ye, tembûr, yanî ji ber nav û dengê wî tiştê me qal kir tembûr bi wî awazê xwe yê xweş û bilind her wî tiştî terane dîke û li pey hev distirê.

nihan: bi dizî, veşartî, nihênî

key: çawa

maned: dimînin

an: ew

razî: veşartî, nihênî, sirrî

ke zû: ji ber, ji bo

sazend: distrên, dixwînin

mehfelha: civatan, yanî xelk hima li civatan dibêje û dibilîne.

8.

ji Hafîz Qutbê Şîrazî: Ji wî Hafîzê ku qutb e û xelkê Şîraza Îranê ye, [Qutbî mertebeyeke softiyê (tesewwufê) ye û pêplûkekê dimîne ku bibe xews yan jî qutb el-Ferd, her herêmek çar qutb lê hene û bi xwes ve girêdayî ne her qutbek jî çar ewtad di bin mahiyeta wî de hene. - E. N.]

Mela: ev nasnavê Şêx Ehmedê xwediyê vê diwanê ye, yanî ey Mela!

fehm er bikî: ger tu tê bigihîjî, eger tu fahm bikî

razî: sirrên veşartî, nihênî

awaz: deng

ney: amûretekî (aletekî) muzîkê ye

saz: hin aletên mezîkê pêk ve, tembûr

bibî ber çerxê: bigihîjî ber kumbeta esmana

perwaz: firr, firrîn

tuzed: tê zêde kirin

mîn hubbîha: ji ber evina wê dildarê

es-sefwa: pak î paqij, safî û xalis

bîhî: bi wê [xalîstî û paqijiyê]

ehl ul hewa: xweyevîn, evîndar

neşwa: serxweşin/dibin

meta ma telqe: gava tu rast lê hatî, leqayî bûyî

men tehwa: yê ku tu jê hiz dikî

de 'îd-dunya: dev ji cîhanê berde

we ehmilha: û terka wê bike, jê biqere, di hinek çapan de "ehmilha" ye, yanî cîhanê bavêje piştguhê xwe û lê lez meke, bes ji ber hatina wê li pey peyva "de 'îd-dunya" yê çapa pêşî rasttir e.

1*. Li gor ku wê demê dihate gotin û li gor seydayê Hejar ku di şiroveya xwe ya ser Dîwana Melayê Cizîrî de dibêje û herweha li gor hinek gotin û çavkaniyên din yên nêzik ji ev şerha han ya Mele Ebdusselam bi xwe bûye lê ew zû miriye û piştî mirina wî Zivîngî ew bi dest xistiye û rabûye li ser navê xwe çap kiriye. (Hejar, pêşgotina Şerha Dîwana Melayê Cizîrî, Sirûş, Tehran, 1361, r. 23)

2*) Di çapa Hejar de "wê" ye.

3*) Di edebiyata erebî de, belkî jî hê rasttir di ya rojhilatê ya serdema navîn de hinek qaîde yên suxenweriyê hebûne ku wê bedew didêran û payebilind dikirin: mîna bikaranîna gotinên hevmane li pey hev, lihevanîna paşiya hevokan, şubhandin (teşbih), Cînas (gotinên hevûp û cudamane), telmîh (bi gotinekê destnîşankirina bûyereke dîrokî yan jî serpehatiyeke unawdar), bikaranîna gotinên dijmane lê hevgiredayî û hinek tiştên din. Li vir şirovekar jî bikaranîna Melê ya gotinên "kufîr" û "dîn" ku hemberê hev in û peyvên "misk" û "xwîn"ê ku hem diji hev in û hem jî misk ji xwîna xezalê çêdibe, ji bo bedewiyê dibîne.

4*) Di çapa Hejar û di eslê helbesta Hafîzê Şîrazî de jî ev nîvmalik "zi rah û resmê menzilha" ye.

5*) Di çapa hejar de "vê" ye

6*) Di çapa Bexdadê ku ji aliyê M. Elî Ewnî ve hatiye weşandin, de "xalî" ye.

7*) Peyva "qatî" û ya "Latî" rast e dibe ya "xerabat" jî welê be, lê yên "Qur'a'n" û "ayat" jî ber ku mê ne dawiya wan dibe "ê".

8*) Li herêma me peyva "qatî" bi maneya kêr û qitûrî tê mîna ku dibêjin: "ji qatiya mîran navê dîk bû evdirrehman", "vê qate qûrê".

9*) Li gor manekirina şirovekarî kêmayî di maneyê de dimîne, ji ber vê yekê jî bi ya min rasttir e ku mirov "nehat der" bi hev re mane bike, yanî derneket, diyar nebû û hevokê pey jî "şiklê falê ma" bi hev re mane bike yanî êşkere nebû û weke falekê ma. Bes gava li gor çapa Bexdadê "şiklê xalî" be hingê ev şaşiya maneyê jî dernakeve pêşberî me. Di vê rêzê de ez dixwazim li ser temenê şairê mezin Melayê Cizîrî rawestim. Ji xwe ya herî nêzî hiş ew bû ku wek pirtûn helbestvanên dema xwe Melê jî temenê xwe di malîkek yan jî risteyekê de diyar kiribe. Çendî ku şirovekar li ser nesekiniye jî lê bi ya min wisa dixuyê ku Melayê Cizîrî di risteya: "Ji herfan mah û salê ma" ta dawî de xwestiye emrê xwe nişan bide. Îcar ji ber ku di vê risteyê de du çapên cuda hene bæguman dê du tarîxên hebekî ji hev cuda jî derkevin holê.

Cara pêşî gava me di sala 1978an de tipên Dîwana Melê guherand hingê me ev riste li gor çapa Bexdadê ku "şeklê xalî" ye, bi hesabê ebecedê şirove kir û tarîxek jê derxist. Ew tarîx çewa ku di pêşgotina Dîwana Melayê Cizîrî ya ku Roja Nû di sala 1988an de li Stokholmê ew bi tipgubertina E. Narozî û Z. Kaya weşandiye de jî heye, 980yê koçî û 1570'yê miladî ye. Lê li gor kitêba Wüstenfeld-Mahler'sche, Vergleichungs-Tabellen (ed. Joachim Mayer och Bertold Spuler, Franz Steiner Verlag GMBH, Wiesbaden, 1961) ku vê dawiyê ketiye destê min û tarîxa miladî û ya koçî sal bi sal û meh bi meh dide ber hev, dibe 1572. Ez ê li jêr wê ji nû ve li gor çapa Bexdadê hesab bikim:

"Ji herfan mah û salê ma nehat der şeklê xalî ma"

Ji "herfan" yanî ji tipên bêjeya "حرفان" ku "ف، ر، ج، ن، آ، ن" in meh û salên me "nehat der", li vir mebest pê ew e ku di hesabkirina sal û mehên çêbûnê de, jihevderxistinê negre nexwe hingê "şiklê xalî ma" dê weke şiklekî xalî bimîne, nexwe divê mirov wan têxe ser hev ne ku ji hev derxe

heya ku nebe şiklê xali û rast derkeve. Li gor vê çapê min bi tenê herdu bêjeyên "herfan" û "xali" girte destê xwe û li gor "hisabê ebced"ê ku gelek caran ji aliyê rewşenbîrên serdema navîn ve, ji bo danenasîna tarîxan dihate bikaranîn, hesab kir:

(herfan): حرفان

$$\text{ح} = 8 + \text{ر} = 200 + \text{ف} = 80 + \text{آ} = 1 + \text{ن} = 50,$$

$$8 + 200 + 80 + 50 + 1 = 339$$

$$\text{(xali): خالي: ح} = 600 + \text{آ} = 1 + \text{ل} = 30 + \text{ي} = 10,$$

$$600 + 30 + 10 + 1 = 641.$$

Li gor vî hesabî, حرفان:ku dibe 339+ خالي ku dibe 641,

$$339 + 641 = 980 / 1572$$

Dibe sala ku Melayê Cizîrî ji diya xwe re çêbûye.

Bes li gor vê çapa di destê me de ku "Ji herfan mah û salê ma nehat der şiklê falê ma" ye, piştî xe-bateke dûr û dirêj ku vê dawiyê min li ser kir ez gihîştim vê encamê ku ji bilî peyvên "nehat der" û yên hûrik yên din hemû divê bêne hesabê.

Bêguman gava Mela ev riste honaye gelek tevlihevî xistiyê da ku zû bi zû nê famê û ji xwe marîfet jî di wê de ye. Vêca gotina "nehat der" çawa li jor jî bihûrî, ji bo danczanîna qatdeyê hesabkiri-nê ye û peyva "ma" jî xwediyê sal û mehan dide nîşandan ji ber vê yekê jî min ew nexistin hejma-rê. Li gor vê

Me ji nîvmalîka "Ji herfan mah û salê ma" peyvên:

"herfan (حرفان), mah (ماه) û sal (سال), girtin û ji nîvmalîka "nehat der şiklê falê ma" ji pey-vên: şikl (شكل), fal (فال) û ma (ما) girt û bi vî awayê jêrî hesab kir:

$$\text{حرفان} + \text{ماه} + \text{سال} =$$

$$\text{حرفان} = \text{ح} = 8 + \text{ر} = 200 + \text{ف} = 80 + \text{آ} = 1 + \text{ن} = 50,$$

$$200 + 80 + 50 + 8 + 1 = 339$$

$$\text{ماه} = \text{م} = 40 + \text{آ} = 1 + \text{ه} = 5,$$

$$40 + 5 + 1 = 46$$

339

$$\text{سال} = \text{س} = 60 + \text{آ} = 1 + \text{ل} = 30,$$

46

$$= 60 + 30 + 1 = 91$$

+ 91

476

$$\text{ما} + \text{فال} + \text{شكل} =$$

$$\text{شكل} = \text{ش} = 300 + \text{ك} = 20 + \text{ل} = 30, \quad 300 + 30 + 20 = 350$$

350

$$\text{فال} = \text{ف} = 80 + \text{آ} = 1 + \text{ل} = 30, \quad 80 + 30 + 1 = 111$$

111

$$\text{ما} = \text{م} = 40 + \text{آ} = 1, \quad 40 + 1 = 41$$

+ 41

502

$$\frac{\text{سال} / 91 + \text{ماه} / 46 + \text{حرفان} / 339}{476} + \frac{\text{فال} / 111 + \text{شكل} / 350}{502} = 978 / 1570$$

476

502 = 978 / 1570

Çewa ku xuyaye di nav wan de du sal dileyîzin, lê bi ya min eva dawî yanî ya 978/1570 rasttir e çî-ku di pîrêr çapan de weha ye û ji xwe li gor daneberheveke din ku D. N. Mackenzie kiriye dibe 980êyê koçî û ew jî dibe 1570êyê mîladî. (binêre li pêşgotina li ser berhema Feqiyê Teyran, Şêx Sen'an, Roja Nû, Stokholm, 1986, Memo Yetkîn tîpên wê guherîye Latînî, rûpel 31)

OLOF PALME (2)

MIHEMED DEHSIWAR

Ber bi parlementeriyê ve. Di hîlbijartinên 1956an de sosyaldemokratan hîlbijartineke xerab derbas kirin. Hevkariya bi Yekîtiya Cotkaran (pişt re Centerpartiet) hat ber xerabûnê. Daxwazên cotkaran giran bûn û hukûmet ber bi hîlweşandinê ve diçû. Partiyê wezîfe da Palme ku bi wan re têkeve pêwendiyê û daxwazên wan li yê sosyaldemokratan zêde bike û wê bi bernameyeke hevbeş amade bike. Palme karekî pîr hêja pêk anî û hukûmet jî bi vî awayî ji krîzê xilas bû. Piştî wê Erlander navê Palme bi maneya nifteya hevkarîyê "mirovê guftugoyê" danî. Lê Palme ne tenê mirovê guftugoyê bû, ew her wiha yê kar û xebatê jî bû.

Palme û Lîsbet di nehê hezîrana 1956an de, li dêreke Kopenhagenê bi hev re zewicîn. Piştî zewacê çûn Romê û meha şêrîn li wir derbas kirin. Çaxê ji Romayê ve-geriyan Stockholmê, li Vasastanê di zaboqa Rorstrandsgatan 35 de xaniyekî du ode kirê kirin û li wir bicîbûn.

Piştî ku zewicîbû, êdî wext hatibû ku rê li pêşiyê vebe, difikirî Erlander. Wî namemek ji endamê meclîsê û berpirsiyarê partiyê yê Jönköpîngê re rêkir. Di nameya xwe de Erlander biryara komîteya birêvebir a partiyê ku dixwest Palme ji bajarê wan têkeve listeya meclîsê diyar dikir. Li gora Erlander êdî dem hatibû ku Palme ji karmendiyê bifilite û di meclîsê de ji xwe re kariyerekê zefî bike. Jîrbûn û jêhatîbûna Palme dest nedida ku Erlander wî di karê niha de bihêle û çavkoşî bike.

Rojnameya Expressenê bi vê rewşê hisiyabû û li ser vê biryarê nivîseke dirêj nivîsand. Li gora sernivîsa rojnameyê, dê Partiya Sosyaldemokratan bi ketina meclîsê ya Palme re tu qezencan nekira. Palme "mirovêkî ji nava xwe razî, otorîter, xeberlîrû û bêterbiye" bû. Her wiha dê "Partî bi Palme bi pêş ve neçûya" dinivîsand, rojnameyê. Palme di hîlbijartinan de kete meclîsa ku wê demê ji du beşan pêk dihat. Beşa yekem a Förstakammaren ku Palme jî di nav de bû û beşa din jî Andrakammaren bû. Wî di 24ê nîsana 1958an de axaftina xwe ya pêşîn di meclîsê de kir. Pal-

me bêyî ku guh bide qanûnên nenivîstî, axaftina xwe bi kubarî û bêserm pêşkêş kir û bala endamên meclîsê kişand ser xwe.

Çaxê Palme di sala 1962an de pêşneyar kir ku dersa matematîkê pîrr girîng e û pêwîst e dersên wê li xwandegehan zêde bibin, parlamentêrên burjuva kenê xwe pê kirin û li dijî wê pêşneyarê derketin. Wan "qey Palme Lysenko ye û xwezaya ku mirov pê re hatiye dinyayê biguhrîne? Na, ger herkes weke Palme intellektuel bûna, dê dinyayê kar nekira" digotin.

Palme dizanibû ku pêşketina welêt a endustriyê bi teknîker û muhendisan bi ser diket. Lewra jî dixwast di qanûnên xwandinê de hinek guhartin pêk bîn. Ew her wiha bi pirsên kulturî re jî pîrr mijûl dibû. Di wextên xwe yên vala de jî pirtûk dixwandin. Wî siyasetyan û nivîskarên mîna Sartre, Goethe, Brecht, Keynes, Kolakowsky û Galbratîh ji xwe re çavkaniyên îlhamê qebûl dikir. Tiştêkî pîrr balkêş e ku tu kesên swêdî di nav wan de tune bûn.

Di rewşa laşaxî û qanûnên nexweşiyê de jî hê di destpêkê de, di nav wî û partiyên dewlemendan de nakokî derketin. Wan bi pêşneyarên xwe dixwastin rewşa karkeran xirabtir bikin û wek nimûne daxwaz dikirin ku karker her heft rojên pêşî peran wernegirin. Palme ji van pêşneyaran pîrr aciz dibû û "ev pêşneyar kesên tu îmkânên wan tune ne ku peran bicivînin dixwe rewşeke pîrr xerab. Her wiha bi wê jî siyaseta çînî hê bêtir xwe êşkere dike", digot.

Dê Palme gelek pişt re li ser rewşa çînên serdest wiha bigota: "Min di demeke pîrr zû de rewşa çîna karbidestên Swêdê ku bi çavekî biçûk û bêseksiyet li mirovan dinihêrtin, kifş kir." Di sala 1977an de ji rojnamevanê fransî Serge Richard re jî dîtî-nê xwe wiha diyar dikir: "Ji ber çîna wan biçûkdîtina mirovên din, ji bo min bû yekemîn sedemê biryarê ku ez bûm sosyaldemokrat. Ez di nav çîna karkeran de mezin nebûm lê ez malê wan im. Ji ber ku min bi şertên wan ji bo wan xebarê kir, wan min weke xwe qebûl kirin û niha jî ez bi dil û can perçeyek ji wan im."

Palme di 18yê sermawêja 1963an de tevî hukûmeta nû ya Erlander bû û li cem melîkê Swêdê sonda wezaretê xwar. Piştî ku bû wezîr, rê li pêşiya wî bêtir vebûn. Palme di kongreya Partiyê ya sala 1965an weke cîgir bû endamê komîteya birêvebir. Ev komîte ji heft kesên eslî û hewqas jî cîgir pêk dihat û di hemû biryarên Partiyê de xwedî selahiyet bû.

Palme xwedî dîtînen nû bû û guh nedida qanûnên nenivîstî. Kêfa wî ji "moralîstan" re jî nedihat. Li gorî wî mirov dikaribû her tiştî nîqaş bike û tradîsyonên kevn û bêfeyde ji nav civakê bavêje. Lê di nav meclîsê de û her wiha di nav partiya wî bi xwe de jî alîgirên wê dîtînê gelek bûn. Li hember wan Palme baweriya xwe wiha di-

anî ziman: "Ez dixwazim ji dewsa pêşkêşkirina qanûnan, bi hêz û baweriya fikran û ji dewsa desthilatdariya civakî ya mecbûrî, bi xurtiya baweriyê kar bikim."

Palme hê di yekemîn axaftina xwe ya di meclîsê de bala gelekên kişandibû ser xwe. Dijberên wî ji axaftinên wî pirr aciz bûbûn, lê gelek kesan bi hêviyeke mezin li Palme mêze dikirin. Wî bi vê axaftina xwe tabûyeke mezin şikandibû û rê ji nî-qaşan re vekiribû. Raportorê meclîsê Åke Malmström ku di rojnameya Stockholm-Tidningen de kar dikir, roja din wiha dinivîsand: "Endamê meclîsê yê herî ciwan, tevî 30 salên xwe bi dengê xwe yî zelal û gotinên teze weke ku ji nivşa nû re distira"

Êdî eşkere bû ku di nav siyaseta Swêdê de stêreke nû derketibû û dora xwe ruhî dikir. Li gorî Erlander ew yek ji wan stêrkên herî mezin bû. Erlander di pirtûka xwe de, Palme di salên 1950an de biqasî xwe berpirsiyarê pêşketina îdeolojiya partiyê dibîne. Herduyan bi hev re planên "civakeke xurt" kiribûn.

Erlander di sala 1960an de ku ew 50-salî û Palme jî 33-salî bû, di derheqê Palme de wiha digot: "Bêyî Palme ez biser nediketim. Wî di pêşketina partiyê de xebateke pirr girîng kir. Pozîsyona min a niha ji teref Palmeyê xwedî însiyatîf, jîr û xwedî qabiliyeta afirandinên îmkanên nû ve hatiye ewlekirin."

Palme û şerê Vietnamê

Di sibata 1965an de Vietnam di bin bombeyên Amerîkayê de dişewitî. Lê sosyaldemokratan newêribûn dengên xwe zêde derxin. Palme fêhm nedikir ku çawa hevalên wî û hemû mirovperwerên cîhanê bêdeng dimînin. Wî di civînekê de vê tirsê şikand û bersîva bombeyên Amerîkayê wiha da: "Dîtina guhartinên civakî û avakirina demokrasiyê, bi riya şiddetê û hêzên leşkerî ne rast e û xeyal e." Palme di axaftina xwe de Amerîkayê eşkere rexne dikir û daxwaziya şersekandinê û aştîyê dikir.

Gotinên Palme Amerîkayê gelek eşandibûn. Heke sefirê amerîkî dîtina resmî ya dewletê daxwaz nekira, tesîra wê di nav dijberên Palme de jî zêde nedibû. Lê dema Amerîkayê daxwaza dîtinê dewletê yê resmî kir, li Stockholmê jî qiyamet qetiya. Partiyên burjuvayê, kovar û rojname, radyo û televîzyon pê dan ser hukûmetê. Lê bersîva Erlander hazir bû: "Me dîtinên xwe eşkere kiriye û em wan diparêzin." Demek pişt re Palme bû wezîrê komunîkasyonê.

Palme yekemîn siyasetvanê swêdî bû ku rewşa cîhanê, heqî û neheqiyê anî ber çavên gelê swêdî. Piştî axaftina wî, guh û çavên swêdiyan nûçeyên girîng ên dinyayê bihîstin û dîtin: Kuştina Kennedy û King, şewitandina Saygonê, rewşa welatên dîktator û perçiqandina gelan...

Lê Palme hê di destpêka jiyana xwe ya siyasî de guh dabû pêwendiyên navnete-

weyî. Olîver Tambo, serokê Kongreya Neteweyî ya Afrîkaya Başûr (ANC) di sala 1960an de li Vällingbyê bûbû mêvanê Palme. Ji wê demê û vir ve têkiliyên wan xurttir bûn û Palme yek ji wan mirovên ku li hember apartheidê bû însiyatîfگیر dijberiyêke navneteweyî.

Dê ev pêwendî 25 sal pişt re, xwe bi piştgiriyeke xurt hê bêtir eşkere bikira. Di 23ê sermawêja 1985an de dema ku ANCê li Göteborgê galayekê ji bo Afrîkaya Başûr amade kiribû, Palme jî weke mêvan vexwandibû. Palme tevî cilên xwe yê sa-lên 70yan li ser rewşa Afrîkaya Başûr ji beşdaran re wiha digot: "Ger ciwanên cîhanê biryar bidin ku bira apartheid hilweşe, dê hingê ew hilweşe! Azadî bo Nelson Mandela, bimre apartheid!"

Dê çend sal şûnde, di sala 1968an de pêwendiyên navbera Swêdê û Amerîkayê li ser axaftineke Palme hê bêtir xerab bibûna. Wê demê Komîteya swêdî-vietnamiyan ku sosyaldemokran serokiya wê dikîşand, xwe nêzi FNLê (Tevgera Rizgarî ya Neteweyî) kiribû. Herdu komîteyan li Stockholmê di 2rê sibatê de meş û civînekê pêk anîn. Olof Palme jî yek ji beşdaran bû û pişt re jî axaftinekê kir. Li gorî tê gotin Sten Andersson ku di komîteya birêvebir a partiyê de bû, însiyatîfگیرêkê vê meş û civînekê bû. Sefirê Vietnamê bakur ê Moskovayê Nguyen To Chanh jî beşdarî vê meşê bû û di kêleka Palme de dimeşîya.

Armançê meş û civînekê protestokirina bombebarankirina Vietnamê û daxwaza aş-tiyê bû. Dema sefirê Vietnamê û wezîrê swêdî di kêleka hev de meşîyan û bi hev re Amerîkayê protesto kirin, xeber li çaraliyê dinyayê bela bû û bi taybetî jî awirên Amerîkayê kişand ser xwe. Fotografên Palme û Nhuyen Tho Chyan (sefirê vietnamî) ku hatibûn kişandin, di 367 rojnameyên amerîkî û bi sedan rojnameyên cîhanê de bi carekê re derketin û Swêd bi vî awayî hat pêşberî Amerîkayê.

Amerîkayê vê rewşê protesto kir û pêwendiyên xwe bi Swêdê re qut kir, sefirê xwe bi şûnde kişand û nexwest ku sefirê Swêdê yê nû were Amerîkayê. Ji vê jî girîngtir, dîtîna û axaftinên Palme yê li dijî şerê ku Amerîkayê li hember Vietnamê dimeşand, bûbûn sedemê avêtina van gavan. Heta ku Palme nehat kuştin jî, DYAyê van dîtînan xwe parast û di navbera herdu dewletan de dilsariyeke berbiçav dom kir.

Palme di axaftina xwe ya vê civînekê de li ser dîroka Vietnamê rawestîya û rewşa DYAYê ku bi navê demokrasîyê li dewletên paşverû û dîktator dikir, anî zimên. "Ger mirov li ser demokrasîyê bixafî, berbiçav e ku ew bêtir ji teref FNLê ve tê temsîlkirin û ne ji teref Dewletên Yekbûyî û cuntayên alîgirên wê ve", digot Palme.

Di derheqa FNLê de jî Palme wiha digot: "Ew tevgerêke siyasî ya navneteweyî ye ku ne ji bo menfaetên şexsî û çewt kar dike lê bala xwe dide berpirsiyariya giştî, hîs û wariniyên hevbeş û daxwaza biratiyê. Lewra jî ew bala me ber bi pêşerojê ve dik-şîne."

Sefirê DYAYê li Stockholmê ku ji nêz ve dostê serokkomar Lyndon B Johnson bû û li Teksasê cînarên hev bûn, li ser navê dewleta xwe hukûmeta swêdî bi nameyekê protesto kir û jê daxwaza xweîzahkirinê kir. Erlander di bersîva xwe de diyar dikir ku armanca beşdarbûna hukûmeta Swêdê ew bû ku meş û civîn nekeve bin hukmê komunîstan. Her wiha ew ji bo serokên Vîetnamê jî bi vî şeklî derbas dibû.

Bêşik rexnegirên hukûmeta sosyaldemokrat ne tenê amerîkayî bûn; partiyên burjuvayê û nivîskarên alîgirên wan, hukûmetê bi şid rexne û protesto dikirin û piştigiriya xwe ji hukûmetê vedikişandin. Lê ji hêla din ve jî xort û ciwanên swêdî piştigiriya hukûmetê dikirin. Di dîroka Swêdê de gawekî nû hatibû avêtin, dîtîna û baweriyên nû ketibûn nav gel. Bêşik di vê de tesîra serhildanên şagirtan ên ku li Fransayê dest pê kiribûn jî hebû.

Tevî rexne û protestoyan jî Palme ji kiryarên xwe ne poşman bû û bi dîtîna xwe bawer bû. Li gorî wî demokrasî dikaribû tenê bi azadiya aborî û civakî biserkeve. Wî wisa bawer dikir ku şer û şiddetê baweriyên di derheqa demokrasîyê de li Dewletên Yekbûyî û Ewrûpayê dişikand. Her wiha li gorî wî pêşeroj ya tekoşerên vîetnamîyan bû.

Piştî ku Dewletên Yekbûyî sefirê xwe ji Stockholmê vekişand, li hundur rexneyên mezin hatibûn Palme. Wî xwe ne parast lê berê êrişan da dijberên xwe. "Ger neteweyek li nik ciwanên xwe qedr û rûmeta xwe wenda bike, ew netewe bi her awayî nexweş e. Ger demokrasî guh nede pişgirîkên sereke, dê meriv xwe ji wan dûr bikin û li riyên nû bigerin" digot Palme.

Di sala 1965an de li Gävleyê weke cîgirê wezîrê derva di kongreya sosyaldemokratên xiristîyan de li ser rewşa Vîetnamê rawestîya û tevgera rizgiraya cîhanê, ya Asya û Afrîkayê anî zimên: "Daxwaza rizgariyê îro mohra xwe bi tempoyeke bilind li dinyaya ku em tê de dijîn xistiye. Ew îro gelek bi pêş ketiye. Pêwîst e ku em jê fêrî tiştên nû bibin û pê re bijîn û belkî jî ji bo wê bijîn. Tiştê ku em dibînin serhildaneke li hember zordestan e. Tiştê ku em dibihîzin her ew daxwazên azadî û wekhevîya civateke mezin ya mirovan e ku tevgera karkerên welatên Ewrûpayê demek berê wê hêviya bawerîya pêşerojê û pêşkeftinê ruhî kiribû. Ew moral û bawerîya sosyalîzma demokratîk me mecbûr dike ku em li hember zordaran terefê bindestan bigirin, terefê feqîr û belengazan li hember zorkerên wan bigirin. Tiştêkî xeyal e û

ne rast e ku meriv bibêje mirov ji bo daxwaza wekheviya civakî, bi şiddet û qeweta hêzên leşkerî here ser bûyeran.

Ez nizanim gelo çend xewn û xeyalên pêşerojê yên cotkar û gundiyan Vietnamê hene?... Heke ew pêşerojê xeyal bikin, dê ew bi şeklekî pirr hêsan bin: hebûneke azad, bê birçibûn û hebûna hevmirovantiya wan bête rûmetgirtin. Lê ew îro vê xeyalê bêîmkan û gelek dûr dibînin."

Beşdariya civînê û axaftina wî ya li dijî Amerîkayê, dê ji Palme re astengiyên girîng derxistina holê. Ta niha tu siyasetvanên ewrûpî bi awayekî wisa giran û eşkere kiryarên Amerîkayê rexne nekiribûn. Her çiqas DYAyê şer wenda kiribû jî, ji serokê dewleta ewrûpî tişteki wiha hêvî nedikir. Lê ji hêla din ve, ev tevgêra Palme hêviyeke xurt dida alîgirên dijî şerê Vietnamê û tevgêra wan hem li Ewrûpayê hem jî li Amerîkayê xurttir dikir. Palme di gel vê jî ji teref hevalbendên xwe yên Ewrûpayî ve bitenê mabû. Ta sala 1972an jî Sosyalîst Internasyonal newêribû Amerîkayê di vî awayî de eşkere protesto û rexne bike.

Lê siyasetvanên swêdî Palme fêhm nedikirin û meriv dikare bi rehetî bibêje ta nuha jî fêhm nekirine. Ew mirovekî pirr balkêş û kesnedîtî bû; di Swêda ku haya xwe û bala xwe nedida tu kesan an jî dewlet û welatan de, numûneyeke bêhember bû.

Palme di Swêdê de şoreşeke ku swêdiyan qet texmîn û bawer nedikirin pêk ani bû. Bi dîtîninê xwe yên nû û pêşniyarên reformên pêwîst, wî siyaseta swêdî şên kiribû; rûwekî geş anîbû civakê. Di demeke kin de xwe dabû naskirin; televizyon, radyo û rojnameyan herroj ew dikirin nûçeyên yekemîn. Ev axaftinên wî yên wê demê pişt re bi navê "siyaset xwastin e" hat çapkirin.

Hilbijartinên 1968an ji bo sosyaldemokratên bû serkeftineke mezin; partiye ji % 51.1 rayên gel girtin û hukûmetê bêyî piştgiriya partiyên din karê xwe domand. Her di vê demê de bû kurê Palme yê sêyemîn Palme hatibû dinyayê.

Erlander biryar dabû ku dê ew piştî hilbijartinan dev ji siyaseta berde û xwe bi şûnde bikşîne. Piştî ku biryarê wî eşkere bûbû, ji her hêlê ve li yekî ku têkeve dewsa wî dihat gerandin. Yek ji wan jî wezîrê aborî Gunnar Sträng bû ku demeke dirêj bi Erlander re kar kiribû. Yên ku dixwastin nivêke nû were serokatiya partiye; pêşniyar dikirin ku Erlander demeke din jî bimîne daku Palme ji bo serokatiye bipijê. Lê tu şikên Erlander tune bûn ku Palme ji niha ve jî vê wezîfeyê re amade bû.

Nivşên kevn bi mazûreta ku Palme hê ne hazir e, pêşniyar dikirin ku Sträng wezîfeyê wergire. Lê ciwanên mîna Sten Andersson, Ingvar Carlsson û derdora wan dixwastin ku serokatî têkeve destên nivşên nû. Her wiha LOYê (serokatiya sendîqeyan) jî piştgiriya Palme dikir. Ji hêla din ve rojname û mediyayê jî bala xwe dida vê

rewşê û li gora xwe dîtînen xwe diyar dikirin. Bi vî awayî demeke dirêj serokatiya partiye hat nîqaşkirin û di siyaseta Swêdê de bû yek ji wan babetên herî girîng û se-reke.

Tevahiya partiyên dijberî hukûmetê û Palme, nedixwestin Palme bibe serokê Partiyê. Wan dizanibû dê Palme ji wan re bibe dijberê zor, lewra jî ji niha ve li pey Palme ketibûn û bi niya medyayê ew ji her hêlan ve rexne dikirin.

Lê Palme li ser serokatiyê qet xeber nedida û dîtînen xwe eşkere nedikir. Bêşik wî jî dixast ku partî ji teref nivşa nû ve bê îdarekirin û bi vî awayî xwe nû bike. Lê ji raya giştî re tiştêkî nedigot; ne digot "erê" ne jî digot "na" û bi vî awayî xwe ji niqaşan dûr dixist.

Çaxê Sträng di dawiyê de eşkere kir ku naxwaze serokatiya partiye û her wiha ya dewletê werbigre, rê ji Palme û hevalên wî re vebû. Sträng di daxwuyaniya xwe de "di neqandina nav ciwan û pîran de, pêwîst e ku mirov piştigiriya ciwanan bike" digot û bi vî awayî xwe bi paş ve dikişand.

Di dawiyê de Ingvar Carlsson û sekreterê partiye Sten Andersson, Palme di adara 1969 an de birin otêlekê û li wirê ew îqna kirin ku serokatiyê wergire ser milên xwe. Rojnameya Arbetetê di 4 û 6ê adarê de di sernivîsa xwe de eşkere kir ku dê Palme bibe serokê Partiyê.

Palmeyê ku ji berê ve li dijî komunîzmê bû, bi şoreşa ciwanan û xwedîlêderketina Vîetnamê, bi gavên hêdî lê yên saxdem ber bi serokatiya partiye ve dimeşiya. Dîtîna û alternatîva wî li hember "şoreşê", demokrasîkirin bû. Siyaset dê bibûna ku herkes bikaribe bigîhê û dê rê bida ku herkes di bin tesîra wê de bimîne, digot di axaftina xwe ya 1ê gulana 1969an de li Helsingborgiyê.

Di kongreya 24an a Partiya Karkeran a Sosyaldemokratana de ku li Stockholmê di Mala Gel de çêbû, Palme bi tevahiya rayên beşdarana weke serokê Partiyê har hilbijartin.

Bi hilbijartina Palme û guhartina nivşên nû ya serokatiya partiye ve, balkêşiyên hundir û derva ketin ser Swêdê û Palme. Palmeyê ku di 42-saliya xwe de bû serokê Partiya Sosyaldemokratana û serokwezîrê Swêdê di Ewrûpaya ku ev temen dikare bibe 70-salî, bûbû nûçeyêke girîng û di rojnameyên mîna New York Times û Washington Postê de nivîsên sereke.

Çend roj piştî ku serok hatibû hilbijartin, Palme di axaftina xwe ya ji bo kongreyê dixwast hêviyên mezin ku jê dihatin kirin, bi awayekî nerm kêr bike û bala beşdarana û bi giştî ya partiye bi ser kollektîvîzmê ve bikşîne: "Tevgêra sosyaldemokrasiyê ya gel e ku tu caran ji teref kesên bi tenê ve nehariye û dê neyê îdareki-

rin." Lê di eslê xwe de ev ji hinek awayan ve ne rast bû; ji ber ku yek ji wan tradîsyonên sosyaldemokratan rê dida serokatiyê daku xebateke serbixwe bimeşîne. Û di vî awayî de jî serokê partiyê xwedî însiyatîfên girîng bû.

Palme gotinên xwe wiha dom dikir: "Ji bo gelek hemwelatîyên me, partiya me ewlehiyê temsîl dike. Ev di jiyana rojane û dîtînen bîngêhîn de bawerîyeke bêşînor dide gel. Ji ber ku êdî sosyaldemokrasi xwedî dîtînen radîkal e, ew îro rûniştiye û qewîbûnê temsîl dike."

Piştî axaftina xwe Palme sê vatîniyên partiyê yê sereke diyar kir: Siyaseta wekhevîyê ku rê dida her ferdê civatê û nakokiyên civakî kêr dikir, ya qût û senayîyê ku ji hêlekê ve xizaniyê bi dawî dianî lê rê li pêşîya pêşkeftina şirketên şexsî û dewletî nedigirt û talî jî ya demokrasiya ku têkeve nav her hêlên civakê û her wiha nava fabrîqeyan...

Di hîlbijartinên sala 1970yî de, sosyaldemokratan di meclîsê de pîrîniyê wenda kir. Palme weke serokê partiyê di hîlbijartinên xwe yê yekemîn de, ji yê Erländer ên pêşîn bêtir ray girtibûn. (Erländer % 46.2, Palme % 46.4) Lê ji hîlbajartinên dawî hindikî ray girtibûn. SAPê ji endamên meclîsê 163 û partiyên burjuwazî jî 170 kursî wergirtibûn. Lê bi piştgiriya 17 parlamenterên VPKê (Partiya Komunîst a Çep) Palme hukûmeta xwe ya nû dîsa ava kir.

Di salên 1970-71an de li dijî şexsiyeta Palme êrişên dijwar û ne di cî de hatin rojevê. Ji bilî ku nivîskar û partiyên burjuvaziyê Palme ji hêla siyasî ve nexweş, bêtewê û êrişkar dinirxandin, di jiyana malbatî de jî gelek êrişan dibirin ser wî. Li gorî wan ew mirovekî narkoman, ji serê xwe ve nexweş û ji ber wê jî pêwîstiya wî bi şokên elektrîkê hebûn û her heftê diçû nexweşxaneyê Beckombergayê ku van pêwîstiyên xwe bicîhbîne. Her wiha her çaxê ku derdiket bernameyên radyo û televîzyonan jî, hemşîreyek şîringeyek di dest de li benda wî bû, digotin û dinivîsandin van kesan.

Ev derew di şev û şahiyên dewlemendan de, ji teref karbidest, general, karmendên gîregir û polîsên bijare ve dihatin gerandin. Hinek mirovan bi navê doktoriyê ji rojnameyan re tîlefona dikirin û van derewan ji "dosyaya wî ya nexweşiyê" agahdarî didan medyayê.

Piştî ku ev derew bûn babetên medyayê, Palme ji mecbûrê rewşê diyar kir. Di eslê xwe de ya nexweş ku di nexweşxaneyê de radîza û Palme jî ji çendeyekî carekê diçû serlêdana wê, diya wî bû. Ew bi xwe sax û saxdem bû û tu nexweşîyên wî tunebûn. Bi vî awayî ew derew hatin eşkerekirin û mesele jî hat birîn.

Hevalên wî yê meclîsê gelek rûmet didanê û qedrê wî digirtin, lê ew di nav wan

de dîsa jî mîna Erlander ne populer bû. Ev rewş di nav medyayê û partiye din de jî her wiha bû. Belkî jî ew ji tebieta wî dihat. Palme siyaservanekî ji yê dema xwe pirr cuda bû û ji xebirdanên vala û beredayî hez nedikir. Her wiha di dîtin û baweriyên xwe de rast bû û ev di gotin û axaftinên wî de jî wiha derdiketin der.

Gelek caran di nav hevalên xwe yê meclîsê de diçû bêyî ku silav li wan bike. Di xeyalên xwe yê kûr de wenda dibû û ew ne didîtin. Lê haya wî ji karmendên ku li cem kar dikirin hebû; dema pê dihisya ku hinek ji wan nexweş ketine, li halên wan dipirsî, gulan ji wan re dişand û bi tîlefônê ew pirs dikirin.

Di bihara 1971an de li hember wî û malbara wî gefên girîng hatin eşkere kirin. Gefên bombekirin û yê revandina zarokên wî du nûçeyên wiha bûn. Lê Palme tevî ku zarokên wî di dilê wî de pirr şêrin bûn û nuqteya wî ya herî zêf bû jî, tu caran ji van gefan netirsiya; di xwe de demexist ku ji tiştên wiha paxaf dike. Karê wî û berpirsiyariya wî, rê ne dida gotin û bûyerên wiha. Ew serokê welêt bû û nikaribû xwe ji gelê xwe dûr bixe.

Di destpêka sala 1971an de ji nav partiye gelek rexne hatibûn Palme. Wî tehamulî rexneyên partiye din dikir û pirraniya caran pê kêf jî dikir, lê rexneyên hevalên wî ew gelek dişandin. Palme di destpêka sermawêja vê salê de li malê, di jiyana xwe ya siyasî de yekem car ketibû nav xem û xeyalên kûr. Dijberiyên ku li hember wî û siyaseta wî dihat meşandin, niha pirr zêde bûbûn. Vê rewşê ew difikirand ku dev ji siyaseta wî karê xwe berde. Li gorî baweriya wî êdî vê rewşê wisa kiribû ku çaxê wî vala diçû û bi kêrî tiştêkî nedihat.

Rojnameyan, serokê centerê Torbjörn Fälldin li hember Palme pirr bilind dikirin û wî mîna siyaservanekî xwedî şeref û rûmet pêşkêş dikirin. Hinek beşên hukûmeta wî, weke dilê wî kar nedikirin û LO jî ji siyaseta wî ne razî bû. Her wiha çalakiyên zêdekirina karan weke pirsgrêkeke mezin derketibû pêşiya wan ku niha ne li gorî daxwazên wî dimeşyan.

Erlander di dema xwe de bi taybetî li hember cepheyekê şer dikir ku ew jî ya partî û hêzên dewlemendan bû. Lê Palme ji destpêkê ve li hember du cepheyên dest bi tekoşînê kiribû: Beşa partî û dezgehên maldaran û hêzên çep ên hişk ku di dema Erlander de ne zêde xurt bûn. Niha jî cepheyê sêyemîn derketibû ku ew jî ji xwezaheskeran û rêxistina keskan ku bidawîanîna riyên hesin, xwandegehên ji hev dûr çêkirî û siyaseteke taybetî ya daristanîyê daxwaz dikirin.

Lê ji teva bêtir dîsa serhildan û rexneyên nav partiye li zora wî dihatin. Wî dikaribû bersîva cepheyên din bide û xwe biparêze, lê bê piştgirî û dilsoziya hevalan bar gelek giran bû û Palme nedixwast di bin de biperçiqe. Tevî van zorî û rewşa nex-

weş jî Palme van fikrên xwe ji kesî re eşkere nekirin û siyaseta xwe tevî ketin û rabûnan dom kir.

Di çiriya sala 1972an de partiye haziriya xwe ya kongreyeke nû dikir. Ev yekemîn kongre bû ku Palme weke serokê partiye beşdar dibû. Di rojên pêş yê kongreyê de kesî zêde guh nedida axaftinên Palme; xuya bû rexneyên çaralî ew jî di bin tesîra xwe de hiştibûn. Lê wî di roja sêyemîn de axaftineke pîrr giran û bi şewat kir. Qala rewşa xwe kir û hinek jî bersîva rexneyan da. Lê her wiha reformên nû û bi taybetî jî pêşneyara wekheviya nav mêr û jinan anî ziman

Di partiyeke ku bi dehsalan tenê ji teref mêran ve hatibû îdarekirin de, pêşneyareke wiha nû bû û gelek jî girîng bû. Palme vê carê jî civîne bi vî awayî xistibû bin tesîra xwe û nakokî û rexne hatibûn jibirkirin. Ew dîsa weke serokê giştî yê partiye hat hilbijartin û bi kêf jî beşdaran re wiha digot:

"Serokatiya partî û ya dewletê ne beşek ji raman û dîtinên min bûn, lê min vê wezîfeya ku min nizanibû ka ez dê ji heqê wê derkevim an na û hemû bersîvên pîrs û hêviyên dost û hevalan bidim an na, wergirt. Niha sê sal di ser vê demê de derbas bûye. Di vê demê de beşik min gelek tiştan pêkaniye û derbeyan jî ku hinek ji wan gelek giran bûn, xwariye. Lê niha siyaseta hinek tiştên nû û pîroz demxistiye pêşiya me ku yek ji wan jî wekheviya mêr û jinan e û ya her ferdekî civatê ye."

Hîssên malbatî di dilê Palme de cîhekî taybetî digirt. Herçî ev hîs ji dîtin û jiyanaristokratî jî dihatin, malbat û pîsmam jê re pîrr girîng bûn. Malbat ji gelek bavikan ta îro di avahiya malbatê ya li Östermalmsgatanê, digel hev jiya bû û vê li ser Palme tesîreke mezin kiribû.

Pirraniya endamên malbata wî di warê siyasî de li dijî dîtinên wî bûn. Digel vê jî nûnerên malbatê her ji demekê û carekê li hev diciviyan û hev didîtin. Palme û dapîra xwe Hanna, ta ku ew çû ser heqîya xwe jî bêyî dilê hev bihêlin, bi hev re dikeştin nîqaşên siyasî. Bi birayê xwe Claes ku ewûqatekî dewlemend û moderarekî aktîf bû re, nîqaşeke xweş û aramî dikir. Palme ji van nîqaşan hez dikir û bi wan dibxweş dibû.

Çaxê diya wî di dawîya çiriya 1972an de 82-salî çû rehetê, Palme pîrr êşîya û bi ber diya xwe ket. Pêwendiyên wî û diya wî, di jiyanê wî de cîyekî taybetî digirt. Ew jê fêrî azadî û pêşkeftinê bûbû. Di bin baskê diya xwe de, jiyanê bêtir fêrî kiribû û fêrî şertên jiyanê û tekoşinê bûbû. Bi çûyina diya xwe re, Palme li dora xwe valahiyeke mezin didît û di hundirê xwe de jî tengasiyeke kesnedîtî hîs dikir.

Dûmahik di hejmarê bê de

JI BEXÇEYÊ TALANKIRÎ

İBRAHİM SEYDO AYDOĞAN

gava ku ba disekinî
em ji bédengîyeke dirêj hişyar dibûn...

şahî diçûn, cejn diçûn
kêf û henek diçûn
ji bexçeyekî talankirî pê ve
tu tişt
nedima ji me re...

hê kilam hebûn
ku min ê li ber pencereyan binetwiranda
hê dawet hebûn
ku ez ê di dest keçikan de
li govendan bigeriyam...

hê lîstikên zarokan hebûn li ber deriyan
di civîn û şevbuhêrkan de hê çîrokên dirêj
û nivçohîştî...
hê keçikên ku
min ew maçî nekiribûn hebûn
di nav dehlan de...

ji bexçeyekî talankirî pê ve tu tişt nedima ji me re
min şerm dikir êdî
ku ez li çavên keçikeke esmer binerim
û bibişirim...
min şerm dikir êdî

ku ez helbestan binivîsim...
helbestê dengê xwe dibirî
orkestra disekinî
hemû stran nîvco diman...

ji beşçeyekî talankirî pê ve tu tişt nedima ji me re
kerwanên bêserî li pey hev rêz dibûn
û em diçûn...
bes me girî ji bîr nedikir
û hevî...
û tu pirtûkan jî
ev nedinivîsandin...

de ka were û vebêje vê destanê
tu dev ji hemû stranan
hemû xweşiyên
û evînan berde
û were di vir re derkeve

de ka were
û tu vebêje...

ÇEND GOTIN LI SER "MÊRÊ AVIS"

N. ZAXÛRANÎ

Berhema Helîm Yûsiv ya bi navê "Mêrê Avis" ji pênc birran / beşan pêk hatiye. Her birrek ji çend çîrokan di nava xwe de bi cih dike. Bêguman, her çîrokek jî ji çend pelên ku bi stîleke peşxane hatine nivîsandin, pêk tên. Lê, bela ku mijarên çîrokan li ser pirsgirêkên bi reng civakî yên ji hev cuda hatine danîn, gava mirov çîrokekê

dixwîne û dest bi xwendina çîrokeke din dike, mirov dibêje qey mirov pirtûkeke din dixwîne. Bi vî awayî jî, mirov tu pevgirêdana di nav rapêçana hûnandina berhemê de nabîne. Ev yeka ha jî, bêyî daxwaza mirovî qutkirinekê bi xwe re peyde dike. Ango, mirov tu ahengê di navbera mijar û lehen-gên berhemê de nabîne.

Bi qasî ku ji berhemê tê rêgihîştin, serpehatî û bûyerên berhemê li "Bakurê Sûriyê" derbas dibin. Divê mirov bibêje ku nivîskare berhemê lehengê çîrokan xwe - her çend xeyalî ne jî - li gorî jiyana civakî ya wê derê afirandine.



Mêrê Avis, Weşanên Avesta

Ji bo ku berhem bi zehf alî bê rêgihîştin, divê mirov hinekî li ser struktur (avahî) û uslûba ku di prosesa hûnandina berhemê de hatiye bi kar anîn, raweste, da ku bi alîkariya vê yekê jî, berhem bi hemû aliyên xwe bê zelalê kirin.

Birrê yekê angû beşa bi navê "Ax"ê sê çîrokan di xwe de bi cih dike. Çîroka yekê ya bi navê "Tiskên Kerê Spî" li ser harbûn an jî li

ser hecêketina Kerê Spî diraweste û ji xwe re dike mijar.

Bi qasî ku ji metnê çîrokekê tê rêgihîştin, amanca nivîskari ew e ku bi alîkariya vê çîrokekê jiyana civata "Bakurê Sûriyê" ya ser û binî hevkiirî bi pirr alî, lê bi awayê vegotina çîrokan kurt yên bi reng gelêrî vedibêje.

Ji ber alozî û dijwariya jiyana civakî "Ûsivê Dêhno" zivistanî kerekî xwe yê spî dikiire. Ji bo ku havînî bikaribe ji nav werz an jî bîstanê xwe şebê û talikên xwe pê bîkşîne. Ji bo vê yekê jî, ew bi kerê xwe re dibe heval û hogirekî bêhampa. Ji ber ku ew dibêje ".....ez ji we re bi çi sûnd bixûm ku ew bû-

bû weke yekî ji mala min. Hetanî ku carekê Selamo - destê we maç dike - peyvên çiranan ji min re guhezûbûn:

"Ûsivê Dêhno... kerê xwe ji zarokê xwe bêhîr delalî dike." Lê çî heyf e ku kerê wî vê qenciya wî fêhm nake! Ew jî mîna civata li dora wî rapêçayî bi kelevajîyan dilebîke. Ji ber ku baran nayê, bav û kal ligel zar û zêçên xwe derdikevin duaya baranê. Piştî duayan "... wek hûn dizanin ya girîng ew e ku Xwedê perda xwe avêtibû ser me û baran bariya dema me cilên xwe berevajî li xwe kirin, li cem goristanê li kêleke bajêr. Me nimêj kir û me destên xwe ber bi azmanan ve bilind kirin, hetanî ku tiştê me dixwest da me."

Ma wê weha bi hêsanî ji kerê xwe yê spî xilas bibe? Ji ber ku ji vî alî an ji wî alî piste pist tê guhên wî. Tê gotin ku ev zivistana ziwa ji ber xezeba kerê wî yê spî hatiye serê "Bakurê Sûriyê." Lewra peyvên bi hêrs jê re tên gotin ku "vî kerê te ev ziwabûn bi ser wan da anî." Lê şansê Kerê Spî heye ku Palo çûye leşkeriyê. Ji ber ku Palo "Ji lingan ker û pistîk girê didan û dest bi jêkirina terî û guhên wan dikir." Binêrin bê çî hobiyan Palo hene! Heger ku mirov ji jiyana "Bakurê Sûriyê" ya civakî xerîb be, mirov dikare bi hêsanî loma li rebenê Palo bike. Heta mirov dikare wî mîna mirovekî xedar jî bibîne. Lê çî heye rebenê Palo bûye bigoriyê civateke ku bingehê wê li ser fen û fîtan hatiye danîn. Ji ber çûna Palo ya leşkeriyê kêfa wî zehf tê. Ji ber ku Kerê Spî ji dirindiya Palo rizgar dibe. Lê Kerê Spî ji ne hînik e. Têra xwe heye. Êdî weke berê hew guhê

xwe didiyê.

Bi ser de jî bitir dibe. Wî dide ber zûr-kên xwe. Ji ber ku "cara dawîn min talik û zebeş ji bîstan didan hev ta ku wan di xurçikê xînim. Min dît ku berê xwe bi du çavên beloq dida min. Dev li zenda min kir. Min got qey henekan dike. Ez hatim ku bikim hewar. Tu tişt li hewîrdorê me nîne. Çî vala ye. Leşkerên tirkan ji hêla bajêr ve li ser sînor in. Ker diranên xwe bêtir bi ser hev de anîn, xwedê wekîl be mîna tehlikêkî tenûrî dihatim ku bikim du felq e." Di vê rewşa lawezî bi tirs de xwe bi tenê dibîne. Ji êşa canê xwe nizane wê çawa xwe ji nav lingên Kerê Spî yê hêçketî rizgar bike. Di vê kêlikê de jê tê xwiyakirin ku "Li ser riya gundê hazdê min dît ku kesek bi pêş de û bi aliyê min de tê." Hema ew kes bi hemû hêza xwe hewl dide ku alikariya wî bike û leşkerên tirkan yên li ser sînor dide ber nifiran: "kûçikên li ser sînor gule berdane te.....ne?" Ji ber ku "kûçikên li ser sînor" ma weke Kerê Spî har û hêç dibin? Bêguman Kerê Spî li ber wan "kûçikên li ser sînor" ne tişteke e. Ji ber ku "kûçikên li ser sînor" mîna mirovê nêçîrvanî ku di dema nêçîra xwe de ajalên (heywanên) berî dikuje, ew jî li ser rafê gel yên ji hev cuda teroreke dijarî bêsînor dibarînin. Xwedê bi tenê dizane bê wan "kûçikên li ser sînor" bi vê terora xwe çend kes kuştine. Çend jin ji ber vê kuştina wan ya ro bi nîvro bû mane. Bê wan "kûçikên li ser sînor" yên ku hawîrdorê welatê me bi tîlên rêsayî rapêçane, bê çiqas pêkolyeke xedar li ser gelê me pêk anîne. Bê wan "kûçikên li ser sînor" çiqasî dilê

dayikên me kurdan şewitandine, hêstir ji çavên dayikên me barandine. Bêguman, îro roj pikoliya wan li ser welatê me hê jî didome. Heta ku em ji wan "kûçikên liser sînor" "rizgar nebin, emê çawa bikanibin di welatê xwe de mîna mirovên baxtiyar bijîn.

Ma hûn dibê qey dê "Kerê Spî" vê yekê bîne serê "Ûsivê Dêhno." "Ûsivê Dêhno" çavên xwe vedike û xwe di nav lapê "Bizijkê Cil Spî" de dibîne. "Bizijkê Cil Spî" jî dêvîla ku wî derman bike, mîna polîsektî çavsor bi ser hildibe û jê re dibêje: "Tu qaçaxçî yî na?" Weha diyar e ku ne polîsê ku serê xwe lê dihejtne û ne jî "Bizijkê Cil Spî" jê bawer dikin. Her hewl didin ku wî derewîn derxînin. Dibê: "Ker û vî tiştî tev de bike?" Ango "Bizijkê Cil Spî" û polîsê ku serê xwe lê dihejtne, dixwazin ku jê re bibêjin: "Kûçik har dibe, deveh jî dikare hêc bibe, lê ker çawa hêc an jî har bibe." Lê, tiştekek heye ku nobedarên civata ku li ser kelevajîyan hatiye damezrandin, ji bîr dikin. Ev jî ew e: Çima baran bi saya dua û cilên ku jiberevajî li xwe dikin, dibare, lê çima "Kerê Spî" mîna devehên hêçketî an jî mîna sa har nabe? Ez bawer dikim ku paradoks di vir de ye.

Lê, ligel serhejandina polîs û biserhîlbûna "Bizijkê Cil Spî" jî, "Ûsivê Dêhno" ji ya xwe nayê xwarê: "Erê kerê wisa kiriye. Ker, ker. Ey serdema ker." Ma tenê "serdema ker" e? Bi ya min NA! Ji ber ku "Ûsivê Dêhno" bêrawestan dibêje: "Hûn bawer dikin ku bê kê di wê kêlikê de derî li me girt? Kerê min yê spî bi xwe bû û xwîna min ya ziwabûyî li ser dev û lingên wî bû."

Di vê navberê de hemû kes dihabin û

yekê ji wan digot: "Ev nîşanên qiyametê ne." Naxwe, weke ku me li jor jî got: Di nav jiyana civatê ya ku li ser kelevajî û diyardeyên (fenomen) pûç hatiye ava kirin, hertişt dikare çê bibe. Dibe ku baran bi alîkariya cilê ku jiberevajî li xwe dikin, bibare, kûçik har bibe, deveh hêc bibe û heta ku ker jî mîna devehê hêc bibin. Ji bilî polîs û "Bizijkê Cil Spî" ku mîna mirovan li mirovê dora xwe guhdarî bikin. Ez bawer dikim ku qiyameta herî mezin ku dê li serê mirovan rabibe, ev e û ne tişteki din e. Ji ber ku "Bizijkê Cil Spî" jî, ne kêrî "Kûçikên li ser sînor in" di kiryarên xwe yê rijane de.

Bi qasî ku ji rewşa "Kerê Spî" tê xwiyakirin, "Kerê Spî" jî dihebite. Sergêjek lê digere, nizanê wê çî bike. Ji ber ku "hêdî bi hêdî nêzikî min bû. Ji nişkê ve herdu çavên wî beloq man, mişt av bûn. Teyê bigota qey dixwaze tişteki - ku min nizanibû çî ye - bêje, lê nepeyvî. Bi hêrs ziriya, zîvirî û bi bazdan berê xwe da qereqolê .."

Ji vê lehta "Kerê Spî" tê xwiyakirin ku wî baş fêhm kiriye ku polîs û "Bizijkê Cil Spî" bela xwe jê ve nakin. Wî rehet nahêlin. Herdem dê wî aciz bikin. Bela vê yekê jî, bêtir ku polîs û "Bizijkê Cil Spî" jê re bibêjin, an jî bêtir devê deriyê wî ew bi xwe ciwamêrtiyê dike û berê xwe dide qereqola polîsê ser hejandî.

Bi kurtî struktura çiroka "Tiskên Kerê Spî" bi vî awayî jî aliyê nivîskarî ve hatiye hûnandin. Kêr - zêda struktura çirokên din jî, li ser bigehêki weha yê ku jiyana rojane ji xwe re dike mijar, hatiye ava kirin. Herçiqas nivîskar xwestiye ku struktura çî-

rokên xwe bi alîkariya bûyerên bi reng henekokî, lê yên ji hev cuda vebêje jî, di bingehê xwe de wî bi hemû hêza xwe hewl daye ku alozî û dijiwarîyên jiyana civakî ya “Bakurê Sûriyê” binirxîne. Ji ber vê yekê jî mirov dikare bi hêsanî bibêje ku nivîskar di vî kar û xebata xwe de bi ser katî ye. Ji ber ku bûyerên bi reng henekokî an jî pêkenokî yên ku wî ji bo mijara çîrokên xwe hilbijartine, diyardeyên herî serokî ne ji bo jiyana civakî ya “Bakurê Sûriyê.” Lê, heger ne ji ber şûrê sansurê yê ku mîna şûrê demokles li ser serê nivîskar û hemû cure hunermend re diheje, dê nivîskar bêtir mecal bidîta ji bo bicihkirina kar û barê xwe yê hunermendî.

Piştî vê şirovekirina kurt ez dixwazim di rêzên jêrîn de parîkî li ser li ser forma “Mêrê Avis” jî rawestim, da ku bi alîkariya vê yekê xwendevanan bibin xwediyê agahdariyeke bi rêk û pêk di derbarê berhemê de.

Divê ku di destê pêşî de bê goşin ku nivîskar berhema xwe bi zimanekî sivik / sadeyî bi reng gelêrî nivîsandiyê. Herweha, hevokên ku di prosesa hûnandina berhema xwe de bi kar anîne, bi pirranî hevokên hêsanî yên ku mirov di jiyana rojane de bi kar tîne, bi xwe ne. Aliyê din yê zimanê nivîskêr ew e ku zimanê ku metnê berhemê radipêçe, zimanekî talî bi reng pêkenokî ye. Bêyî ku nivîskar ji mirovî re bibêje, mirov bi xwe têdigihê ku amanca nivîskar bi vî zimanê talî yê bi reng henekokî ew e kelavajî û dirindîtîya (zalimîtiya) li ser civata “Bakurê Sûriyê” bi hemû aliyên xwe raxîne ber çavên xwendevanan. Ji bo ku pirsgirêk di vî warî de bê tîgihîştin, divê ku mirov hinekî

guh bide nivîskar, bê ka çi dibêje:

“Ya star.... çi nexweş e, tu dibê qey bêhna avdestxaneyê ye. Gelo ez xerabe me yan pozê min ne pozekî normal e. Bêhna ku tê min nayê tu kesî. Her ku serê min bi bêhna tekerên terambêlan, solên leşkeran û konevanên derewîn dieşe, ez baz didim avdetsxaneyê ji bo yê wê bêhna xweştir ji bêhnên din, bi vî awayî ez heta niha sax mame, lê ka nerîna mirîyan çi ye?”

Bi rastî jî gava haya mirovî ji fen û futên konevanên “Bakurê Suriyê” hebe, mirov dizane ku ev konevan çi bi serê gel dikin.


“Mêrê Avis” bi zimanekî gelêrî yê rojane î hêsanî tê pêşkêş kirin. Bêguman, ev zimanê rojane yê hêsanî dibê sersebebê ku xeyala nivîskari jî gelekî besit bibe. Vê besitbûna xeyala wî hiştiye ku rêsandina bûyeran di serpehatina hûnandina çîroka wî de zehf xav bimîne. Ev yeka ha jî, dibê asteng ji bo ku nivîskar bikaribe mîna ku jê tê xwestin bûyerên çîrokên xwe li gora rewşa his û pêjnên kesên ku di çîrokên wî de xwedî rol in, bi awayekî organîk birêse.

Bêguman, ji bo ku mijarên çîrokên wî jiyana civakî ya rojane di xwe de bi cih dikin, mirov dikare bi hêsanî hilbijartina wan ya jî aliyê nivîskar ve di cih de bibîne. Lê, heger ku awayê vegotina nivîskêr jî weha li gora hilbijartina mijarên çîrokên wî bi rêk û pêk bana, dê uslûba wî bêtir bi mijarên xwe ketiba. Lê mixabin, bikaranîna peyven rojane, metnên çîrokên wî gelekî lewaz kirine. □

Helîm Yûsif
Mêrê Avis
Weşanên Avesta

JI WEŞANÊN NÛBIHARÊ PÊNC PIRTÛKÊN NÛ

Şeş pirtûkên Sabah Kara bi hev re derketin. Ev şeş pirtûkên Sabah Kara ku xebata salên dirêj in, bi hev re li Stenbolê di nava Weşanên Nûbiharê de derketin. Nûbihar kovareke xwerû bi kurdî û mehane ye. Sabah Kara berpirsiyarê vê kovarê ye ku ji sala 1992an û vir ve derdikeve. Piraniya van pirtûkan berê di kovara Nûbiharê de beş bi beş hatibûn weşandin. Li Tirkîyeyê, di vê rewşa kambax de, derketina pênc pirtûkên bi kurdî bi serê xwe xizmeteke pir baş e. Lê belê başbûna pirtûkan, xweşbûna zimanê wan, bi naverokbûna wan, vê bapêşê baştir dike û dibê xizmeteke ku êdî nayê pîvan. Ji van şeş pirtûkan pênc heb gihîştine me û em ê bi kurdî van herpênc pirtûkan bi xwendevanên xwe bidin naskirin.



Yek ji van pênc pirtûkan bi navê "Çarîn, Ji Çem Bi derya" ye. Çarînen di vê pirtûkê de berê di kovara Nûbiharê, di quncika bi navê "Nuqurç" de bi navê Sabah Kara yê mustear Mela Qasim hatibûn weşandin. Di van çarînan de şafr bi zimanekî ironî rewşa Tirkîyeyê, sistema wê û rewşa civakê tîne zimên. Herweha ew li diji nezani û cahiltiyê alaya zanîne bilind dike. Ew di

çarîneke vê pirtûka bedew de weha dibêje:


Ne cahil dibin dewlet, ne zalim dighin derkê

Lat di cihê xwe de ne, nikarin herin derkê

Pêşketin bi sayeta îlm û merhemetê ye

Ne mûmkin e ku Xwedê dewletê bidê kerkê

MERSIYÊN ROJHILAT




Mersiyyên Rojhilat bi du zimanan, ango bi kurdî û tirkî ye. Tirkiya wan di kovarên tirkî de, kurdiya wan jî bi navê *Mersiyyên Rojhilat* di kovara Nûbiharê de hatibûn weşandin. Şair şîrên kovaran civandine û ew bi kurdî û tirkî derxistîye. Di van şîran de şair bi hisî li zaroktiya xwe digere, ji zarokan re distirê, dixwaze pariyê nanê xwe bide wan, naxwaze ew êşê bikişînin, dixwaze ew di nava şahiyê de bijîn. Ev şîrên ku bi psikoloji û felsefê hatine hûnandin, rengêkî nû dide şîra kurdî ya nûjen. Sabah Kara di şîreke xwe de wilo ji bajarê zaroktiya xwe "Nisêbinê" re dilorîne:

NISÊBÎN / 2

*Çima navê te
Şirikê huznê ye
Şirikê kinê ye
Di devê min de
Dema ku tu tê bira min
Mayin dikin biteqin di dilê
min de
Û têlsincik di çavê min de
Dema ku tu tê bira min*

*Mamosteyê ku min zimanê
wî nedizani
Dibistan
Şaş û behîtî
Û "türküm doğrucuyum çalışkanım" destûra min
Mamosteyê ku min zimanê
wî nedizani
"Oglum kapıyı aç"
"Ka-pı-ya!"
Şaş û behîtî şaş û behîtî
İşkin di qirikê de girêk girêk
Dema ku tu tê bira min*

NAMEYÊN BÊCEWAB




Ev pirtûka ha jî bi kurdî û tirkî ye. Şair berê ev bi navê "Karşılıksız Mektuplar" li Tirkîyeyê di kovarên cihê cihê de weşandibû.

Lê paşê di sala 1992an de gava dest bi derxistina kovara Nûbiharê kir, vê carê ew bi kurdî nivîsandin. Li gorî gotina Sabah Kara wî ew direk wernegerandine, lê ji nû ve nivîsandine. Nameyên Bêcewab mîna şîrekê dirêj e ku ji bîst û pênc narmeyan pêk hatiye. Her narmeyek, ango her şîrekê dikare bi serê xwe jî were xwendin. Ev mînakêk biçûk ji çend rêzên "Nameya zan" e.

*Şîrê min bêcewab dimînin
ji zû ve ye
Dibe ku nagihin destê te narmeyên biteahhudê min
Heyf e ku ez dengê rengan nabihîsim
Hê nikarin dengan jî bibînin çavê min*

BABA TAHİRÊ URYAN

Ev Dubeytîyên Baba Tahirê Uryan bi wergera Sabah Kara di kovara Nûbiharê de hatine weşandin. Baba Tahirê Uryan ku bi xwe kurdekî lor e, bingew



hê edebiyata farisî daniye, ango edebiyata farisî bi wî dest pê dike. Sabah Kara Dubeytiyên Baba Tahir ji lorî wergerandine kurmançî û ev zaravayê kurdî kiriye xwediyê berhemeke wisa bi qîmet û dîrokî. Sabah Kara bi xwe di derheqa vê berhemê de û di derheqa Baba Tahirê Uryan de wilo dibêje: "Baba Tahirê Uryan kevintirîn şairê lor ê Îranê ye ku şîra Îranê ya niviskî bi wî dest pê kiriye. Ev rastî, ji hêla îraniyan jî tê qebûlkirin; lê mixabin hin ji wan, erê lorbûna Baba Tahir tesdîq dikin, lêbelê kurdbûna loran qebûl nakin û îddia dikin ku "lor, pars in". Ev yek heta devereke tê fêhm-

kirin ku çima hin ji iraniyan vê îddiyê diparêzin: Lewra eger kurdbûna Baba Tahir qebûl bikin, ev tê wê me'neyê ku edebiyata Îranê, bi kurdekî dest pê kiriye; û ev yek, li hin ji iraniyan giran tê. Li gora çavkaniyan, Baba Tahir di sala 1010î zayinî û 401ê koçî de wefat kiriye. Nexwe jidayikbûna wî di dawiya sedsala dehan, û wefata wî di destpêka sedsala yanzdehan de ye. Kitêba ku ji vê wergera me re bûye çavkanî, ji hêla Weşanxaneyê Iqbal di sala 1983yan de li Tehranê û bi navê *Diwanî Şîrî Baba Tahirê Uryanî Hemedanî* hatiye çapkirin. Di wergerê de me xwe bi piranî bi tertîba vê kirtêbê ve girêda; lêbelê me Dubeytiyên ku bi navê Dubeytiyahî Meşkûk (Dubeytiyên Biguman) di dawiya kitêbê de cih girtine, "meşkûk" nehesibandin û li Dubeytiyên din ilawe kirin; û xezelên ku di nav Dubeytiyan û Dubeytiyahî Meşkûk de tesbît nekir û bi baweriya me, yan divê Dubeyti hemû "meşkûk" bînin dîtin, yan jî divê Dubeytiyên

Meşkûk, ji "meşkûkbûnê" bîne derxistin; ku me jî weha kir. Di wergera me de, tevî me'neyê, pîvan û qafiyeyên Dubeytiyan jî hatin parastin; û weku xwendevanên pispor jî bi hêsanî dê fêhm bikin, kurdiya Dubeytiyan di sewiyeke zehf bilind de nêzîkî zimanê orjînal e. Ji bo ku ev yek baş bê dîtin, me di kitêbê de cih da orjînalê Dubeytiyan jî. Şayanî bîrxistinê ye ku kurdiya van Dubeytiyan, cara ewil ji gulana 1994an û pê ve di kovara Nûbiharê de hatiye weşandin."

Mînakek ji Dubeytiyan:

Tu ji min dâr î, dilêmin ji min dâr

Hemû hewesên dunyê jî ji min dâr

Bi canê dilber ku herdu alem de

Jibil dilbera min, her tiştî ji min dâr

Mînakek jî ji Xezelan ku di pirtûkê de cih girtiye:

*Ex ew sotidilê bêpî û ser im
Ku dil sotî bi eşqa dilber im*

*Dil min daxdayî ye j' lalê-ru-
wan*

*Di demarên xwe de xwedî-
neşter im*

*Ruawê yar ger çilwe bikê di
dil de*

Bi şahî ez ji tovê ronitir im

*Di xefka zeman de ez we
muzterib*

*Weku nêçirê weş û birindar
im*

*Ku jibil eşqa te dil de tişt he-
bê*

*Nav heftê û du gelan de ka-
fir im*

*Di hedefa vê dunyaya fanî
de*

Wek tîreke şikestî bêper im

*Her disojim, disojim, her di-
sojim*


Bi germî ez ji agir agirtir im

*Ez im Tahir ku bi derd û ce-
fayê*

*Xulamtiyê ji Muhemmed re
dikim*

OMER XEYAM / RUBAIYAT

Rubaiyat an jî Çarînên Xeyam, çihê girîng di edebiyata farisî de digire. Ew heta niha wergeriyane gelek zimanên dinyayê û di salên sihî de ji aliyê Dr. Ka-



miran Bedir-Xan ve jî hatine wergerandin û di kovara Hawarê de hatine weşandin. Sabah Kara pêncî Çarîn hilbijartine û ew jî orjî-nala wan ya farisî wergerandine kurdî. Herweha ji bo ku îmkana danberheva Çarînan hebe, Sabah Kara orjî-nala wan ya farisî ji weşandiyê. Bi vê yekê wê xwendevanên pîspor bikarî-bin bi hêsanî wergera wan ya kurdî beramberî farisîyê bikin. Ev Çarînen han jî di navbera salên 1994-95an de di kovara Nûbiharê de hatine weşandin.

Mînakek ji Çarînen di kitê-bê de:

*Tav kemendê sibehê bi ser
ban de avêt*

*Keycusrewê rojê, badê bi îsti-
kan de avêt*

*Mey vexwe ku dengê evînê di
seherê de*

*Awazê "îsrebû"yê bi ser rojan
de avêt*

*Dengek bilind bû seherê ji
meyxaneyê me*

*Go "ey rindê xerabatiyê dî-
waneyê me*

*Rabe ku em qedehan bi meyê
tîjî bikin*

*Berya ku tîjî bikin deftera
emelê me!*

Zimanê Sabah Kara yê şî-
îran zimanekî edebî î xurt e. Ew herweha vî zimanê xurt di wergeran de jî bi xurtî bi kar tîne.

Ev çend kitêbên ku mîna çend stêrkan in, di warê xwe de valahiyeke mezin dadigirin. Bi hêviya berde-wamiya vê xebata hêja û pî-roz, em şaîr, nivîskar û wer-gêrê xwe Sabah Kara pîroz dikin. □



HAWAR

dengê zanîne ye!

NÛ DEM: Box: 177
177 23 Järfälla, Sweden
Tel û faks: 8 480 13162

HAWAR hat hawara me

Hemû hejmarên HAWARê, ango ji hejmarê 1ê heta ya 57an mîna du cildan di nava weşanên me de derket. Mîna tê zanîn kovara HAWARê yekemîn kovara edebî û çandî ya zaravayê kurmancî ye ku di navbera salên 1932-1943an de li Şamê bi alfabe ya latînî derdiket. Lê belê 23 hejmarên pêşî hem bi lafabeya latînî û hem jî bi ya erebî bûn. Di vê çapa nû ya HAWARê de me her 23 hejmarên pêşî jî transkribeyî alfabe ya latînî kirine da xwendevanên îro bikaribin bixwînin. Herdu cildên HAWARê bi cildên çerm mîna pirtûkên pîroz hatine çapkirin. Herdu cild li ser hev 1146 rûpel in. Buhayê herdu cildan li ser hev 100 Markên almanî ne. Yê ku çar taxîman bixwazî em heqê postê jî digirin ser xwe. Ji bo Swêdê jî her taxîmek (Cild 1 û 2) bi 400 Kronên swêdî ye.

♥ HAWARêkê têxe mala xwe, bila mala te bê HAWAR nemîne. HAWAR bingehê zîman û edebiyata me ya nûjen e. Bila zarokên we bi nûjentiya HAWARê perwerde bibin.

♥ Qîmetê bidin zîman û edebiyata xwe, qîmetê bidin hêjayiyên xwe da xelk jî qîmetê bidin we!

♥ Xwe bi HAWARê serbilind bikin, mala xwe pê şên bikin, giyanê xwe pê şa bikin!

♥ HAWAR dengê zanîne ye!

BIBE ABONEYÊ NÛDEMÊ!

Ger hewesa te li ser şîr, çîrok, roman, rexne, hevpeyvîn, lêkolîn, huner, sinema û hwd. habe, pêşniyazêke me heye: bibe aboneyê NÛDEMÊ!

Ger tu bixwazi ji tevgera huner û edebiyatê ya herçar perçeyên wê - lêt haydar bibi! Û edebiyata dinyayê ya kevnar û nûjen bi zimanê kurdî bixwini, dîsan bibe aboneyê NÛDEMÊ!

NÛDEM dîwaze ji avakirina edebiyata kurdî re bibe alîkar, tu jî alîkariya wê bike, bibe abone!

Ez dîwazim ji avakirina edebiyata kurdî re bibim alîkar. Ji kerema xwe re min bikin aboneyê / aboneya NÛDEMÊ.

Ji bo Swêdê salek 240 Sek., Ewropa 80 DM.

Nav û paşnav.....

Adres.....

.....

Yê kare dagirta û fonotopê wê li ser adresê NÛDEMÊ bigirta. Ger ku ew bigihîje me, em ê NÛDEMÊ bigihîje li wê alîkariyê ya ku wê bigihîje.